

ROJNAMEGERÊN BÊKAR LI PEY NÛÇEYÊN XWE NE



ROJNAMEGERÊN BÊKAR LI PEY NÛÇEYÊN XWE NE

Aynur Tekin, Ecem Engin, Elif Ural, Eren Güvendik,
Ferhat Demir, İbrahim Karcı, İrfan Aktan, Leyla Ayaz,
Michelle Demishevich, Nurhak Yılmaz, Nuri Fırat,
Oktay Altekin, Refik Tekin, Remzi Budancı,
Sertaç Kayar, Şenay Öztürk, Volkan Ağır,
Yılmaz Yıldız, Zana Kibar, Zehra Doğan



IPS İLETİŞİM VAKFI

WEŞANÊN WEQFA RAGİHANDINÊ YA IPSyê

NAVEROK

ROJNAMEGERÊN BÊKAR LI PEY NÛÇEYÊN XWE NE

© Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

Weşana li ser ûnnetê: Çiriya Pêşiyê, 2017

WEQFA RAGIHANDINÊ YA IPSyê

Caddeya Faîk Paşayî No: 37/7-8 Qet: 3

34430, Beyoglu, Stenbol

Tel: +90 212 251 1503

Faks: +90 212 251 1609

E-namegeh: bia@bianet.org

Malper: www.bianet.org

.

Ev e-kitêb bi piştgiriya malî ya Bernameya Mafên Mirovan a Balyozxaneya
Kralîya Hollandayê hatiye weşandin.

Fikrên di vê e-kitêbê de yên Weqfa Ragihandinê ya IPSyê ne.

Çenabe bi ti awayî fikrên di vê e-kitêbê de wek nêrînên Balyozxaneya
Kralîya Hollandayê bêne dîtin.

Werger: Aydin Sönmez, Yunus Önal

Redaksiyon: Ensari Özdoğan

Dîzayna kitêbê: Ali Seçkin Karayol

Li ser navê weqfê	7
Rojnamegerên bêkar bi çêkirina nûçeyan li ber xwe dan	9
Çi qasî ku ew "karên nû" dîkin jî, ew rojnameger in	14
Di OHALê de rojnamegerî qedexe ye	26
Almanya: Li dîasporayê jenerayona nû / Veqetîn	36
Almanya: Koçberîya piştî bîntengîyê	46
"Rêexistina Keça Ereb Ji Paceyê Temaşe Dike" û rizgarbûna ji Erebbûnê	52
Çawa dixebeitin/Betal dimînin; Sivikkirina helwesta hişk	64
Ji bo cudakarîya li ser wan bi dawî bibe, bi rengspîyan re dizewicin	72
Pirsgirêkên navendêن rehabîlîtasyonê taybet: Mînaka Çewlikê	82
Du rêvebir li ser pêkanîna "Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê" nîqaş dîkin	92
Xwendekar û welîyên Çewlikî diaxivin	100
Kesên astengdar bi Pergala Hînbûna Bi Hev Re dikarin perwerde bibin	108
"Gawirên wir" çûbûn tenê tax mabûn, lê tax jî bi giştî ji holê rakirin	114
Migirdîç Margosyan behsa kolan û derdora sûran kir	126
Kesên li dijî nefretê jîyan, evîn û berxwedanê diparêzin	138
Ece Devrim: Min li dijî kedkarîya seksê a bi darê zorê gelekî li ber xwe da	144
Şahika: Meriv nikare paşê bibe trans	152
Emirhan: Divê berxwedana rêexistinî û tiştên hatine jîyîn werin tomarkirin	162
Komeleya Sarmaşıkê hat girtin; Gelo halê mexdûran çawa ye?	172
Bankeyeke Alternatîf: Bankeya Xwirekan a Sarmaşıkê	182
Projeya bi dekora dîrokî a ji bo Stenbola modern: Balat	192
Hunera di bin sîya qeyûman de	206
Hunermend û bîner bê dik mane, xwendekar ji konsevatuarê bûne	216
Di tevgera Kurd de kronolojîya zindanan	228
Operasyonên "KCKyê"	236
Hemû hevserokên partîyên Kurd di zindanê de mane	240

Li ser navê weqfê

Di destpêkê de divê bînin ziman ku ez zêdetirî 40 sal in li Tirkîyeyê rojnamegerî dikim, lê min heta niha ti serdemeke ev qas nebaş nedîtibû. Bêguman dema mirov behsa nebaşî û pirsgirêkan dike, ewil mafê ragihandin û xweîfadekirinê tê aqilê me. Li gorî min di vê dema hanê de ji bo rojnamegeran bêkarî û xeteriya derxistina ji karî jî qasê pirsgirêka binpêkirina mafê xweîfadekirinê, mezin û girîng e. Di rastiyê de hemû pisgirêk bi hev girêdayî ne.

15 sal beriya niha dema edîtor an nûçegihanek ji karbihata derxistin, hevalên wan ên karî nerazîbûna xwe bi dengekî bilind dianîn ziman. Wê demê di warê rojnamegeriyê de kesî gotinê “hawuz”, “alîgir”, “muxalîf” nedianî ziman û li ser medyayê dabeşkirineke wiha tinebû.

Niha rewş guheriye: Ew kesên huner û potansiyela rojnamegeriyê di wan de tine û bi wî halê xwe di saziyên medyayê de cih digirin, bi fesadiyê hewl didin ku xebatkarên helwesta wan ji ya rojnameyê cida ye, ji karî bidin avêtin. Xwezî bi wê hevgirtina berê! Bi taybetî di deh salên dawî de, ez bi dilekî xemgîn dibinim ku xwendekarên min ên rojnameger çawa neçar dimînin û li ser karê din dixebeitin.

Di serdemêni wiha de wekî hemû kar û pîşeyên din, girîngiya hevgirtinê derdikeve holê. Eger xwedî li rojnamegeran derkevin û rojnameger jî dema pêkanîna karêni xwe de vê yekê hîs bikin, wê ji bo mafê ragihandinê tesîreke girîng û bingehîn pêk were.

Em rojnamegerên Tirkîyeyê mixabin ku qasî pêwîstiyê hev nagirin. Ji xwe tişteke wiha pêkbihata, me yê îro li ser navê Weqfa Ragihandinê ya IPSyê ji bo rojnamegerên bêkar bernameyeke wiha pêk neaniya. Ji ber ku rojnamegerên niha dixebeitin jî, li hemberî patron û dewletê hewl didin ji karêni xwe neyên avêtin. Ya rastî divê em vê rewşa heyî jî fêm bikin. Berê, dema me nû dest bi rojnamegeriyê kiribû, qet nehat aqilê me ku wê serdemeke wisa bê, wê siyasetmedarek li patronêni me bigere û me ji kar bide derxistin.

Rojnamegerên nekarine biavêjin zindanan, bi zorê birçîbûn û bêkarbûnê hewl didin kontrol bikin. Ciwanekê/î ku ji bo mehaneyê bi 1200 Lîreyê Tirkan raziyê xebatê bûye, li hemberî sîstemê têk diçe. Wê ji alîkî ve evîndar bibe, bizewce, zarokên wê/wî çêbibe; ji alîkî ve jî ew kes wê hewl bide karê xwe yê rojnamegeriyê têr û tijî pêk bîne û pere jî qezenc bike. Mixabin ev yek êdî nemûmkin e. Di nav vê serdema reş û tarî de jî hêvî dîsa heye: Di demên wiha de derfetêni ji bo lêgerîna rê û rîbazên hevgirtin û berxwedanê çêdibe.

Di 15-20 salên dawî de qet we bihîsitiye ku rojname, kovar an televîzyonek bi riya ezmûnê kesan hildide ser kar? Bêguman “ezmûna derewî” ya ku TRTyê pêk tîne, ne tê de. Ji 80 fakûlteyên ragihandinê bi sedan ciwan bi hêviya rojnamegerbûnê destûr digrin. Lîbelê êdî, huner, potansiyel, liyaqet êdî weke pîvan nayêñ dîtin. Pîvanêñ heyî li ser esasê “mezinê me çi bibijin, ya rast ew e” pêk tê. Ev yek bêguman ji bo rojnamegerek gunehê herî mezin e. Hewl didin ku rojnamegerên niha bikin jenerasyona ku ti pirsiyarekî nakin, nerehetiyê di xwe de hîs nakin û kelecan nabin.

Hin kesan axavtinêñ di bin simbêl de wekî ku ez niha dikim, dibe ku weke eybekî bibinin. Lîbelê li gorî min ji bo xelasbûna ji vê serdema reş û nexweş, ji vê zêdetir ti çare nîne.

Ji ber rojnamegerên ku ji kar hatine derxistin û ser de jî wan ji rojnamegeriyê dûr xistine, ji bo gel mafê ragihandinê bin-erd bûye. Divê gotina “rojnamegerî ne sûc e” wekê klîsek neye fêmkirin. Ya rastî ev yek, têkoşîna ji bo rizgarkirina rûmeta rojnamegeriyê ye. Ti keseke ku xwe rojnameger dihesibîne, nabe ku li derveyî vê berxwedanê bimîne.

Tûgrûl Eryilmaz
Endamê Desteya Rêveberiyê yê Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

Rojnamegerên bêkar bi çêkirina nûçeyan li ber xwe dan

Li ser azadiya xweîfadekirinê gelek zextêñ mezin têñ kirin. Di vî warî de bêguman ewil sansûrkirin û dozêñ derbarê rojnamegeran de hatine vekirin, tê bîra mirov. Ji ber ku ev pêkanînê hanê ku li sere rojnamegeran tî kirin, êrişen gelek mezin in. Lîbelê ji bo rojnamegeran mûdaxeleyeka herî mezin, derxistina ji karî ye. Ji ber ku eger rojnameger ji bo pêkanîna karê xwe ti derfet nebînin, ev ji bo wan dibe yek ji cûreyên “kuştina sivîl”.

Bêguman ji bo rojnamegeran pirsgirêka bêkarbûnê, tişteke nû nîne. Nêzî 25 salan in min dest bi rojnamegeriyê kiriye. Dema min ev nivîs dinivîsand, bi xwe fikirîm ka gelo ez çend caran bêkar mame. Min pê zanî ku gelek caran bêkar mame û ez hejmara wê jî nizanim. Di krîza 2001an de dema ez bêkar mam, gelek tiştêñ nexweş hate serê min. Wê demê krîzeke mezin hebû, em li koverek de dixebeitîn û ji nişkeva em ji karî hatin derxistin. Bi rastî jî ez mubalaxa nakim. Kartêñ ku me pê deriyê saziyêñ xwe vedikir, hatibû betalkirin û me nekarî em têkevin saziyê. Piştre em ligel ewlekar ve çûne hundir, me dît ku komputerên me ji ser maseyan hatine hilanîn. Destûr dan ku em eşyayêñ xwe yêñ ferdî bistînin. Ewlekar heta muhasebexaneyê ligel me hatin û pişt re em ji saziyê hatin derxistin.

Em ji krîza aborî ditirsîyan. Lê belê tirsa me hat serê me jî. Wê demê min nû dest bi kar kiribû. Ev tirs ji ber krîzê normal bû. Pişt re ez gelek caran dîsa bêkar mam lê, ez êdî pir ber nediketim. Pişti hewldana derbeya leşkerî ya di 15ê Tîrmehê de pêk hat, bi îlankirina OHALê (rewşa awarte) ve li dijî gel hewldana bêkarxistinê dest pê kir. Ez di vê serdemê de ji kar nehatime derxistin lê, weke sala 2001an dema kartê min hatibû betalkirin, ew tirs û aciziya min dîsa xwe da der. Rewş her diçe zêdetir xerab dibe. Ez gelek matmayî bûm. Weke pirsa ku niha gelek kes tîne ziman, “gelo ev yek rast e?”. Mixabin, rast e.

Min bi tecrûbeyên xwe yêñ bi salan de fêm kir ku bêkarhiştina rojnamegeran tişteke tesadûfî nîne. Patronan gelek baş dizanibûn ku wê kê ji kar derbixin. Bêguman min wê demê fêm kir ku dema rojnamegerek ji kar were derxistin, ev yek li dijî gel hewldana binpêkirina mafê ragihandinê bi xwe ye. Dema rojnamegereke mûxalif ji kar bihata.

Dema hevaleke me ji karbihata derxistin, ji bo standina eşayênen xwe yên li saziyê -ku zêdeyî pirtûk bûn- kartonek dianî êşayênen xwe tê de bi cî dikir. Dema bi wê kartonê ji ber me derbas dibû dicû, me tirs, şerm û poşmantî di dilê xwe de hîs dîkîr. Lê pirî caran ez kesê mayî ne, kesê dicû bûm.

Zext û neheqiyênu ku berê li ser rojnamegeran dihat kirin, ji yên niha pir cuda nebû. Îro heman tiştan bi zêdeyî û dijwarî pêk tînin.

Di raporê azadiya xweîfadekirinê de li gorî krîteran, yên herî zêde derdikeve pêş, hejmara rojnamegeren girtî ne. Bêguman peydakirina agahiyê rojnamegeren girtî, binçavkirî û yên derbarê wan de doz hatiye vekirin; ji yên ji karênu xwe hatine derxistin hêasantir e.

Piştî hewldana derbeya leşkerî ya 15ê Tîrmehê, me dît ku li Tirkîyeyê zext û zordariyê heyî, gihiştiye asta herî jor. Di vê serdema ku zêdetir astengî li ser mafê xweîfadekirinê û ragihandinê tê kirin, pirsgirêka rojnamegeren ji karênu xwe hatine derxistin jî zêdetir derdikeve holê.

Eger em çend agahiyen bînîn ziman, wê xûyabibe ka rewş çi qasê giran e. Li gorî Rapora Çavdêriya Li Medyayê-2016 sala borî bi temamî 778 kartên rojnamegeriyê hatin betalkirin, dest danîn ser mal û milkên 54 rojnamegeran, pasaporten 46 rojnamegeran hatin betalkirin. Li gorî Rapora Çavdêriya Li Medyayê ya BIAYê di sala 2016an de hejmara rojnamegeren ji karhatine derxistin 2708 e. Cemiyeta Rojnamegeren Tirkîyeyê beriya niha ragihandibû ku, bi KHKyan 179 saziyênen medyayê hatine girtin û li gorî vê yekê herî kêm 10 hezar xebatkarênen medyayê bêkar mane. Di sektora medyayê de bi rastî jî gelek zehmet e ku mirov hejmara rojnamegeren bêkar mane, bi lêkolînekê teqez eşkere bike. Lîbelê diyar e ku hejmara saziyênen hatine girtin û rojnamgeren ku di wan saziyan de xebatkarbûn, nêzî hev in.

Em di bianetê de her 3 mehan carekê, raporê çavdêriya li medyayê amade dîkin û em pirsgirêka rojnamegeren ji karhatine derxistin, weke mijareke taybet tînin ziman. Em vê pirsgirêkê astengî û zexteke li ser mafê xweîfakirinê qebûl dîkin.

Projeya "Rojnamegeren Bêkar Li Pey Nûçeyen Xwe Ne", di dema OHALÊ de ji bo piştevaniya rojnamegeren ji karhatine derxistin bi fînansoriya Serkonsûlxaneya Hollandayê ya Stenbolê û Programma Matra-Insan Hakları ve pêkanî. Me agahiya ji bo serlêdana projeyê di 9ê Kanûna 2016an de ragihand. Serlêdanen heta 30ê Kanûnê hatine şandin, hatin qebûlkirin.

Li gorî vê projeyê ji bo her nûçeyekê 2 rojnamegeren bêkar wê werin hilbijartin û bi temamî 10 nûçeyen werin çekirin jî bi telîfkirî dê li bianet'ê de bihata weşandin.

Bi temamî 38 serlêdan hatin kirin, jûriya ku ji Prof. Dr. Yasemîn Inceoglu, rojnameger Tûgrûl Eryilmaz, Nadîre Mater, Banû Tûna, Mûrat Çelîkkan û Dogû Eroglu pêk dihat di encama nirxandinan de de 10 ji wan serlêdanan qebûl kirin.

Di 18ê Nîsana 2017an de weşandina nûçeyan dest pê kir. Li ser 10 mijaran de heta 3ê Gulana 2017an bi temamî 26 nûçe hatin weşandin.

Di çarçoveya "Projeya Rojnamegeren Bêkar Li Pey Nûçeyen Xwe Ne" bi 2 dosyeyen ku Îrfan Aktan û Eren Guvendik ku li ser mijara rewşa rojnamegeren ji karênu xwe hatine derxistin de amade kiribûn dest pê kir. Di dosyeya yekem de xûyabû ku rojnamgeren ji karênu xwe hatibin derxistin jî dest ji rojnamegeriyê bernedidan. Nûçeya duyem ya bi navê "Dîasporaya Nû" de Volkan Agir û İbrahîm Karci li ser mijara kesen piştî îlankirina OHALÊ çûne derveyî welêt xebateke baş pêk anîn.

Pişt re Aynûr Tekîn û Ferhat Demîr li ser ferq-û-meyîliya li dijî Tirkîn Afro nûçeyeke ji 3 dosyeyan pêk dihat, hat weşandin. Dû re jî nûçeya li ser perwerdehiya kêmlebatan di mînakgirtina Çewlikê de ku Remzî Bidancı û Leyla Ayaz ve li ser xebitîbûn, hat weşandin.

Oktay Altekîn û Zana Kîbar li ser navçeya Amedê, Sûrê ku di qedexeya navbera zê Kanûna 2015an - 9ê Adara 2016an dewam kir û bi temamî hat wêrankirin de xebitîn. Di nûçeyê de bi taybetî li ser wêrankirina taxa Hasirliyê ku weke taxa Gawiran dihat naskirin û beriya niha şeniyen wir bi temamî Ermén bûn de lêkolîneke baş kirin.

Michelle Demishevich û Elîf Ûral di nûçeya amade kirin de li ser jiyana 4 kesan berxwedana transan anîn ziman.

Komeleya Sarmaşikê yek ji saziyên sivîl bû ku di 22ê Mijdara 2016an de bi KHKyê hat girtin. Komele ji bo alîkarîdayîna feqîran hatibû damezrandin û rojê li 32 hezar kesan xwarin dida belavkirin. Nûrhak Yilmaz û Sertaç Kayar li ser damezirandina komeleyê, pêkanîn wan û her wiha piştî girtinê rewşa kesen alîkarî li wan hatiye birin ve nûçeya xwe amade kirin.

Yek ji mijarêni ji wan nûçeyan, pirsgirêkên ji ber pilansaziya guhertina bajêran bû. Ecem Engîn û Şenay Ozturk di vê çarçoveyê de li Balatê nûçeyeke ji du dosyeyan pêk dihat amade kir..

Nûçeya Zehra Dogan û Refîk Tekîn li ser “Hunera Di Bin Siya Qayûman De” bû. Piştî OHALê li ser şaredariyên Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) qayûm hatin tayînkirin. Wan jî dosyeyan xwe bi 3 nûçeyen derbarê destwerdan û berterafkirina karêن hunerî ku ji hêla qayûman ve hatin kirin de amade kirin.

Dosyeya dawî “Kronolojiya Zindankirinê Ya Li Dijî Tevgera Kurd” bû. Ji 3 nûçeyan pêk dihat. Naveroka wê dosyayê jî navbera salên 1925-2016 de zext û zilma li ser Tevgera Siyasi ya Kurdan bû.

Ev proje li ser esasê rojnamegeriya mafparêz û aştîwaz ku helwesta bianetê ye ve pêk hat. Nûçeyen hatine çêkirin li ser pirsgirêk û krîzên ku salên dawî de li Tirkîyeyê rû daye de ye. Di vê projeyê de mebesta me ya herî girîng, balkışandina ser jikarderxistina rojnamegeran, binpêkirina mafêن xweîfadekirin û ragihandinê ye. Em bi vî awayî vê xebatê pêşkêşî we dikin. Cara yekem xebateke bi vî rengî tê kirin. Di 3ê Gulanê de dema em ji bo dawîbûna Projeya Rojnamegerên Bêkar hatin gel hev, me gelek caran di nav xwe de temeniya dawîbûna zext û astengiyêni li ser mafêن xweîfadekirin û ragihandinê û dawîbûna pirsgirêka rojnamegerên bêkar anî ziman. Bi heman hest û hêviyê, bi baweriya rojêن xweş em careke din dixwazin ku li ser mijarêni heman rengî de xebatan pêk bînin.

Halûk Kalafat

Hevberpirsê Weşanê yê bianetê

Derbarê projeyê de

Me projeya “Rojnamegerên Bêkar Li Pey Nûçeyên Xwe Ne”, bi fînansoriya Serkonsulxaneya Hollandayê ya Stenbolê û Bernameya Mafêن Mirovan a Matrayê pêk anî. Supervîzîtorê projeyê Mûrat Çalîkkân, kordînator Oznûr Sûbaşı bû. Di jûriye de Banû Tûna, Tûgrûl Eryilmaz, Halûk Kalafat, Nadîre Mater, Yasemîn Inceoglu û Dogu Eroglu cih girtin.

Ji bo piştevaniya rojnamegerên bêkar, me li 20 rojnamegeran 10 nûçe dan amade kirin. Me di 18ê Nîsanê de dest bi weşandina nûçeyan kirin. Di 3ê Gulana Roja Azadiya Medyayê ya Cîhanê de weşandina nûçeyan bi dawî bû. Di heman rojê de em li gel rojnamegerên bêkar ku nûçe amade kirin û gelek hevalên din re hatin gel hev. Edîtortiya nûçeyen ku bi Tirkî, Kurdî û Îngîlîzî hatin belavkirin, Halûk Kalafat û Nîlgun Üyasal kir.



**Çi qasî ku ew “karên nû” dîkin jî,
ew rojnameger in**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

NENIVÎSE ROJNAMEGERO/Ê NENIVÎSE - 1

*Rojnamegerên çepgir, Kurd, ên ji medyaya
Fetullah Gülen... Hin ji wan hêjî betal in, hin ji
wan marangoztiyê dîkin, hinekan ji xwe re dikan
vekirine, hinekan kafe vekirine, hin ji wan jî ne
li holê ne. Serokê TGSyê der barê mijarê de hin
nirxandin kirin.*

Îrfan Aktan
Eren Guvendik

Eger roj were û zextên li Tirkîyeyê bi dawî bibe, helbet dê lêkolîner ji bo lêkolînê der barê vê demê de nûçeyên medyayê berhev bikin. Dê pirtûk werin nivîsandin, dokumenter werin çêkirin, bi şahidan re hevpeyvîn werin kirin. Bê guman ji bo lêkolînan çavkanîya sereke, dê bûyerên ku di medyaya nivîskî û dîmenî de hatine weşandin an jî qet cî negirtine bin. Lê qeydên biserdegirtina polîsan ên di weşana zindî de, dirûşmeya “çapemenîya azad bêdeng nabe” ku rojnamegerên mexdûr di korîdorên daghehan de berz dikirin, parêznameyên rojnamegerên li dadgehê, îdianameyên pêkenok ên der barê wan de; dê bibe mijarên dokumenter û lêkolînan.

Hikûmeta AKPyê jî bûyerên Geziyê ên sala 2013yan bi şûn de li hemberî nerazîbûna civakî, polîtîkayeke ji zextên dûrî aqilan, sansur û otosansur meşandin. Di destpêkê de hewldanên “nîşankirina” patronan pêk hat û ji sala 2016yan bi şûn de jî bi Biryarnameyên Di Hukmê Qanûnê de û bi qeyûman dest danîn ser sazîyen medyayê û di encama operasyonan de bi hezaran kes ji karên xwe bûn.

Hin ji rojnamegerên ku betal mane bi zehmetîyeke mezin karîbûn li cîyên nû ji xwe re kar peyda bikin lê gelek rojnameger ku niha hejmara wan nedîyar e, ji ber zextên desthilatdarîya AKPyê neçar man ku sirgûn bibin. Niha zêdetirî 10 hezar rojnameger ji karê xwe bûne û hê jî betal in.

Li bendê ne li karê xwe vegeerin

Rojnamegerên betal êdî di sektora medyayê de ji xwe re li kar nagerin, hejmareke hindik ji wan jî di sektorên din de ji xwe re dixebeitin û bi vî awayî hewl didin ku debara xwe bikin. Lê belê hemû dixwazin ku zextên sîyasî bi dawî bibin û vegeerin ser karê xwe.

Serpil Savumlu, 15 sal in ku rojnamegerîyê dike û niha betal e. A rast, heta vê dawîyê dixebeitî. Lê belê wê li Bandırmayê dikan vekiribû û herî dawî neçar ma ku wê dikanê jî bigire. Niha hewl dide ku ji xwe re karekî peyda bike.

Gökhan Kazbek 27 sal in ku rojnemagerîyê dike. Niha di karekî din de dixebite: Marangoztî.

Semra Pelek 18 salan rojnamegerî kiriye. Salekê berî Savumlu û Kazbek ku dema li Milliyetê dixebeitî û bi talîmatekê ji karê xwe hat avêtin. Piştî ku salekê betal ma, wê jî di şîrketekê de karekî li ser têkilîyen civakî ji xwe re peyda kir.

Denizcan Abay 4 sal in ku rojnamegerîyê dike. Ji 4ê Kewçêra 2016yan vir ve betal e. Di heman rojê de radyoya ku dêya wê lê dixebeitî jî bi KHKyê hat girtin û dêya wê jî betal ma. Bavê wê jî rojnameger e lê ji ber ceza li wî hatiye birîn, di sala 2012yan de çûye Almanyayê û bûye penaber. Denizcan Abay dixwaze ji xwe re kafeyekê veke.

Ihsan Çağrı Boyacı berî çend salan dest bi rojnamegerîyê kiribû. Heta vê demê li Enqereyê li barekê wekî garson dixebeitî. Lê belê ji ber ku wî û xwedîyê kar li hev nekiriye, ji kar derketiye. Niha hewl dide ku ji xwe re karekî peyda bike.

Ahmet Gülmez jî dikan vekir: Li Amedê dikana cafe-sahafê. Niha karê wî baş e.



Ji bo temâşkirina vîdeoyê bitikîne

Kameraman Dedeoğlu

Dema bûyerek çê bibe, kameramanên nûçegihan bi xirecir hewl didin ku dîmenekî baş bikişînin. Car caran ji bo vê yekê di nava xwe de şer dikan. Turgut Dedeoğlu 31 salan rojnamegerî kiriye. Di nava rojnamegerên li Enqereyê de wekî “dede” (kalik) tê binavkirin û rêz lê tê girtin.

Dema bûyer çê dibin, kameraman di nava xwe de dikan xirecir lê ji “dede” re her tim cîyê herî baş didin wî. Ew di sala 2011yan de êdî malnişîn bûye, lê belê ji ber ku zarokên wî di zanîngehê de xwendekar in, ew hê jî dixebite.

Ew jî ji Kewçêra 2016yan vir ve betal e û kameramanê qedirbilind di medyayê de nikare ji xwe re tu karî peyda bike.



Ji bo temâşkirina vîdeoyê bitikîne

Serpil Savumlu: Ji pêşkêşvanîyê heta esnaftîyê

Serpil Savumlu 15 salin ku rojnameger e. Herî dawî li İMC TVyê xebitîye û tecrûbeya wê a esnaftîyê jî heye: Li Bandırmayê dikana çerezfiroşiyê vekiriye. Lê karê wê li hev nehatiye. Savumlu di sala 2002an de li rojnameya Evrenselê dest bi rojnamegerîyê kiriye. Piştî 2 salan li buroya Enqereyê xebitîye, li Stenbolê nûçegihanîya li DGMyê kiriye.

Paşê heta sala 2009an li Hayat TVyê bultena êvarê pêşkêş kiriye. Di sala 2012yan de li İMC TVyê dest bi kar kiriye, him edîtorî him jî pêşkêşvanîya Mor Bültenê a ku tê de nûçeyên der

barê jinan de tê berhevkirin, kiriye: “Di kurtejîyana min de rojnamegerî hebû heta niha. Lê belê êdî esnaftî jî çê bû. Lê tenê demekê kurt.”

Di 29ê Rezbera 2016yan de bi KHKya hejmara 668an İMC TV jî di nav de 12 kanalên TVyê û 11 radyo hatin girtin. Piştî ragihandina biryarnameyê polîsan avêtin ser avayıya İMC TVyê. Biserdegirtina polîsan, di weşana İMCyê a zindî de hat weşandin. Xebatkaran biserdegirtin protesto kirları. Bi heman biryarnameyê, Hayatın Sesi Tv, Denge Tv, Jîyan Tv, Zarok Tv, Van Tv jî yek bi yek hatin girtin.

Dema ku Savumlu li cem xwesîya xwe a li ber mirinê bû, haya wê ji girtina kanalê çê bû.

“EZ li nexweşxaneyê bûm. Agahî hat ku dê televîzyon were girtin û dê polîs biavêje ser kanalê. Li alîyekî girtina kanalê, li alîyê din mirina xwesîya min... Hemû bi ser hev de hatin. Paşê taqeta min nema ku ez ji xwe re li kar jî bigerim. Ji xwe tu hêvîya min tune bû ku ez karekî peyda bikim. Hemû cîyên ku min dikarî ez lê bixebitim, hatin girtin. Li ser vê yekê ez neçar mam û vegeรiyam bajarê xwe Bandırmayê.”

“Min li vir dikanek vekir. Min li dikanê çerez difirotin. Lê belê ez ji bazirganîyê fêm nakim. Bê guman pirsgirêk ne tenê ez bûm. Dema hinekan nok jî dikirîn, gram bi gram dipîvan. Xizanîyeke mezin hebû. Lê ji alîyekî din ve jî nijadperestî jî dihat kirin. Bandırma cîyekî biçûk e.”

“Di demeke kurt de derdor pê hesîya ku min li İMC TVyê kar kiriye û kanal bi KHKyê hatiye girtin. Her zanîn ku ez bi kesekî Kurd re zewicî me. Navê kurê min Deniz Jîyan e. Lê min nikarîbû ku ez bi navê Jîyan bangî wî bikim. Ji ber van sedeman karê dikanê li hev nehat û min ew der jî girt.”

Gökhan Kazbek: Ji edîtorîyê heta marangoztîyê

Em niha li Stenbolê berê xwe didin marangozxeke Okmeydanîyê. Rojnamegerê 27 salan li vir dixebite. Gökhan Kazbek, di sala 1989an de li rojnameya Sabahê dest bi rojnamegerîyê

kiriye. Li Hurriyet, Turkish News, Star Tv, Kanal 6, Ata Tv û TRTyê xebitîye. Ji ber twitênu ku piştî bûyerên Geziyê bi par ve kiribû, di Kewçera 2013yan de ji kar hat derxistin.

Bê guman wekî rojnamegerên ji Geziyê bi şûn de ji karê xwe hatine avêtin, derîyê hemû medyaya serdest li wî jî hat girtin.

Piştî betalbûna sal û nîvekê li İMC TVyê dest bi edîtorîyê kir. Berî marangoztîyê ev karê wî ê rojnamegerîyê ê dawî bû. Piştî girtina İMC TVyê, ji bo xebatê serî li gelek cîyan da. Lê gelekî wan bersiva neyînî dan û hinekan jî qet bersiv nedan wî.

Kazbek tê gihiştiye ku ew nikare ji xwe re karekî bibîne. Li ser vê yekê bi Mevlüt Aydoğanê ku li TRTyê kameramantî kiriye re dest bi marangoztîyê kiriye.

Mevlüt Aydoğan jî piştî protestoyêن Geziyê, ji karê xwe ê TRTyê hatiye avêtin û demekê li Ulusal Kanalê xebitîye. Lê ji ber ku 9 mehan meaşê wî nehatiye dayîn, ji wir jî derketiye û li Ajansa Nûçeyan a Cîhanê dest bi kar kiriye. Ji ber ku ajans piştî 15yê Tîrmehê hatiye girtin, ew kar jî ji destê wî çûye.

Kazbek wê demê wiha vedibêje: “Mevlüt ji bo kêfê û dembihurandinê marangoztî dikir. Piştî İMC hat girtin, em peyivîn û me biryar da ku em vî karî bi hev re bikin. Ez him karê îmalatkirinê him jî karê bazarkirin û firotinê dikim.”

Ew tenê di îmalatê de dixebite. Hevalekî me ê din jî heye ku ji destpêkê ve marangoztî kiriye. Em car caran alîkarîyê ji wî jî dixwazin. Atolyeya me heye. Ji maseyê bigire heta odeya razanê em dikarin her tiştî çê bikin.”

Çi qas jêhatî bin jî pereyê ku ji marangoztîyê qezenc dikan; zarokên wan ên li zanîngehê li alîyekî, têra kirêya xanîyên wan jî nake.

Kazbek dibêje: “Piştî İMC hat girtin, meha destpêkê em wekî masîyên ji avê derketî bûn.” Rojekê çar pênc hevalên wî ên rojnameger ên betal, gazî wî dikan ku were kafeyeke li Kadıköyê.

Dema Kazbek diçe kafeyê, dibîne ku hevalên wî ji bo anketê, bîrayê bi muşterîyan didin tamkirin û bi vî awayî hewl didin ku pereyan qezenc bikin:

“Ew hemû rojnameger bûn. Wekî mînak; hevaleke me hebû e-bazirganî dikir, hewl dida li ser ïnernetê kincen jinan bifiroşe. Çend hevalan ji xwe re karêni bi dewamî peyda kirin. Lê belê hê jî gelek heval hene ku ji xwe re tu kar peyda nekirine.”

“Min wekî rojnamegerekî di salên 90â de jî OHAL dîtibû. Lê min demeke wiha qet nedîtibû. Ez 51 salî me, min 27 salan ev kar kir. Lê belê niha ne mal, ne jî wesayîtek; tiştek di destê min de tune ye”



Ji bo temâşkirina vîdeoyê bitikîne

Semra Pelek:

Ên li jor navêne me şandibûn

Dibêjin piştî derbeya 12yê Rezberê gelek rojnameger betal mane û wan wê demê nivîskarîya reklamê kirine. Semra Pelek jî di sala 2015yan de dema ku li Milliyetê edîtorîya polîtîkayê dikir, li gel 10 xebatkarên din ji kar hatin avêtin.

Ji bo Pelek destpêkirina karekî di warê din de bê guman ne hêsan e. Lê belê dema ew li rewşa hevalên xwe ên din dinêre halê xwe baştir dibine: "Min bi dilxwazîyeke mezin rojnamegerî dikir, lê belê nizanim ka ew sektor ci qasî li min hat. Di sala 1996an de min li Zanîngeha Stenbolê di Beşa Ragihandinê de dest bi perwerdeyîya lîsansê kir. Ji pola duyemîn bi şûn de, min li Milliyetê dest bi nûçegihanîyê kir. Heta sala 2003yan min nûçegihanîya li DGMyê (Dadgeha Ewleyîya Dewletê) kir. Paşê ez li cîyên cuda xebitîm. Di dema dawîyê de dîsa derbasî Milliyetê bûm.

Piştî hilbijartina 7ê Pûşperê di Rezbera 2015yan de gelek kes ji kar hatin derxistin. Dema me behsa sedema vê yekê kir jî gotin: "Ên li jor navêne we şandine". Lê em nizanin ka ên li jor kî ne.

Gelo ên li jor, van lîsteyan li gorî ci çê dîkin? Bersiva Pelek wiha ye:

"Di 10-15 salên vê dawîyê de mudaxeleya sîyasî a AKPyê heye. Ji bilî vê, ji salên 1990î bi vir ve di medyayê de guhertinek tê kirin. Rojnamegerên xwedî tecrûbe

ji kar diavêjin, di şûna wan de ciwanan bi erzanî didin xebitandin. Bi taybetî piştî 7ê Pûşperê kesên muxalif di rojnameyan de nehiştin. Tu derfetek nemaye ku rojnamegerek karê xwe li gorî rêgez û pîvanên xwe bike. Yek bi yek ji rojnamegeran tê xwestin ku bibin alîgir.

"Ev yek li dijî rojnamegerîye ye. Dema ez li Milliyetê bûm, rasterast zorlêkirineke ji bo alîgirbûnê tune bû. Lê belê ji ber ku ez edîtora polîtîkayê bûm, gelek zext dihat kirin. Pirsên wekî "Te çîma ev nivîs, ew qasî mezin daye, te çîma bi vî serenavî daye?" zêdetir bûn. Dema min manşeta nûçeya partîya sereke a muxalefetê jî bi 15 cmyan diweşand, dibû pirsgirêk. Bê guman ji ber vê yekê meriv ji astekê bi şûn de rojnamegerbûna xwe dide ber çavê xwe.

"Kîjan bûyer an agahî ci qasî girîng be meriv hewl dide ew qasî cî bide wê, lê belê hin alîyên din desttêwerdanê dikin. Ev yek li dijî helwesta ku tu heta niha bawerîya xwe pê tînî ye. Ji ber vê yekê, piştî ku ez ji Milliyetê hatim avêtin, min serî li tu cîyî neda, ji xwe. Di medyaya alternatif de jî pirsgirêkên aborî zêde ye û ev yek jî bandoreke neyînî li ser îstîxdamê dike."

Denizcan Abay:

Malbata rojnamegerên betal

Deniz Abay, ji ber cezayên ku li bavê wê ê rojnameger Necatî Abay hatiye birîn, tecrubeya wê a zextên li ser rojnamegeran, heye. Bavê wê Abay jî ji



Ji bo temâşekirina vîdeoyê bitikîne

ber nûçeyên ku wî çê kiriye ceza lê hatiye birîn. Necatî Abay di sala 2012yan de li Almanyayê bûye penaber.

Dema Denizcan Abay lîse dixwend, bavê wê berdevkê Platforma Hevgirtina Rojnamegerên Girtî bûye. Dema bavê Denizcanê çeteleya der barê rojnamegerên girtî de amade dikir wê jî alîkarîya bavê xwe dikir. Bi vî awayî berdêla ku ji bo rojnamegerîya rexnegir tê dayîn ji nêz ve dîtiye.

Ji bo wekî dê û bavê xwe rojnamegerîye bike, piştî fakulteya ragihandinê diqedîne, li Özgur Radyoyê dest bi kar dike. Karê wê ê duyemîn li İMC TVyê bûye û piştî vê yekê ew jî bi dawî bûye. Di 4ê Kewçêrê de li gel İMCyê, Özgur Radyo jî hatiye girtin. Dêya wê Leyla Abay jî ku di radyoyê de rêvebir bû, hatibû binçavkirin.

Berdewamîya serpêhatîyan em ji Deniz Abay guhdarî bikin:

"Bavê min di sala 2003yan de dema li rojnameya Atılımê dixebeitî, hat binçavkirin û bi dû re hat girtin. 6 mehan girtî ma. Paşê dozê dewam kir. Di vê demê de berdevkê Platforma Hevgirtina Bi Rojnamegerên Girtî Re bavê min bû. Salên min ê lîse û unîversîteyê bi amadekirina lîsteya rojnamegerên girtî re derbas bû."

Niha rewşa malbata Abay wiha ye: Dayik betal e, bav bûye penaber, Denizcan jî piştî rojnamegerîya 4 salan dixwaze ji xwe re kafeyekê veke.

Lê belê wekî ew dibêje tenê dilê wê heye ku vî karî bike. Lê belê armanca wê a sereke ew e ku dîsa dest bi rojnamegerîye bike.

Faruk Balıkçı: Derî li ser me hat girtin, lê em di kulekê re ketin hindur

Bi KHKya hejmara 668an ku di 29ê Rezbera 2016yan de hat ragihandin, Azadî TV, Jîyan TV, Zarok TV, Gün TV, Azadîya Welat, Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê hatin girtin û rojnamegeran ji bo şermezarkirinê di 10ê Kewçêra 2016yan de dest bi çalakîya rûniştina 3 rojan kiribûn.

Yek ji rojnamegerên ku tev li çalakîyê bûye Faruk Balıkçı bû û ew dibêje:

“Tenê ji Amedê 70 rojnameger di şevekê de betal man.”

“Ez li İMC TVê dixebeitîm. Min tu serlêdaneke hiqûqî nekir û tazmînat nexwest. Me di destpêkê de xwest ku em çalakîya xwe wekî greva birçîbûnê bidomînin. Lê belê ji ber nixandinê li derdorê hat kirin ku wê çalakî negihêje armanca xwe, me jî dev ji vê biryarê berda.”

“Piranîya hevalên me ku wê demê betal man, hê jî tu kar peyda nekirine. Gelek ji wan di sektorên din de ji xwe re li kar digerin. Min ji xwe re di malpera “ozguruz”ê de kar peyda kir, lê belê di vê rewşa hanê ku gelek hevalên me betal in de, ji dilê meriv nayê ku rojnamegerîyê bike. Ez nikarim bibejim ku em wekî berê karê xwe bi dilxwazîyeke mezin dikin.

Lê belê di encamê de wan derî li ser me girtin, em di kulekê re ketin hindur. Gelek hevalên me hene ku nikarîbûn di wê kulekê re jî derbas bibin.

Medyaya “Cemata Gülen”

Ji ber zextên ku hatine kirin gelek rojnameger betal mane û gelekên wan jî xebatkarên medyaya ku nêzî Cemaeta Fetullah Gülen e. Li gorî agahîyên rêexistinê medyayê hejmara wan di navbera 2500-3000an de ye.

Di biryarnameyê de wiha hatiye gotin: “Têkilîya wan bi FETÖ/PDYyê (Rêexistina Terorî a Fetulahperestan) re û bi sazîyên bi vê rêexistina terorê re girêdayî ku pêkanînên li dijî hebûna dewletê dikan, heye.”

Lê belê kesên ku piştî girtina medyaya Cemaeta Gülen betal mane ji ber tirsa “sûcdarkirina bi derbeyê re” nikarin dengê xwe bikin. Hin rojnamegerên ku berî niha li cem wan xebitîne, vê yekê vedîşîrin. Heta ku ji teklîfa me a roportajê re jî gotin na.

21 jê girtî der barê 30 xebatkar û nivîskarên Zamanê de bi îdiaya “teşebusî derbeyê kirine” û “endamê rêexistina terorê ne” doz hatiye vekirin û ji bo wan muebeta 3 caran û 15 sal jî ceza tê xwestin. Ev yek jî sedema vê tirsa wan dide nîşan.

Bi me re napayevin

Wekî mînak; rojnamegereke ku demeke dirêj di Bugünê de xebitîye, ji ber ku cîyekî teklîfa xebatê jê re şand, randewûya me betal kir. Wê rojnamegerê got: “Ez li hemberî we mehcûb im, lê min du rojnamegerên jin ku dê bi we re bipayevin, peyda kirin. Paşê ji me re ragihand ku her du rojnamegerên jin jî naxwazin bipayevin.

Ji ber ku yekê ji wan bi hemû pereyên xwe dest bi karê li ser ûnâretê firotina bazinan kiriye, naxwaze ew kar jî ji deste wê here.

Nûçegihaneke berê ku niha di fabrîkeyekê de dixebite jî, ji bo karê wê ê niha ji dest neçe daxwaza me a hevpeyvînê red kir. Yêkî din (kameraman) got, “Ji xwe tu tişt nema ku were serê me. Tenê maye ku me biavêjin girtîgehê. Ji ber vê yekê ez naxwazim bipayevin.” û wî jî daxwaza hevpeyvînê red kirin.

Rojnamegereke din ku dema di medyaya cemaetê de dixebeitî ji kar hatiye avêtin, wiha dibêje: “Dema ez di nava wan de bûm, ez wekî zombîyan bûm. Ji ber ku tu têkilîya min bi dîn û îmanê re tune bû. Lê belê niha zorê li min dikin ku îspat bikin ez FETÖyî me.” Ji ber dibe ku karekî din ji xwe re bibîne, naxwaze bi me re bipayive.

Rojnamegerên di medyaya cemaetê de li ku ne?

Serokê Sendîqeya Rojnamegerên Tirkîyeyê (TGS) Gökhan Durmuş dibêje ku piştî operasyonê li dijî medyaya Cemaeta Fetullah Gülen ew negihiştine endamên TGSyê jî.

“Di encama operasyonê li dijî cemaetê de heta niha 2 hezar rojnameger betal mane. Wan kesan heta niha ji ber tirsa sûcdarkirina bi FETÖyê re xwe veşartine. Ev yek zelal e. Tu têkilîya piranîya wan kesan bi vê yekê re tune ye. Tenê ji bo pereyê nanê xwe xebitîne. Lê belê dibêjin ku derkevin û der barê vê yekê de daxuyanîyekê bidin dê werin sûcdarkirin. Ji xwe nêzîkî 80 rojnamegerî ji ber FETÖyê têr darizandin. Ji ber vê sedemê gelekî ditirsin û li derekê xwe nîşan nadin.”

“Tenê ez dizanim ku ji xwe re li kar nagerin. Nêzîkî 3000 kes ji ber cîyên ku bi KHKyan hatin girtin, betal man. Cîyên ku ev kes serî lê bidin, ji xwe xebatkaran nagirin û her ku diçe ew jî xebatkarên xwe ji kar derdixin. Li van deran jî gelek kes ji karên xwe têr derxistin. Ji sazîyên mezin gelek caran di carekê de sê kes, pênc kes ji kar têr derxistin. Anglo rojnamegerên betal ji xwe re li kar bigerin jî nikarin peyda bikin.”

Serokê TGSyê dibêje; dîyar e ku rojnamegerên ji medyaya çepgir û Kurd ku piştî operasyonan betal mane, niha di ci rewşê de ne, lê der barê xebatkarên medyaya Cemaeta Gülen de tu agahî tune ye.



Di OHALê de rojnamegerî qedexe ye

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

NENIVÎSE ROJNAMEGERO/Ê NENIVÎSE-2

*Pîstî bîdawîkirina pêvajoya çereserîyê, him
şer dest pê kir him jî operasyonên mezin li ser
medyaya Kurdi hatin kirin.*

Îrfan Aktan
Eren Guvendik

Desthilatdarîya AKPyê zext û operasyonên li dijî medyayê, bi taybetî piştî “Protestoyên Gezi Parkiyê” da destpêkirin. Protestoyê di 31ê Gulana 2013yan de li Stenbol-Taksimê dest pê kiribû û paşê li her deverên Tirkîyeyê belav bûbû.

Di bûyerên qewimî de 12 kesan jîyana xwe ji dest da. 59 jê giran, bi temamî 7.959 kes birîndar bûn.

Ji Pûşpera 2013yan ku protestoyên Geziyê dest pê kiribû ve, heta Rezbera 2013yan, li ser gelek rojnamegeran êriş hatin kirin. Di wê serdemê de 10 jê rojnamegerên navnetewî, bi giştî 153 rojnameger hatin derbkirin û bi guleyên plastîk an gaza îsotê birîndar bûn.

Ji bo rojnameger nikaribin nûçeyan bişopînin, ew hatin astengkirin. Dîmen û wêneyên gelek rojnamegeran ji hêla polîsan ve hat jêbirin. Di wê serdemê de 39 rojnameger hatin binçavkirin û der barê sisêyan ji wan de biryara girtinê hat dayîn.

Di protestoyên Gezi Parkiyê de gelek rojnameger, ji ber nûçeyên ne li gorî hikûmetê belav dikirin û bi awayekî rexnegir karên xwe dikirin, bi hincetên cur bi cur, ji kar hatin avêtin. Der barê hejmara rojnamegerên ku di TRT û medyaya serdest de ji kar hatin avêtin de, agahîyeke teqez di destê saziyên rojnamegeran de tune ye. Lê belê girîngîya serdema Geziyê ew e ku ji vir bi şûn de êdî rojnameger kom bi kom ji kar hatin derxistin.



Ji bo temâşekirina vîdeoyê bitikîne

Serokê TGSyê der barê mijarê de hin nirxandin kir

Serokê Sendîqeya Rojnamegerên Tirkîyeyê Faruk Eren di nirxandina xwe a der barê mijarê de Wiha dest bi peyvê dike:

“Em nizanin ka piştî Geziyê çend rojnameger ji kar hatine avêtin, lê belê zext û destdanîna ser karên wan bi piranî ji wir bi şûn de dest pê kir.”

“Wekî mînak; gelek rojnamegerên li TRTyê dixebeitîn tenê ji ber twitên ku bi par ve kirine, ji kar hatin

derxistin. Di organên medyaya nêzîkî hikûmetê de jî heman tişt hat kirin.”

“Lê belê êrişên herî mezin ên li dijî medyayê, bi pevçûna di navbera AKP û Cemaeta Gülen de li ser medyaya alîgirê cemaetê hat kirin.”

“Li gorî texmîna me piştî ku qeyûm li medyaya cemaetê hat peywirdarkirin, nêzîkî 2500 xebatkar ji kar hatin avêtin.”



Eren Guvendik

Min di İMC TVyê de 4 salan kameramantî kir. Ji bo AP, Al Arabîyeyê jî bi demkî xebitîm. Herî dawî dema min ji bo Nûçe TVyê kar dikir, kanal ji ber polîtîkayên dewleta Tirk di Kewçêra 2016yan de hat girtin û êdî ez bi temamî betal mam. Hikûmetê ne tenê karê di destê me de, karê ku em dikarin bikin jî, ji destê me stand. Ez dizanim ku li gelek sazîyen medyayê kêmayîya kameramanan hene. Lê belê nizanim ka gelo talimat dane wan ku min naxin ser kar. Di wê dema zor de Mesut Kete karek ji min re peyda kir, lê ew jî qedîya.

Mesut Kete hevalê min ê ji zanîngehê ye. Ez herî dawî li avayîya Odeya Bazirganê Enqereyê di standa "Fûara Roja Destgirtîyan" de xebitîm. Min li wir di strantê de berhemên herêmî difirotin. Fûarê

di zyê Reşemîyê de dest pê kir û di 14yê Reşemîyê de qedîya. Dema ez ji bo projeya Rojnamegerên Betal Li Dû Nûçeyen Xwe Ne dixebeitîm, ji alîyekî din ve jî, min ligel Mesut Kete ava firîngî û îsotan, çîrik, rîçal û hingivên herêmî difirot.

Min di Rezbera 2016yan de ligel Mesut dest bi kar kir. Piştî fûar xelas bû, ez dîsa betal mam. Meriv êdî neçar in ku hesabê qurişan dikin û ji ber vê yekê jî daxwaza ji bo xwirekên herêmî jî kêm bû.

Mesut jî wekî min beşa rojnamegerîyê qedandiye, lê wî qet ev kar nekiriye. Dema ez betal bûm ew ji xwe re li xebatkarekî digerîya. Ez ku bi kamerayê li dû nûçeyan dicim û têm, di carekê de bûm hingivfîroş. Min di jîyana xwe de cara yekemîn hewl dida tiştekî bifiroşim, lê belê ji min nedihat. Wan rojên destpêkê gelekî tenezar dibûm û min nikarîbû. Lê belê heta ez hinekî fêrî kar bûm, Mesut dikana xwe a li Kızılayê, ji ber ku zêde tiştek lê nedihat firotin, girt.

Ez li Enqereyê ji xwe re li kar digerim. Min di sala 2011yan de dest bi rojnamegerîyê kiribû. Divê mûcîzeyek bibe ku ez careke din karê rojnamegerîyê bikim.

Rojnameger ne rêxistî ne

Lê belê nayê zanîn ka çend rojnameger piştî jîkaravêtinê dîsa di medyayê de ji xwe re kar peyda kirine an çend kes ji wan di sektoreke din de dixebeitin.

Lê em dizanin ku rojnamegerên ji ber KHKyan betal mane, di tu medyaya sereke de nehatine îstîxdamkirin.

Wekî ku Serpil Savumlu dibêje: "Tu zo salan cildirû yî, rojekê radibin û ji te re dibêjin ku derzî, ta û caw hatiye qedexekirin."

Encama pevçûnên di navbera AKP û Gülen de û bîlançoya medyayê

Ji ber pişkwestina zêde a cemaetê, di navbera hikûmetê û Gülen de pevçûnê dest pê kir û vê yekê bi operasyona 17 û 25ê Berfanbarê re xwe da der.

Di Kewçêra 2015yan de li ser Koza Holdingê ku xwedîyê rojnameyên Millet û Bugünê bû, qeyûm hat peywirdarkirin.

Di Adara 2016yan de jî dîsa bi peywirdarkirina qeyûm re dest danîn ser rojnameyên Zaman, Todays Zaman, Meydan, kovara Aksiyonê û Ajansa Nûçeyan a Cihanê ku ên Feza Holdingê bûn.

Di çarçoveya OHALê de ku di 20ê



KHK / Sazî	668	675	677	RTÜK	683	Yê Din	Li Ser Hev	KHK 675 û 670: Yê ji nû ve hatîn vekirin
Ajansa Nûçeyan	3	2					5	
Rojname	45	10	7				62	17
Kovar	15	3	1				19	
Radyo	23		1	10			34	2
Televîzyon	16			12	2	1	32	1
Weşanxane - Belavkirin	29						29	
Li Ser Hev	131	15	9	22	2	1	180	20

21 KHK ile OHAL Uygulamaları ve Düzenlemeleri - F. Salman/A. Ergün- bianet

Tîrmehê de piştî hewldana derbeya leşkerî hatibû ragihandin, biryarnameyên bi hejmara 668an (27ê Tîrmeha 2016yan), bi hejmara 675an (29ê Kewçêra 2016yan) û a bi hejmara 677an (22ê Sermaweba 2016yan) 178 saziyê medyayê hatin girtin. Bi vî awayî medyaya cemaeta Gülen bi giştî hat girtin.

Li gorî agahîyên DİSK Basın-İşê, 2 hezar û 308 kesên ku sîgorteyên wan li ser saziyê di Weşan û Rojnamegerîye de dihatin razandin, ji karê xwe bûn.

Ew kes nikarin mûçeyê bêkarbûnê bistînin û her wiha dozê jî vekin, dîsa nikarin pereyê xwe ê di hindur de jî bistînin.

Pêvajoya çareserîyê jî, medyaya Kurdî jî hat girtin

Hikûmetê li dijî medyaya Kurdî di 24ê Tîrmehê de operasyona berfireh da destpêkirin. Di 20ê Tîrmeha 2015yan de li Pirsûsê êrişa DAİŞê pêk hat û piştî du rojan li Serêkanîyê du polîs di mala xwe



Ji bo temâsekirina vîdeoyê bitikîne

de hatin kuştin. Rojekê piştî vê bûyerê, rêvebirîya Serokwezîrê wê demê Ahmet Davutoğlu Civîna Ewleyîyê li dar xist û biryar hat dayîn ku li dijî PKKyê operasyon werin destpêkirin.

Şeva 24ê Tîrmehê Özgür Gündem, Azadîya Welat, Özgür Politika jî di nav de, navnîşana 90 malperên nûçeyan hatin qedexekirin. Di serdema pevçûnan de zextên li ser medyaya Kurdî her ku diçû zêdetir dibû.

Piştî 15yê Tîrmehê bi KHKyâ duyemîn (28ê Rezberê) re bi hinceta “piştgirîyê dide hewldanê hilweşandina li dijî dewletê” 23 TV û radyo hatin girtin.

Rapora Çavdêriyê ya BİAyê, hejmarên ÇGDyê

Li gorî Raporê Çavdêriyâ Medyayê a BİAyê, di sala 2016yan de 778 kartên çapemeniyê hatin betalkirin, dest danîn ser mal û milkên 54 rojnamegeran, pasaportên 46 rojnamegeran hatin betalkirin. Her wiha 3 akredîtasyon jî bi awayekî cudakarî çê bû.

Li gorî raporê BİAyê di sala 2015yan de 348, di sala 2014yan de 339, di sala 2013yan de jî 143 rojnameger, nivîskar û xebatkarên medyayê jî kar hatine avêtin. Ev hejmar di sala 2016yan de gihiştiye 2 hezar û 708an.

Sekreterê Rêxistinkirinê ê Sendîqeya Rojnamegerên Tirkîyeyê Mustafa Kuleli li gorî agahîyên TUİKê (Sazîya Îstatîstîkê a Tirkîyeyê) û ÇSGB (Wezareta Sîgorte û Xebatê) li Tirkîyeyê 95 hezar kes; weşanxane jî tê de di sektora medyayê de dixebeitin. 9 hezar jê betal 24 hezar rojnameger hene. Di nava 15 hezar rojnamegerên dixebeitin de, tenê 3 hezar ji wan endamên sendîqeyan e.

Li gorî agahîyên Komeleya Rojnamegerên Hemdem, di sala 2016yan de 3 xebatkarên medyayê hatine kuştin, 80 ji wan hatine girtin, 299 ji wan hatine binçavkirin, 32 ji wan jî hatine derbkirin û gef li wan hatiye xwarin.

Di heman salê de 7 rojnameger hatine dersînorkirin. 2 hezar û 622 rojnameger ji karê xwe bûne. Li ser 5 sazîyen medyayê êriş hatiye kirin. 157 sazîyen medyayê, 9 weşanxane û şîrket hatine girtin.

Polîsan avêtine ser 3 sazîyen medyayê. Der barê 24 bûyeran de weşan hatiye qedexekirin. 624 karên çapemenîyê û 32 kartêن parlementoyê hatine betalkirin.

Li gorî Sendîqeya Rojnamegerên Tirkîyeyê di 19yê Rêbendana 2017yan de li Tirkîyeyê 142 rojnameger di zindanan de ne.

Çi qasî ku der barê rojnamegerên betal de agahîyên sazîyan ji hev cuda bin jî, tê zanîn ku li Tirkîyeyê nêzîkî 9-10 hezar rojnameger betal in.

Li gorî agahîyên TÜİKê ên sala 2015yan, li Tirkîyeyê girseya ku piştî qedandina zanîngehê betal dimînin, rojnameger in. Di sala 2014yan de rîjaya kesên betal li Tirkîyeyê 9.9% bû. Di warê rojnamegerîyê de ev rîje, 29.1% e.

Bi vî awayî, di sala 2014yan de çi qasî di sektora medyayê de pêwistî bi 24 hezar xebatkaran hebe jî, tenê 17 hezar rojnamegeran ji xwe re kar peyda kirine û 7 hezar ji wan betal mane.

Li Tirkîyeyê tenê 5 sazîyen medyayê bi sendîqeyan re peymana giştî danîne. 5 ji wan bi TGSyê re, yekê jî bi Medya-İşê re peyman danîne. Sazîyen ku TGS lê rêxistî ye Bianet, Cumhuriyet, BirGün, Evrensel û Yurt e. Medya-İş jî li Ajansa Anadoluyê xwe rêxistî kiriye.

Îrfan Aktan

Di sala 2000î de li bianetê dest bi rojnamegeriyê kir. Li Experess, BirGun, Nokta, Yeni Aktuel, Newsweek Turkiye, Birikim, Radikal, binbir.org û zate.com'ê nûcegihanî, edîtorî û nivîskarî kir. Demekî kurt nûnerê IMC TVyê yê Enqereyê bû. Pirtûkên wî yê hatine çapkiran: “Nazê/Bir Goçuş Oykusu (Nazê:Çîrokeke Koçberîyê)”, “Zehir ve Panzehir: Kürt Sorunu(Jehr û Jehrkuj: Pirsgirêka Kurd)”. Hê jî nivîsên wî di kovara Epress û malpera GazeteDuvarê de tê weşandin.

Eren Guvendik

Li Zanîngeha Enqereyê li Fakulteya Ragihandinê de xwend. Li Enqereyê buroya IMCê de dest bi rojnamegeriyê kir. 4 salan li IMC Tvîyê kameramantî kir. Ji bo gelek televizyonan program çêkir. Niha bi awayekî serbixwe kameramanîyê dike.



Almanya: Li dîasporayê jenerayona nû / Veqetîn

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR


PÊLA NÛ A KOÇÊ - 1

*Herî zêde ji kesên karîbûne ji Tirkîye biçin re
wiha tê gotin: "Tu çûyiî û te xwe xelas kir..."
Gelo di rastîyê de kesên karîbûne biçin wekî
rizgariyeyeke heta dawîyê dijîn?*


Volkan Agir
İbrahim Karci

*“Min li dû xwe stêrk hişt
Hevjîna xwe da giryan û hişt
Min dilê xwe vala girt
Hûn ê çawa zanibin
Ka ez ji kê xeyîdîme”*

Ahmet Kaya



Kesên destûra xebatê girtine 2016
Ofisa Îltica û Koçberiyê ya Almanyayê




Kesên destûra xebatê girtine 2016 : 842 kes
Vîzeya Lêgerîna Kar : 9 kes
Vîzeya Xebatê : 1401 kes
Bazirganî : 38 kes
Xebatkarêñ Serbixwe : 13 kes
Zanyar-Akademisyen : 14 kes
Kesên Zewicî : 7344 kes

Tu kes bi daxwaza xwe naçe. Derfet meriv neçar dihêle û meriv diçin. Gelo kesek bi daxwaza xwe û bi dilekî coş naçe? Bê guman ên wisa jî hene. Lê belê çi balkêş e ku ji vê yekê re nabêjin koçberîya neçarî an xwestî, dibêjin malbarkirin.

Li Tirkîyeyê bi taybetî di salêñ dawîyê de gelek kes dixwazin biçin welatên din. Kesên ku êdî mecbûr in

plansazîya jîyana xwe bikin, di van demên dawîyê de an bi demkî an jî hetâ dawîyê behsa “çûyîn”ê dikin. Ji bo hin kesan dîyar e ka piştî çûyînê dê li wir çi karî bike. Lê hin kesên din tenê behsa çûyînê dikin. Gelo çûyîn wisa hêsan e? Dema diçin her tişt çareser dibe? Wekî fîlmekî nexweş ku meriv di nîvî de qut dike û yekî nû vedike ka hêsan e wisa ji wan pirsgirêkan rizgar bibe?



Kesên ku dixwazin ji Tirkîyeyê dûr bikevin berî her welatî Almanyayê tînin bîra xwe. Ne ji ber ku tîpa "A"yê di heman deme de tîpa yekem a Alfabeyê ye jî. Di navbera her du dewletan de dîrokeke pêywendîyê heye. Di salên 1900î de "dema Almanya têk çû, Tirkîye jî têk çû".

Paşê Şerê Cîhanê ê Duyemîn çê bû. Di vê pêvajoyê de "ji ber daxwaza Almanyayê" kedkaran dest bi çûyîna Almanyayê kirin. Pêywendîyên di vê demê de têkilîyên her du welatan xurt kiriye. Ji wê demê heta niha li Almanyayê hejmara welatîyên Tirkîyeyê gihiştiye nêzîkî 3 milyonan. Di sala 2013yan de 10 hezar û 388, di sala 2014yan de 10 hezar û 748, di sala 2015yan de jî 10 hezar û 690 welatîyên Tirkîyeyê ji Almanyayê destûra rûniştinê girtine.

Di sala 2013yan de 1465 kes ji bo perwerdeyîyê, 1307 kes ji bo xebatê, 6 hezar û 966 kes jî bi zewacê hatine Almanyayê. Di sala 2014yan de 1327 kes ji bo perwerdeyîyê, 1352 kes ji bo xebatê, 7 hezar û 317 kes jî ji bo zewacê hatine Almanyayê.

Di sala 2015yan de 9987 kes ji bo perwerdeyîyê, 12 kes bi vîzeya lêgerîna xebatê, 972 kes ji bo xebatê, 8 hezar û 667 kes jî bi zewacê hatine Almanyayê.

Li Tirkîyeyê herî zêde di sala 2016yan de behsa çûyînê hat kirin. Di vê salê de 9661 welatîyên Tirkîyeyê ji Almanyayê destûra rûniştinê girtine. %76ê wan kesan ji bo zewacê çûne Almanyayê. Me bi kesekî ku di sala 2016yan de ji bo zewacê hatine Almanyayê re hevdîtin kir.

Şikestina piştî meha Tîrmehê

Navê vî kesî X ye. Wî di çêkirina çend dokumenteran de cî girtiye. Car caran ji kanalake ku ne ji kanalên çapemenîya deshilatdar e jî re xebitîye û niha ew kanal hatiye girtin. Cara yekemîn di Adara 2016yan de hatiye Almanyayê. Sedema vîzegirtina wî, dîsa çêkirina dokumenterekê bûye. Berî ew vegere Tirkîyeyê bi jineke Almanî re hev du nas kirine û tekilîya wan dest pê kiriye. Ji xwe ji ber vê yekê wî teklîfa kar a li Almanyayê qebûl kiriye. Her ku çêkirina dokumenter dirêj bûye, wî jî dema vîzeya xwe dirêj kiriye.

Wî jî wekî wan 7 hezar û 344 kesan, di meha Tîrmehê de destûra rûniştinê girtiye. Dildara wî, ji wî zêdetir bûyerên li Tirkîyeyê ji xwe re kiriye xem û paşê teklîfa zewacê li wî kiriye. Wan malbatêن xwe jî der barê biryara xwe de agahdar nekirine û di dawîya meha Tîrmehê de zewicîne. X, ji wê rojê bi vir ve qet neçûye Tirkîyeyê. Bê guman ew bêrîya Tirkîyeyê jî dike.

Cara dawîyê di Pûşpera 2016yan de çûye Tirkîyeyê. Wî biryar daye ku berpirsîyayîya xwe a ji bo mayîna li vir pêk bîne. Niha bi derdîn wekî destûra rûniştinê, barkirina malê, fêrbûna ziman û jîyanekî din mijûl e. Ew piştî xebata rojane diçe kursa zimanê Almanî û hewl dide ku tev li rengê jîyanâ vir bibe.

Mêvanê mayînde

Hejmara kesên ji bo perwerdeyîyê hatine Almanyayê jî 842 ye. Ew kes xwendekarên lîsans, master û doktorayê ne.

Yek ji wan jî G. ye. Ew jî di warê zanistêن civakî de teza xwe a doktorayê dinivîse û ji bo salekê wekî xwendekarê mêvan hatiye Almanyayê. Lê belê dema ku ew hatiye, daxwaza li Almanyayê mayînê jî hebûye.

G. di meha Rezberê de hatiye Almanyayê. Di sala borî de ji malbata wî hin kesan canê xwe ji dest daye û ew ji ber vê yekê gelekî xemgîn e. Ji xwe bi hatina xwe a vir xwestiye ku cîyê xwe biguherîne û ji wê derûnîya nebaş hinekî dûr bikeve. Lê belê hîngî hatiye vir di aqilê wî de tenê tiştek heye: Ji statûya xwendekarıya mêvan derkeve û perwerdeyîya doktorayê jî li vir bidomîne.

Sedema vê daxwaza wî jî ew e ku, ji ber li Tirkîyeyê zext û êrişen li ser akademîsyenan, ji bo xwe nikare plansazîya siberojê bike. Eger karibe perwerdeyîya xwe a doktorayê li Almanyayê bidomîne, dibe ku di kadroya akademîyê a zanîngehê de jî cî bigire.

Niha li ser mayîna vir û nîvîsandina teza xwe dixebite. G. di hin warên werzîşê de jî serkeftî ye û lîsansa wî a antrenorîyê jî heye. Ew, vê yekê ji bilî doktorayê wekî planeke din a ji bo mayîna vir dibîne.

Kesên ku bi vîzeya ji bo lêgerîna kar hatine Almanyayê di vê ûstatîstîkê de gelekî kêm in. Hejmara wan kesan 9 e û yek ji wan jî Ş.Ş. ye. Wî jî li Tirkîyeyê di warê mûzîk û hunerê de organîzatorî kiriye. Lê belê di demên dawîyê de di sektora wan de jî kar gelekî kêm bûye. Wî jî di 49 salîya xwe de bi wêrekî biryar daye ku li Almanyayê bijî.

Zaroktîya wî li Almanyayê derbas bûye. Çi qasî ku wî ji berê de ziman, çand û jîyana Almanyayê nas kiribe jî, hevjin û zaroka xwe a biçûk li Tirkîyeyê hiştiye û çûye.

Ew wiha behsa vê pêvajoya çûyînê dike: “Bêistîkrarbûna li welêt û nedîyarîya siberojê.” Ew, ev demek e li Almanyayê

Li dû jîyanekê nû



Ji bo temâsekirina videoyê bitikîne

li cem hevalên xwe dimîne û pereyên wî hindik e û bi vî awayî hewl dide ku ji xwe re karekî peyda bike. Mebesta wî ew e ku karê xwe ê organîzatorîyê li vir jî bidomîne. Lê belê bi taybetî li Berlînê wisa ne hêsan e ku di vî warî de meriv di nava du alîyan de bimîne. Wî biryar daye ku zaroka xwe jî bîne cem xwe, lê hevjinâ wî dê li Tirkîyeyê bimîne.”

Dewletê ew şandibû, lê bû mexdûrê dewletê

Tuba İnal Çekiç akademîsyen e. Ew di sala 2016yan de wekî akademîsyena mîvanî şandine Zanîngeha Humboltê. Lê belê paşê ew bi KHKyê ji kar hatiye avêtin. Di meha Pûşperê de keça xwe a biçûk jî anîye ba xwe û paşê hevjinê wê Alper jî çûye ba wê. Alper dibêje: “Di rastîyê de koçberî tiştekî bêdawî ye.” Lê Tuba wisa difikire ku bi tecrûbe û hevgirtina di Geziyê de meriv dikare li Almanyayê bijî.

Aramî li Berlinê ye

Tiştê ku bi serê Kadir de hatiye ji ên din cûda ye. Kadirê Enqereyî berî hatina Berlînê ji bo karê xwe demekê li Stenbolê jî maye. Dema li Stenbolê bûye dîtiye ku jîyana wir gelekî zehmet e û wî gelekî diwestîne.

Ji ber vê yekê nikarîbûye li ser karê xwe jî baş biponije. Paşê karê xwe guherandiye. Lê belê dîtiye ku keda ew dide vala dimîne û wî biryar daye ku were Almanyayê.

Ew Endazyarê Kompûteran e û ji bo vê yekê karîbûye bi hêsanî li Berlînê ji xwe re karekî peyda bike. Ango bi kurtayî wî di sala 2015yan de destûra ji bo xebatê girtiye û di nava wan 965 kesan de cî girtiye.

Ji bo ku li Berlînê gelek kesên ji sektora karê wî hene, wî karîbûye ku ew li wir



bisitire. Kadir, çi qasî ji bo hînbûn û adaptasyona rengê jîyana Berlînê rojeva Tirkîyeyê neşopandiye jî çend rojan piştî hatina wî Qetlîama 10ê Kewçêrê pêk hatiye. Wî gelek kesên di qetlîamê de jîyana xwe ji dest daye nas dikir û ji dûr ve şîna wan girtiye. Ji ber vê yekê derûnîya wî gelekî xera bûye.

Kadir ev wêne li Berlînê, di çalakîya Dayîkêن Şemîyê a hefteya 600. de kişandîye.

Kadir 30 salî ye, bi awayekî serbixwe wêne kişandine û demeke dirêj çalakîyên Dayîkêن Şemîyê kişandine.

Dema hatiye Berlinê ji rûtîna xwe dûr

ketiye û ev jî bo wî bûye sedema valayîyê û dibêje ku herî zêde wan rojan xerîbî bi wî zor hatiye. Di 6-7 mehîn dawîyê de bi zanetî der barê van mijaran de tu sohbetê nake.

Lê belê dîsa jî der barê bûyer û geşedanên li Tirkîyeyê û dinyayê de difikire û hewl dide ku çi ji destê wî were bike. Kadir dîyar dike ku jîyana wî a li Berlînê gelekî aram e û ji ber ew li Berlînê ye berpiryarîyeke din ketiye ser milê wî.

Ew hêvîdar e ku tîştêni bi serê wî û ên hevalên wî de hatine, çareser bike û ji bo siberojê plansazîyeke bi vî rengî bike. Lê belê ew nîzane ka gelo ew ê rojekê vegere welêt an na.




Almanya: Koçberîya piştî bîntengîyê

Volkan Agir
İbrahim Karci

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

PÊLA NÛ A KOÇÊ - 2

*Her kesê ku me bi wan re hevpeyvîn kir,
ji alîyê xwe de behsa berxwedana Geziyê kirin.
Ji bo vê yekê me jî navê vê diasporaya nû kir
“Diasporaya Geziyê”.*



Ji bo kesên me bi wan re hevpeyvîn kir û em bûn şahidê jîyana wan tişte hevpar ew e ku jîyan li wan hatiye tengkirin. Rewşa derûnîya wan wekî ku car caran dibêjin: "Ez gelekî fetisîm, ez ê biçim bîna xwe bidim û werim." û bi vî awayî dixwazin ji vê derê herin.

Ên karîbûne ji Tirkîyeyê derkevin jî, ne ji ber sînorê ku niha tê de ne, bi hevgirtina di navbera xwe de dikarin li vir bîna xwe bidin û bistînin.

Li gorî agahîyên heta 31ê Adara 2016yan hatiye berhevkirin, li Almanyayê hejmara kesên navbera 1-4 salan destûra rûniştinê girtine 37 hezar û 729 e.

Li gorî vê yekê vê zêdebûnê ji 2012yan dest pê kiriye û di 2016yan de bi dawî bûye.


Wekî kesên ji me re peyivîn jî anîn ziman, ev yek bê guman pêvajoya Geziyê tîne bîra me. Ew kes di wan rojan de bûne xwedîyê tecrûbeya hevgirtinê û li vir jî bi wî awayî hewl didin bisitirin.

Tirkîyeyîyê ji jenerasyona nû

Li Almanyayê bi taybetî li Berlînê di vê dema ku me li jor behsa wê kir de, em dikarin bibêjin ku kesên bûne koçber bêyî hemdê xwe dîasporayeke nû pêk anîne. Her kesê ku me bi wan re hevpeyvîn kir, ji alîyê xwe de behsa berxwedana Geziyê kirin. Ji bo vê yekê me jî navê vê dîasporaya nû kir "Dîasporaya Geziyê".

Dîvê were gotin ku kesên berî vê demê koçî Almanyayê kirine û ên nû koç kirine di gelek waran de

Sedemê destûra rûniştinê
Ofîsa Îltîca û Koçberiyê ya Almanyayê



naşibin hev. Têkilîyên di navbera her du jenerasyonan de jî kêm in. Kekê Hasan xwedîyê restorana “Ein Ladan”ê ye. Restoran li Berlinê, li Weser Strasseyê ye û bûye navenda welatîyên Tirkîyeyî. Kekê Hasan 40 sal in li Almanyayê dijî û 3 jenerasyonên ku ji Tirkîyeyê koçî vir kirine nas dike û wiha dibêje:

“Kesên ku di demên dawîyê de koçî vîr kirine, ne wekî ên berê ne ku ji ber pirsgirêka aborîyê hatine. Ên di vê dawîyê de hatine xwendî ne, zanyar in. Ev yek ji bo Tirkîyeyê windayîyeke mezin e û ji bo Almanyayê jî dewlemendî ye.

Almanya jî vê yekê baş dizane. Ên hatine bi piranî rojnameger, nivîskar û sînemager

in. Ji xwe tiştekî li dijî Tirkîyeyê jî nakin. Hewl didin karêñ xwe ku li wir dikirin, li vir jî bikin. Kesên wekî wan hê jî têñ.”

Dîyar e ku gelek meriv ji ber rewşa li Tirkîyeyê, neçar in ku koçî deverên çar alîyên dinyayê bibin. Hêjayî gotinê ye ku xwendekarêñ ji lîseyêñ Robert, Alman, Saint Benoît destûr girtine, ji bo perwerdeyîya lîsansê serî li zanîngehêñ derveyî welêt didin.

Potansîyela her ku diçe xurt dibe

Hin kesên ku em bi wan re peyivîne, ji ber zext û hedefnîşandana li Tirkîyeyê aciz in, nexwastin ku navê wan di nûçeyê de were nivîsandin. Ew ditirsin ku eger vegeerin

Tirkîyeyê wê ji bo wan bibe pirsgirêk. Ew rexnekîrîna geşdanêñ li Tirkîyeyê li alîyekî, ditirsin ku derûnîya xwe bînin ziman û dibêjîn ku dibe tiştekî bînin serê min an serê malbata min. Dîyar e ku ew kes di rastîyê de li Almanyayê jî ne aram in.

Em du kesêñ ku me ev nûçe amade kirine, heman pirsgirêk bi serê me de jî hatiye, me jî ew tecrube ceribandine û ji zextêñ li ser medyaya rexnegir têñ kirin em bê kar mane. Gelek kes ji ber zextan ji Tirkîyeyê koç dike û ji bo jîyanake baş tê Almanyayê û qet şansê wan nîn e ku

rojekê bi Angela Merkel re hevdîtinê bikin. Em jî wekî wan kesan in. Ci qasî ji dûr ve temaşekirina bûyerên li welêt dijwar be jî, li vir potansîyeleke din derdikeve holê. Pirsgirêka sereke a van kesan hilberîn û afirandin e. Eger bi awayekî azad vê derfetê li Almanyayê peyda bikin, dê ji bo her du dewletan jî encamên gelekî baş derkeve holê.

*Agahîyêñ ku di nûçeya me de cî digire, me ji Buroya Penaberî û Koçberîyê a Almanyayê bi dest xistiye.

Volkan Ağır

Ji sala 2006an vir ve nivîskarê blogê ye. Di sala 2008an de li Rojnameya Cumhuriyetê di Servîsa Sporê de dest bi nûçegihantiyê kir. Ji wir vir ve zêdeyî di heman besî de nûçegihanî dike. Bi awayekî serbixwe di sala 2014an de Kûpaya Dinyayê li Brezîlyayê, Copa Amerîca 2015an jî li Şîliyê weke nûçegihan şopand. Ji sala 2011an vir ve di Açıç Radyoyê de rojêñ duşemê bernameya Efektiprazê pêşkêş dike. Heftane ji GazeteDuvarê re hin caran jî ji Ozgorozê re nivîsêñ li ser werzişê dişîne. Ji 2016an vir ve li Almanyayê dijî.

Ibrahim Karci

Ji sala 2010an vir ve li ser binpêkirina mafê mirovan, mafê kêmnetewan, koçberî, bazirganiya penaberan, asîmîlasyon, LGBT, û travmayêñ civakî de gelek xebatan pêkanî û dosyeyêñ mûltî-medya çekirin. Li saziyêñ navneteweyî yên weke CNN, TIME, AP, BILD, TVE û NYTê bi awakî serbixwe xebitî. Di gelek projeyêñ navneteweyî de bi awakî serbixwe cih girt. Di gelek xebatêñ li ser Rojhilata Navîn, Başûrê Asya û Ewropayê de weke çavdêr cih girt. Li Almanyayê li Zanîngeha Rhîne-Waalê (HSRW) di beşa Zayenda Civakî û Pirrengî de xwendekar e. (www.ibrahimkarci.com)



“Rêxistina Keça Ereb Ji Paceyê Temaşe Dike” û rizgarbûna ji Erebbûnê

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TIRKÊN AFRO - 1

Tirkên Afro ji ber rengên xwe li dibistan û kargehan cudakarî li wan tê kirin. Akademîsyen Körükmez û rojnameger Karakartal der barê pirsgirêkên wan de peyivîn. Mustafa Olpak, çiroka rêxistinê û Cejna Çelekan.

Aynur Tekin
Ferhat Demir

“Di nava civakê de ji bo entegrasyon û qebûlkirinê rengê mirovan girîng û şertê sereke ye.”

Alkr. Doç. Dr. Lülfîfer Körükmez li Zanîngeha Egeyê di Beşa Civaknasîyê de akademîsyen e. Ew cudakarî û pirsgirêkên li kar û dibistanan ên Tirkêن Afro (civata ku bi eslê xwe Afrîkayî ye û li Tirkîyeyê dijîn) wiha tîne ziman.

Komaleya Çand, Alîkarî û Hevgirtinê a Afrîkayîyan di sala 2016yan de hatiye damezirandin. Der barê Tirkêن Afrîkayî ku ji ber rengên wan cudakarî li wan têr kirin de; qeydan digire, xebat û lêkolînan dike.

Akademîsyen Körükmez jî di xebatên derive ê komeleyê de cî digire û tecrubeyên xwe ên di vî warî de tomar dike.

Nevîyêن koleyêن ku di dema Osmanîyan de ji Afrîkayê hatine anîn.

Kal û pîrêن Tirkêن Afro di dema Osmanîyan de wekî kole ji Afrîkayê anîne Anatolyayê. Ew niha bi piranî li herêma Egeyê dijîn. Akademîsyenê Zanîngeha Sabanciyê Hakan Erdem li ser koledarîya di dema Osmanîyan de dixebite û dîyar dike ku ji destpêka avakirina dewletê ve koledarî her tim hebûye. Li gorî Erdem di sedsala 19. de 10 hezar kole ji Afrîkayê anîne welatê Osmanîyan. Ew kesên ku niha li Tirkîyeyê xwe wekî Tirkêن Afrîkayî didin naskirin, nevîyêن wan koleyêن ku li Anatolyayê dane xebitandin in.

Zarokêن ji Hecê hatine revandin

Di dema Osmanîyan de kolekirina kesên ji Osmanîyan bû, qedexe bû. Ji ber vê yekê piranî kole ji Afrîka û Kafkasyayê dihat anîn. Koleyên Afrîkayî bi piranî ji Sûdan, Habeşistan û Çadê bûn. Ew kesên kole an di şer de wekî hêşîr hatibûn girtin, an jî taciran ew revandibûn. Her wiha kesên diçûn Hecê, zarokêن reşreng direvandin û dianîn welatê Osmanîyan.

Kole nikarîbûn bibin xwedî mal û milk

Di dema Osmanîyan de ji koleyan re digotin qûl, carîye, odeger an jî xulam. Bi piranî di harem, zevî û karêñ malan de ew didan xebatitandin. Di hiqûqa Osmanîyan de behsa koleyan jî dihat kirin. Li gorî wê yekê di welatê Osmanîyan de firotin, kirîn û dîyarîkirina koleyan hebû. Her wiha kole nikarîbûn bibin xwedî mal û milk. Ev maf li wan hatibû qedexekirin.

Ziman û çanda wan hat tunekirin

Di dema Osmanîyan de ji bo koleyan qedexe bû ku bi zimanê xwe bipeyivin û îbadetên xwe ên olî bi cî bînin. Ji ber vê yekê wan kesên Afrîkayî nikarîbûn ziman û çanda xwe hînî jenerasyona piştî xwe bikin. Ji ber vê yekê Afrîkayîyên li Tirkîyeyê dijîn (Tirkêن Afro), nizanîn ka bav û kalêñ wan berî niha bi kîjan zimanî dipeyivîn.



“Performans”a ji wan
tê xwestin

Tirkên Afro bi piranî li gundan dijîn. Ango perwerdeyî wisa hêsanî bi dest wan nakeve. Heke dest bi xwendina dibistanê bikin jî, perwerdeyîya xwe di nîvî de dihêlin. Ên ku perwerdeyîya zanîngehê xelas kirine, gelekî kêm in. Du sedemên vê yekê hene: Xizanî û cudakarîya ji ber rengên wan.

Tirkên Afro dema dest bi perwerdeyîyê dikin, li dibistan û derdorê cudakarî li wan têñ kirin. Ew jî li dibistanan û kargehêñ ku lê dixebeitin hewl didin ku vê cudakarîyê ji holê rakin.

Alkr. Doç. Dr. Körükmez wiha dibêje:

“Eger ew bi kesayeteke xwerû û di halê xwe de bijîn û tu hunerek di destê wan de tune be an jî nexwazin hewldaneke ji bo qebûlbûna nav civakê bikin; her tişt ji bo wan zêdetir bi zehmet dibe. Yek ji wan ku ez pê re peyivîbûm digot; dema ew derdikeve ser dikê, performansa wî/ wê baş be û kincêñ li gorî modeya populer li xwe kiribe; hêasantir di nava civakê de qebûl dibe.”

“Wekî minak porê xwe kurîşk û dirêj bikin, morîyan bi tayêñ porê xwe ve bikin... Ango daxwaza civakê şêrînbûn e û ew jî wiha bersivê didin vê yekê. Ev gotinêñ min jî

dibe ku bi me xweştir be lê belê, ev yek cureyeke cudakarîyê ye.”

“Tu kes ne mecbûr e ku şêrîn û xwedî huner be. Eger di pêvajoya perwerdeyîyê de helwesteke wiha were qebûlkirin, dê zarok bi hêsanî perwerde bibin.”

Hayîdarbûn

Alkr. Doç. Dr. Körükmez dibêje li dibistanêñ ku zarokêñ Tirkêñ Afro lê perwede dibin, ji bo zarokêñ din û welîyêñ wan jî divê perwerdeyî û xebatêñ ji bo hayîdarbûnê were kirin.

“Ji bo zarokêñ nû dest bi perwerdeyîyê



Ji bo temaşekirina vîdeoyê bitikîne



dikin, di fêrgehê de qebûl bibin divê dersdar û rêvebirên dibistanê pêvajoyeke xurt û baş bimeşînin. Di vê pêvajoyê de ji ber namûçik û tinazkirinan zarok ji dibistanê sar dixin.”

“Divê meriv ji bo li ba zarokan normalbûna rengên cuda û hevparîyê bixebite.”

Şêrînbûn, Xweşikbûn û Erebbûn

Rojnameger Alev Karakartal him li komeleyê him jî bi awayekî ferdî der barê Tirkêن Afro de lêkolînan dike.

Karakartal tîne bîra xwe ku dema di zaroktîya wê de bi taybetî di demên krîzan de cudakarî li wan hatiye kirin:

“Tu di demên xweş de gelekî xweşik û şêrîn î. Lê belê heke krîzeke biçük jî çê bibûya zarokan digot: “Ereb û ereb!” û tu ji koma xwe dûr dixistin. Di dema zaroktîya min de wan bi peyva zencî (rengreş) nizanîbûn. Dema êdî ez bûme jineke xama, ew ji filmê Amerîkî peyva ‘zencî’yê hîn bûn û êdî digotin ‘zencîya pîs’. Heta carekê yekî ji min re got ‘negro’. Welatê me ecêb e. Em diçin dîroka koletîya li welatê xwe ji ên Amerikayê hîn dixin.”

Di pirtûkên dersan de temsîlîyet tune ye

Komele di nava du salêن dawîyê de Almanêن Afro (Afrîkayîyê li Almanyayê) dawetî Tirkîyeyê dikin û bi Tirkêن Afro re tînin ba ev.

Alkr. Doç. Dr. Körükmez di van hevdîtinan de tesbîteke xwe a balkêş ku der barê zarokên diçin dibistanê de ji me re dibêje:

“Me dît ku zarokên Tirkêن Afro, bala xwe didin pirtûkên zarokên Almanêن Afro. Ji ber ku di pirtûkên destê zarokên Almanêن Afro de merivê rengreş, malbatê rengreş û her wiha malbatê rengspî jî hene. Anglo di vî warî de bernameya perwerdeyîyê gelekî girîng e.”

“Di pirtûk û materyalên din de eger cî bidin tiştên wiha, dê zarok temsîlîyeta xwe bibîne, nas bike û xwe nêzîkî wan bibîne. Bê guman ev pêvajoyeke dirêj e, lê divê bi vî awayî dest pê bike.”

Malbatên Tirkêن Afro car caran ji hin TV û weşanxaneyan daxwaz dikan ku pirtûkên merivê rengreş tê de ne çap bikin û filmê karton nîşan bidin. Lê belê heta vê demê, tu alîyî bersiveke baş nedaye wan.

Di rêya rêexistinbûnê de hevdîtina yekem

“Mustafa Olpak ji bo Tirkên Afro bîne ba hev û ji bo parastina çanda wan xwestiye vê komeleyê damezirîne. Xwestiye ku têkilî di nava me de hebe û hebûna kevneşopîya me were parastin. Ez li gund mezin bûme. Ez paşê hatim Îzmîrê. Ji min re gotin dê komeleyek were damezirandin, tu karî alîkarîyê bikî?



“Min ji wan pirsî ka ev komeleyeke çawa ye. Dema ez pê hesîyam ku komeleyeke çandî ye, min ew vexwend Ayvalıkê. Berî komeleyê min ew nas nedikir. Ew hat serdana me û pirtûka.”


“Keça Ereb Ji Paceyê Temaşe Dike (Arap Kizi Camdan Bakıyor)” bi xwe re anîbû. Em peyivîn, me pirtûk xwend û paşê me biryar da ku em komeleyê damezirînin.”

Pêngava yekemîn ku ji bo damezirandina Komeleya Çand, Alîkarî û Hevgirtina Afrîkayîyan ku niha Şakir Doğuluer serokê wê ye, bi vî awayî hatiye avêtin.

Komeleya Tirkên Afro bi pêşengtîya Mustafa Olpak di 2006an de dest bi xebatê dike û rola xwe a ji bo civandina wan bi cî tîne. Bi saya serê wî kesên ku bi salan wekî “Ereb” hatine binavkirin, êdî wekî “Tirkên Afrîkayî” têñ naskirin.

“Mustafa Olpak berxwedana mafxwazîyê di çenteyê xwe de digerand”

Olpak, di destpêkê de, ji ber nikarîbûne ofîseke ji xwe re kirê bikin, her tiştên xwe di çenteyê de digerand. Çi qasî karîbûye, gihiştiye kesan û bi wan re peyivîye. Car caran ew baş nedihat pêşwazîkirin û li çend cîyan bere wî



Mustafa Olpak

Mustafa Olpak di Kewçera 1953yan de li Ayvalıkê hatiye dinyayê. Ew zarokê pêncemîn ê Mehmetê Resmonî û Kemaleya Gîrîtî ye. Di nasnameya wî de rojbûna wî wekî 1ê Rêbendana 1955an hatiye nivîsandin.

Piştî dibistana seretayî xelas dike, li atolyeya tornayê dest bi kar dike. Piştî leşkerîyê li Îzmîr Karabağlarê di Komeleya Mala Gel de dixebite. Di sala 1979an de nîjadperestan gule bi ser mala gel de reşandine û Olpak jî ji çok û milê xwe birîndar bûye. Bi ser de jî di wî halê de wî binçav dikan. Di serdema 12yê Rezberê de salekê di girtîgehê de maye. Piştî jî zindanê derketiye êdî milê wî wekî berê baş nebûye. Ji ber vê yekê êdî nikarîbûye karê tornayê bike û wî jî dest bi mergeriyê kiriye.

Di salên 90î de biryar daye ku bîranînên xwe binivîse û li ser kok û malbata xwe dest bi lêkolînan

kiriye. Tenê tiştê ku zanîbûye ew e ku malbata wî ji Kenyayê hatiye revandin û ew anîne welatê Osmanîyan.

Pirtûka “Ji Kevîyên Kenya, Gîrît û Stenbolê Bîyografiyên Koleyân (Kenya-Girit-İstanbul Kiyisindan İnsan Köle Biyografları-Ozan Yayıncılık/2005)” bi vî awayî derketiye holê. Piştî 3 salan Weşanên Puntoyê pirtûk nûjen kir û ji nû ve çap kir.

Olpak damezirênerê Komeleya Çand, Alîkarî û Hevgirtina Afrîkayîyan e û serokê yekem jî ew e. Di Kewçera 2016yan de wefat kiriye.

(Çavkanî: Köklerini araştıran adam Mustafa Olpak - Ayda Kayar)

dan. Lê belê wî got, “Ev rîyeke dirêj e” û xebata xwe dewam kir.

Ligel hevalên xwe, di demeke kurt de gelekî bi pêş dikeve. Tirkên Afroyî bi civakê daye zanîn û naskirin.

Xebata wî bi Tirkîyeyê re sînorkirî nemaye, ji qada navneteweyî gelek akademîsyen û lêkolîner tev li van xebatan bûne. Cejna Noginê di kevneşopîya Afrîkayê de nirxeke girîng e û bi wan xebatê hatiye kiriye ve êdî ew cejn li Îzmîrê hat pîrozkirin.

Gelek kes ji ber wefatkirina Olpak xemgîn bûye. Serok Doğuluer dibêje:

“Ew kesekî jîr û zana bû. Car caran hin dengênu ku dişibin ê wî tê min û ez dibêjim a niha ew ê were.”

Doğuluer:

“Me jî got ku em hene”

Doğuluer der barê Mustafa Olpak de wiha dibêje:

“Emrê xwe ji bo komeleyê derbas kir. Wekî zarokê xwe ji komeleyê hez dikir. Wî gelek tişt hînî me kir. Bi saya komeleyê em di nava xwe de civîyan û me got ku em hene. Ji ber cudayîya rengê me gelek caran navûçik li me dikirin û bela xwe li me dixistin.”

Lê belê piştî avabûna komeleyê, me ev tişt pişt guh kiri û me got ku ew şerma wan bi xwe ye. Vê komeleyê roja me ronî kir. Em çi qasî sipasîyên xwe li Mustafa Olpak bikin hindik e.”

Doğuluer behsa projeya Mustafa Olpak a avakirina gundê Afrîkayî dike û dibêje: “Wî dixwest gundekî ku lokanta, hotel û sazîyên din li gorî kevneşopîya Afrîkayê be, were avakirin. Ev proje hê jî di rojeva me de ye.”



Cejna Noginê: Mizginîya Biharê

Di wan civakan de ji rûspîyên olî re dibêjin godya û di merasîma cejnê jî ew pêşengtîyê dîkin. Godya jin in û wekî kesêni bi rehm têr naskirin. Li gorî wê bawerîyê, ew xwedîyê hêzên pîroz û mezin in.

Cejna Noginê di dema Osmanîyan de her sal di meha Gulanê, şemîya yekemîn de dihat pîrozkirin. Di vê demê de hemû koleyan destûr digirtin. Ji bo wan betlane bû û ji bo têkilîdanîna di navbera xwe de ev merasîm li dar dixistin. Di vê merasîmê de bi pereyêñ jinêñ godya kom kirine, noginek dihat kirîn û goştê wê noginê wekî qurban belav dikirin.

Cejna Noginê ji sala 2016yan vir ve bi pêşengtîya Komaleya Alîkarî, Çand û Hevgirtina Afrîkayîyan, li Stenbol û Îzmîrê tê pîrozkirin. Lê belê di salêñ dawîyê de guhertinek hatiye kirin ku qurban nayê dayîn. Pirozbayî 3 rojan didome, geşt û panel têr lidarxistin.



Çawa dixebeitin/Nikarin bixebeitin; Sivikkirina helwesta hişk

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TIRKÊN AFRO - 2

Ji bo Tirkên Afro pirsgirêka xebatê li gund û bajaran ne wekî hev e. Li derdorê wekî xebatkarên erzan têñ dîtin. Ew ji ber cudabûna rengêñ xwe, car caran bi hêsanî kar peyda dikin, hin caran jî ji ber vê yekê kar bi destê wan nakeve.

Aynûr Tekin
Ferhat Demir

Tirkêن Afro civakeke heterojen e û di sektorên cuda de dixebeitin. Sektora ku bi piranî tê de kar dikan, tûrîzm e. Ji ber ku ev sektor hinekî zêdetir ji ên din kozmopolît e, kesên rengres dikarin ji xwe re kar peyda bikin.

Lêkolînên li qadê hatine kirin nîşan dide ku Tirkêن Afro di tûrîzmê de bi piranî animatorîyê dikan. Ango di cîyên şayî û ragihandinê de dixebeitin. Alkr. Doç. Dr. Lülfîfer Körükmez dibêje ku kesên rengres li Tirkîyeyê wekî sembolên cîyên şayîyan têñ dîtin.

Tirkêن Afro ên li gundan dijîn jî an di hilberîna modern de, an jî di karêñ kêmqezenc de dixebeitin. Ji ber zevîyêñ di destê wan de biçûk in, di karêñ rojane û demsalî de dixebeitin.

“Tu yê tenê li maseyêñ ber derîyê barê rûnî”

Di jîyana xebatê de cudakarîya li ser Tirkêن Afro tê kirin, bi du awayan e. Xwedîyêñ kargehan an ji ber nijadperestîya xwe, kesên rengres naxebitînin, an jî dibêjin hebûna rengreşan ji bo karkirinê balkêşîyek e û wan didin xebitandin.

Körükmez der barê vê yekê de behsa mînakeke wiha dike:

“Di hevpeyvînan de kesekî wiha gotibû. Bareke li Alsancakê pêşnîyara karekî wiha dike: ‘Tu yê tenê li ser maseyêñ ber derîyê barê rûnî ku muşterî werin barê.’ Ango rewş gihiştiye asteke wisa ku ji nirxandinê me zêdetir e.

“Hin caran meriv dibêjin ku va ye çi qasî xweş e ku wan dixebeitînin. Bê guman ev yek cudakarî ye. Merivan naxin nava asteke hilberîn û karkirinê û bi vî awayî dikan obje.”

Rojnameger Alev Karakartal:
“Dema em nasnameya xwe nîşanî wan didin, hin caran ji me bawer nakin. Gelek caran bi tawanbarîya nasnameya sexte, me dibin gerekolan.”

Gelek caran GBT ji wan têñ xwestin

Mêrên rengres, ji ber cudabûna rengê wan gelek caran bi çavê firoşkarê afyonê li wan tê nêrîn. Dema ku ji cîyekî diçin cîyekî din, polis gelek caran wan didin sekinandin, nasnameyêñ wan kontol dike.

Hêzên ewleyîyê gelek caran matmayî dimînin ku kesekî rengres xwedîyê nasnameya Tirkîyeyê ye. Ji ber ku civaka Tirkîyeyê hema bibêje der barê Tirkê Afro de tu tiştekî nizanin.

Hejmara kesên ji wan ku di sazîyêñ dewletê de dixebeitin jî gelekî kêm e.

Körükmez dibêje, "Hûn ci qasî rengreş bin, peydakirina kar zêdetir dibe pirsgirêk" û ji bo îstîxdamê girîngîya rengê meriv jî wiha tîne ziman:

"Me bi 3 xwişk û birayêñ ji 30 salî mezintir re hevdîtin kirin. Rengê her sê xwişk û birayan ji hev cuda bû. Yek renreş, rengê a din wekî ê Latînan, ê din jî nêzî spîyê bû. Xwişka rengreş tu kar ji xwe re peyda nedikir û ji xwişka wê tirê dema di lêgerîna kar de nikare xwe baş îfade bike û ji ber vê yekê xwişka xwe sûcdar dike. Paşê jê re gotiye ez ê jî bi te re werim



hevdîtin kardîtinê û bi wê re çûye. Wê demê pê hesîyaye ka cûdabûna rengê meriv ci qasî girîng e."

Türkkolu: Dema tu ji cî û warê xwe diqetî, tu xerîbîyê dikişînî

Cudakarîya li gund û bajaran ne wekî hev e. Li navçe û gundan cudakarîya ji ber cûdabûna reng hindik e, lê li bajêr zêdetir e. Beyhan Türkolu ji Tirkêن Afro ye û di karê tûrîzmê de dixebite û tiştên hatiye serê wê wiha vedibêje:

"Tûrîzm karekî gerdûnî ye. Ji ber vê yekê tiştekî pir mezin bi serê min de nehatiye.



Lê belê dema hûn ji cîyên dijîn dûr dikevin, rastî hin tiştên din tê. Mala min li Eşrefpaşayê ye û kesên li wir dijîn hev du nas dikan.

"EZ li wir xerîbîyê nakişînim. Dema ez ji wir têm Alsancakê, bi çavekî xerîb li min dinêrin. Bi gotinan destdirêjî li min tê kirin. Gotinêñ wan him bi Ingilîzî him jî bi Tirkî ne. Car caran jî bi destan min nîşanî hev didin û dibêjin Ereb"

Pirsgirêkên jinan zêdetir in

Li Tirkîyeyê wekî hemû jinêñ din, jinêñ Tirkêن Afro jî ji ber zihîyeta erkperest di bin zextan de ne. Lê belê pirsgirêkên wan jî ên din zêdetir in.

Jinêñ xwendevan û xwedîpîşe, him di jîyana xebatê de him jî di jîyanêñ xwe ên ferdî de li gorî ên din dikarin bi hêsanî li dijî cudakarîyê dengê xwe bilind bikin. Lê jinêñ karkerêñ demsalî û di hilberînê de dixebeitin, gava li ser wan cudakarî û zextêñ têñ kirin û nikarin dengê xwe bilind bikin.

Karakartal dîyar dike ku dê di siberojê de ji bo wan jinan hin projeyê piştgirîya aborîyê pêk were û wiha dibêje: "Li ser wan jinan zêdetir destdirêjî tê kirin. Bêyî sîgorte wan didin xebitandin. Jinêñ rengspî dikarin daxwaza sîgorteyê bikin, lê belê ew nikarin. Ji ber vê yekê em ji zarokan re dibêjin perwerde bibin, bibin xwedî pîşe."

Kenan Çayır: “Divê hişmendîya hişk, sivik bibe”

Navenda Lêkolîn û Pêkanîna Xebatêن
Civakî û Perwerdeyî a Zanîngeha Stenbolê
di navbera mamosteyên dibistanan û
akademîsyenên li zanîngehan de têkilîyê
çê dike û ji bo zêdebûna danûstandina
agahîyên her du alîyan xebatan dike.



Prof. Dr. Kenan Çayır dîroktoरê navenda
ku li ser cudakarîya di perwerdeyîyê de
dixebite, ye. Çayır dîyar dike ku divê li dijî
cudakarîya di perwerdeyîyê de xebatêن
xurt were kirin. Hişmendîya hişk ku li
hemberî hin civatan tê meşandin, dibe
sedema cudakarîkirinê û wiha dibêje:

“Lêkolînêن hatine kirin nîşan dide ku
li hemberî Tirkêن Afro helwesteke hişk
heye. Tiştê ku dibe sedema cudakarîyê

ev hişmendîya hişk e. Di destpêkê de
divê meriv van tiştan baş zanibe û ji
bo sivikkirina hişmendîya zarokên li
dibistanê xebatê bimeşîne.”

“Meriv dikare xebateke wiha tenê li
ser wêneyên di pirtûkêن zarokan de jî
bike. Wekî mînak, di pirtûkêن dibistana
destpêkê de wêneyên zarokên ji welatan
hene. Lê belê wêneyên zarokên Çînî û
Ereb wisa hatiye nîşandan ku hişmendîya
li hemberî wan tûjtir dike.

“Divê meriv di wêneyan de cureyên kincêن
li wan zêdetir bike, him bi kincên modern
him jî bi kincên gelêrî nîşan bide. Ev, ji bo
sivikkirina hişmendîyê rîyeke baş e. Her
wiha der barê Tirken Afro de bi awayekî
pirrengî agahî di dersan de were dayîn, dê
bibe xebateke baş.”



**Jî bo cudakarıya li ser wan bi
dawî bibe, bi rengspîyan re
dizewicin**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TIRKÊN AFRO - 3

Komele wekî navenda hafizayê dixebite. Tirkên Afro tengezar in ku wekî civata “egzotîk” wan didin nîşan. Hewldanêni li dijî cudakariyê pêk tînin û dixwazin ku koledarî di pirtûkên dersên dibistanê de cî bigire.

Aynûr Tekin
Ferhat Demir



Bi kesên rengspî re dizewicin

Li Tirkîyeyê helwesteke şaş heye ku dibêjin: “Nijadperestî tune ye”. Di rewseke wiha de Tirkêن Afro ku kal û pîrên wan ji Afrîkayê wekî kole bi zorê hatine anîn, ji bo cudakarîya li ser wan bi dawî bibe, an bi giştî di halê xwe de dimînin û bi civakê re têkilîyên wan sînorkirî dimîne, an jî bi kesên rengspî re dizewicin ku zirîyeta wan spî be.

Li Tirkîyeyê di jîyana rojane de cudakarîyên curbecur tê kirin. Ji zarokên Tirkêن Afro re dibêjin “şêrîn”, navûçikên wekî “çîkolete”, “Ereb” li wan tê kirin. Car caran jî wan li derve wekî tûrîst dibînin û tinazê xwe bi wan dikin.

Ji ber ku naxwazin zarokên wan zehmetîyên wan kişandine bikişînin û ji bo jenerasyona wan a nû rengspî be bi kesên rengspî re dizewicin. Di van zewacan de kesayeta wan kesan, ne girîng e. Tenê dixwazin jenerasyona nû rengspî be û bi vî awayî dizewicin.

Di lêkolînên li qadê de Alkr. Doç. Dr. Lülüfer Körükmez bi taybetî bi jinan re hevdîtin kiriye. Körükmez dîyar dike ku piştî zewacê, malbata hevsera/ê kesên rengres bêrûmetî li wan tê kirin û wisa dibêje:

“Ji ber van sedeman hevberdan û cihêbûn her ku diçe zêdetir dibe. Bi

taybetî li gundan gelek jinê ku hevserê xwe berdane û bi zarokên xwe re dîjîn, hene. Ew jin piştî hevberdanê bi zarokên xwe re vegeyîane cem malbata xwe. Pîrikên zarokan li wan xwedî derdikevin û ew jin jî hewl didin ji xwe re karekî peyda bikin û bixebitin. Bi piranî di sektora hilberînê de wekî karkerên demkî dixebeitin. Hejmara malbatêni wiha gelekî zêde ne û di navbera xwe de çi qasî ji destê wan tê hevgirtinê dikan.”

Li jinê rengres “destdirêjî” zêdetir tê kirin

Rojnameger Alev Karakartal balê dikişîne alîyekî din ê mijarê û dibêje ku li gorî jinê



rengspî, zêdetir destdirêjî li jinê rengres tê kirin:

“Berê meriv li te dinêrin. Dibêjin, Tu ji ku yî, melez î an na?, paşê jî dibêjin Wey tu çi qasî şêrîn î! Di dawîya vê yekê de bêyî destûr destê xwe dirêjî te dikan, berê destê xwe bi rûyê te dikan û paşê bi pêş ve diçin. Ev yek destdirêjî ye. Her tim destdirêjî li te tê kirin lê tu nikarî vê yekê ji kesî re vebêjî.”

**“Reş!” ne ku “Ereb”,
“Çîkolete” û “Rengres”**

Meriv wekî Ereban were binavkirin...
Civaka Tirkê Afro bi piranî dixwazin bi vî

rengspî, zêdetir destdirêjî li jinê rengres tê kirin:

“Berê meriv li te dinêrin. Dibêjin, Tu ji ku yî, melez î an na?, paşê jî dibêjin Wey tu çi qasî şêrîn î! Di dawîya vê yekê de bêyî destûr destê xwe dirêjî te dikan, berê destê xwe bi rûyê te dikan û paşê bi pêş ve diçin. Ev yek destdirêjî ye. Her tim destdirêjî li te tê kirin lê tu nikarî vê yekê ji kesî re vebêjî.”

**“Reş!” ne ku “Ereb”,
“Çîkolete” û “Rengres”**

Meriv wekî Ereban were binavkirin...
Civaka Tirkê Afro bi piranî dixwazin bi vî



awayî werin binavkirin. Beyhan Türkolu dibêje ji ber ku ew Afrîkayîbûnê wekî bêrûmetkirinê dibînin û wiha dewam dike: “Di medyayê de bi piranî Afrîkayê bi xizanbûn û nexweşîyan tînin ziman. Tiştên xweşik û erêni gelekî hindik tînin ziman. Ji ber vê jî ev kes razî ne ku bibêjin: “Ez ne Afrîkayî me, ez Ereb im an rengres im.” Bê guman em jî li vir hatine dinyayê û mezin bûne. Lê belê em ne Asyayî ne, Afrîkayî ne. Ev kesen hanê bi damezirandina komeleyê re zêdetir bûne xwedîyê vê helwestê.”

**“Em propagandaya tiştekî nakin,
dixwazin bi dîroka xwe zanibin”**

Tirkê Afro dixwazin zanibin ka ji ku, bi çi

awayî hatine û kevneşopîyên kal û pîrên wan ci ne. Dema hewldanêni xwe ên ji bo van tiştan dikan jî, helwesta hişk a li Tirkîyeyê derdikeve pêşberî wan. Ahmet Doğuyê li Îzmîrê dijî vê rewşê wiha tîne ziman:

“Li derdorê ji bo me dibêjin ku hûn li vir dijîn, lê belê hûn propagandaya wir dikan. Em propagandaya tu alîyî nakin. Wekî hemû kesan em jî meraq dikan ka bav û kalên me ji ku hatine. Pêşiyêne we ji Afyonê hatine. Ên me jî ji Afrîkayê hatine. Ev meraqkirin di xwezaya meriv bi xwe de heye.”

Gelek caran ji Tirkê Afro re wiha tê got:

“Xwedê kiriye ku hûn hatine vir. Eger hûn



niha li Afrîkayê bûna Xwedê dizane ka hûn di çi halê de bûn.” Ahmet Doğu dibêje ev helwest û hişmendî şâş e û ew jê aciz dibil û wiha bersivê dide: “Wê demê jîyan dê bi wî rengî bûya.”

Çetinbilek: “Ez li Ewropayê cudakarîyê baş hîs dikim”

Parêzer Orhan Çetinbilek dibêje ku ji ber rengê wî li Tirkîyeyê qet cudakarî li wî nehatiye kirin. Çetinbilek ji ber karêن xwe ên parêzertî û nivîskarîyê gelek caran diçe Ewropayê û dibêje li wir di jîyana rojane de bi awayekî zelal cudakarî heye ku ew vê yekê baş hîs dike: “Heta cudakarîya li Ewropa û Amerîkayê neyê gotin, behsa

a li vir jî nekin. Ev yek kêmâyî ye. Divê ji her alîyî ve bi awayekî rast ev yek were nirxandin.”

Divê koletî di pirtûkên dersan de cî bigire

Komeleya Çand, Alîkarî û Hevgirtina Afrîkayê wekî navenda bîranînê dixebite û bûyerên bi serê merivan de hatiye tomar dike. Hewl dide ku xebatêن berî niha nehatiye kirin bike û heta ku dikare bûyer û çîrokên berê jî tomar dikan.

Agahîyên akademîsyenê ku ji çavkanîyên Osmanî berhev dikan, li lêkolînêن komeleyê zêde dikan.



Civata Tirkê Afro li Tirkîyeyê baş nayê zanîn. Di mufredatê de agahîyên der barê wan de tune ye. Karakartal dibêje:

“Dema tu xwe wekî Tirkê Afro didî naskirin, dibêjin ew kî ne. Dema tu behsa koletîyê dikî, dibêjin ku ma koletî li vir heye.”

“Em ji vê yekê êdî gelek aciz bûne. Kolekirin sûcê merivayîyê ye, em ê li ser vê yekê li hev bikin. Wê di pirtûkên der barê dîrokê de behsa vê yekê were kirin.”

“Ji ber ku li vî welatî dîroka koletîyê heye. Ne tenê ji bo me, ji gelên din ên li vir dijîn re jî ev yek pêwist e. Ji ber ku bila her kes bi vî gunehî re rû bi rû bimînin û bi heqîqetê zanibin.”

“Ji min re dibêjin ku min ji xwe re mijareke balkêş bijartiye”

Di nûçeyêن ku heta niha der barê wan de hatine çêkirin de, behsa dîroka wan û welatêن wan ê eslî hatiye kirin. Hin caran miameleya “Tirkên egzotik” li wan hatiye kirin. Ji ber vê sedemê wan jî xwe gelekî ji mîkrofonan dûr xistine.

Me di hevdîtina bi Körükmez re ev pirs ji wî pirsî û wî jî wiha bersiv da:

“Him di civakê de behsa vê mijarê tê kirin, him jî gelek rojnameger, akademîsyen û dokumentervan li ser vê mijarê dixebeitin. Li gorî min balkêşîya bijartina vê mijarê ev e: Me ji xwe re mijareke balkêş peyda kir. Em biçin, li ser mijarê bixebeitin û paşê



pişta xwe bidinê. Ji ber vê helwestê ev
gundîyên hanê êdî gelekî tengezar bûne.
Ji bo wan tu pêşketinekê pêk naynin,
rastîyê baş dernaxînin holê û bi minet tev
digerin.”

Körükmez dîyar dike ku him ji bo Tirkên
Afro him jî ji bo neteweyên din ku
cudakarî li wan tê kirin, lêkolîn û xebatek
were kirin; divê feydeyek ji bo rewşa wan
a îro û pêşketin ji bo zanîna dîroka wan çê
bibin.

Körükmez tîne ziman ku divê xebatêni ji
bo qebûlkirin û entegrebûna civakê were
kirin, ew pratik jî divê bi kesê cudakarî li
wan hatiye kirin re na, bi biçûktirêni wan
re were kirin.”

Aynûr Tekin

Di sala 2011an de ji li Zanîngeha Enqereyê Fakulteya Ragihandinê qedand. 2012an de
li Îtalyayê tevlî Xebatêni Xwebexş bû. Di 4 salên dawî de li gelek rojname û kovaran
de xebitî. 9 meh in bi awayekî serbixwe rojnamegerî dike. Niha li GazeteDuvar, Zero û
Journoyê nûçeyên taybet amade dike. Di asteke baş de Îngîlîzî dizane.

Ferhat Demir

Di sala 2010an de ji li Zanîngeha Enqereyê Fakulteya Ragihandinê qedand. Li hin
rojname û şirketên prodîksiyonê de xebitî. Li Azadî Tvyê beriya bi girtina bi KHKê,
nûçegihanî dikir. Niha li Stenbolê kameramantî û derhêneriya dîmenan dike. Kurdî û
Erebî dizane.



Pirsgirêkên navendê rehabîlîtasyonê taybet: Mînaka Çewlikê

Remzî Budancir
Leyla Ayaz

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

JI ASTENGDARAN RE DESTEKA
PERWERDEYÎYÊ - 1

Li ser pêkanîna “Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê”, rêxistinê astengdaran û rêvebirê herêmî ên Wezareta Perwerdeyîyê niqâşan dikan.

Li Tirkîyeyê pêkanîna “Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê” di sala 2005an de dest pê kir. Heta wê demê tenê zarokên xwedî ewleyîya sosyal karîbûn perwerde bibûna.

Pêkanîna nû bi “Qanûna 5378an a Der Barê Astengdaran De û Guhertina Biryarnameyên Di Hikmê Qanûnê De” di 1ê Tîrmeha 2005an de hat guhertin û di Rojnameya Fermî de hat weşandin. Bi pêkanîna nû re kesên %20 û jortirê wî kêm bin, êdî xwedî mafê perwerdeyîyê ne.

Hejmara navandan sê qatan zêdetir bûn

Bi vê pêkanînê re hejmara navendêن perwerdeyîya taybet û rehabîlîtasyonê zêdetir bûn. Kesên navenda rehabîlîtasyona taybet vekirine mal bi mal gerîyan û kesên astengdar tesbit kirin, ji wan kesan re, ji bo wergirtina rapora astengdarîyê bûn alîkar. Bi vî awayî hejmara xwendekaran jî gelekî zêde bû.

Li gorî agahîyên Midûrtîya Kalepîr û Astengdaran a Wezareta Malbat û Polîtîkayên Civakî, di navbera salêن 2006-2007an de hejmara xwendekarêن astengdar 131 hezar û 206 e. Piştî heşt salan (2014-2015) ev hejmar sê qatan zêdetir bû û gihişt 349 hezar û 681ê.

Li gorî agahîyên Wezareta Perwerdeyîyê di sala 2017yan de hejmara navendêن rehabîlîtasyona taybet bûye 2 hezar û 30. Di van sazîyan de 333 hezar û 280 xwendekar têن perwerdekirin.

Ji bo navandan 12 milyar TL

Wezîrê Perwerdeyîyê İsmet Yılmaz li meclîsê, di dema dîyarkirina “butçeya 2017yan” de peyivî û got ku ji 2016yan vir ve butçeya ku ji navendêن rehabîlîtasyona taybet re hatiye şandin 12 milyar û 188 milyon û 990 hezar TL ye.

Mufredat û Peredayîn

Li navendêن rehabîlîtasyona taybet, kesên xwedî rapora zêdetirî %20 an astengdar in, mehê 8 saet perwerdeyîya ferdî û mehê çar saet jî bi bernameya komî têن perwerdekirin.

Dewlet ji bo her kesekî/e astengdar, her meh ji bo perwerdeyîya ferdî 509 TL, ji bo perwerdeyîya komî jî 143 TL pere ji navandan re dişîne.

Mufredat û Neçûyîn

Piştgirîdayîna aborî a ji navandan re li gorî hejmara xwendekarê ku besdarî dersan dibin dîyar dibe. Welîyê xwendekaran jî ji bo zarokên wan besdarî dersan dibin, belgeyekê imze dikan.

Mufetîşen girêdayî Wezareta
Perwerdeyîyê, ji hêla mufredat û derdora avayîya navendê ve kontrolan dikan. Lê belê nikarin çûn û neçûna xwendekaran bişopînîn. Heta ku welîyên xwendekaran gilî nekin, nikarin çûn û neçûna dersan tesbit bikin.

Bêusûlî

Bi piranî di warê sextekarîya ewraqan de, ji bo perestandina ji dewletê, bi derewan heye nîsandana xwendekaran ve bêusûlî tê kirin.

Nûçeyên der barê bêusûlîyên li navendên rehabîlîtasyon û perwerdeyîya taybet, di medyayê de tê weşandin.

Di sala 2011yan de li 5 bajaran bi tawanbarîya nelirêtîyê avêtin ser navandan. Polisan gelek kes binçav kirin.

Polisan di sala 2012yan de jî li Edirneyê avêtin ser 4 navandan, dest danîn ser ewraq û komputeran û der barê midûrên navandan de lêpirsîn hatin destpêkirin.

Sozên dayî

Ji ber ku li navandan bi piranî helwesta bazirganîyê serdest e û welîyên xwendekaran jî, ji bo berjewendîyen biçûk di nava vê yekê de cî digirin; bêusûlî tê kirin.

Tê gotin ku rayedarênavandan bi komir û pereyan welîyan dixapînin û îmzeyê ji wan digirin ku zarokên wan ên astengdar wekî perwerde bûye bê nîşandan.

Ji bo mînakê, em dikarin bûyereke di sala 2012yan de vebêjin. Li Peyasa Amedê zarokeke li navendê tomarkirî canê xwe ji dest dide. Navend, zaroka mirî heta 3 mehan wekî ku besdarî dersan bûye nîşan dide û ji wezaretê pereyan digire. Li ser gilîkirina malbatekê ev yek derdikeve holê.

Perwerdeyî karê dewletê ye

Endamê Desteya Rêvebirîya Federasyona Koran a Altınoktayê û Serokê Şaxa Amedê Mehmet Akif Karakaş dibêje ku bêusûlî li gelek deverên Tirkîyeyê pêk tê.

“En ku karê xwe baş dikan hene. Lê belê en dibêjin ez ji xwe re 100-200 xwendekarî bibînim û ji dewletê pereyan bistînim jî hene. Divê bi lezgînî piştrastkirin pêk were. Bila perwedeyî ji hêla dewletê de were kirin.”



Berpirsyarî di stûyê me hemûyan de ye

Li gorî Serokê Şaxa Amedê a Komeleya Astengdarê Bedenî Ömer Aksan, di sala 2015yan de li Amedê 125 hezar kesên astengdar hene.

“Li gorî gilîyên tê kirin peywirdarênavandan, ji kesên astengdar re dibêjin ku em ê mehê 100 Lîreyî bidin we û ne hewce ye ku hûn werin wir jî. Em nikarin desttêwerdanê bikin. Me ev yek ji rayedaran re jî negot. Ji ber ku dê me bikin hedef. Heke em gilî bikin, dibe ku ew sazî werin girtin jî.”

“Heke mabatên astengdaran vî mafê xwe nefiroşin, ew navend nikarin vê yekê li

kesekî din bike. Divê malbat bêusûlîyan ji rayedaran re ragihîne. Ev berpirsyarî li ser me hemûyan e.”

Navend û Malbat

Serokê Komaleya Hemû Astengdarê Çewlikê İdris Canlı jî, ji bo çareserîya pirsgirêkan malbat û navandan nîşan dide.

“Li bajarêni biçûk ên wekî Çewlikê her kes hev du nas dike. Navend ji malbatan re dibêjin “Rapora zarokê bidin me. Em ê her meh bi komir, debar û pereyan alîkarîyê bidin we.” Raporê zarokên astengdar kom dikan. En ku raporê wan tune ye jî, ji bo wan raporê derdixin. Wan ev yêk kiriye bazirganî.”



Canlı dibêje ku nûnerên navandan ji bo peydakirina xwendekaran, berê xwe didin gundan û malbatêñ xizan û wiha didomîne:

"Welîyên ku ji mafêñ xwe ne agahdar in û xwendina wan tune ye zû îqna dibil. Malbat ji bo 4-5 torbe komir, kolîya xwarinê an jî mehê 100-150 Lîra pere îmzeyê dide ku zarokê/a wan wekî diçê dersê were nîşandan. Vê yekê gilî jî nakin."

Wezaret pergala şopandinê çê dike

Wezareta Perwerdeyîyê ji bo şopandina

xwendekar û dersdaran dest bi pergaleke nû dike: Pergala Nasnameya Bîyometrîk.

Di 9ê Berfanbara 2016yan de bi Biryarnameya Der Barê Sazî û Peywirêñ Wezareta Karêñ Perwerdeyîyê hat guhertin ku êdî li navandan bi pergala nasnameya bîyometrîk û tomarkirina kamerayê dê karibin dersdar û xwendekaran bişopînin.

Midûrê Giştî ê Sazîyên Perwerdeyîyâ Taybet a Wezareta Perwerdeyîyê Kemal Şamlıoglu di meha Rêbendanê de daxuyanî da û got ku dê pergala nasnameya bîyometrîk li hemû navandan were bicîkirin.



Li gorî plansazîyê wê ji 1ê Rezbera 2017yan bi şûn de ev pergal dest pê bike.

Pergala nasnameya bîyometrîk dê bibe çareserî

Midûrê Perwerdeyîyê ê Çewlikê Kadri Engin dibêje ku wê bi nasnameya bîyometrîk xwendekar û dersdar werin şopandin.

"Der barê çûn û neçûna xwendekaran de belge ji hêla navandan ve tê amadekirin û ji hêla welîyan ve têñ îmzekirin. Bi vê yekê dê hin guman jî ji holê rabin."

"Dê di pergalê de were dîtin ku kîjan

xwendekar beşdarî kîjan dersê bûye û dersdar kî bûye."

Pergala Xwendina Rehan

Alîkarê Midûrê Navenda Lêkolîna Rehbertîyê (RAM) İzzet Argün got ku bingeha pergala xwendina rehan hatiye çêkirin, agahîyên der barê xwendekar û dersdaran lê hatiye zêdekirin:

"Li tevayîya Çewlikê 1700-1800 xwendekar hene. Heta vê demê agahîyên 1200 xwendekar û 30 dersdaran li pergalê hatiye zêdekirin. Tenê 500 xwendekar mane. Piştî agahîyên wan jî lê were zêdekirin, dê dest bi bikaranîna pergalê were kirin."

Taloqkirin

Çêkirina pergala xwendina rehan cara yekemîn di 2012yan de hat rojevê. Dihat payîn ku di 2014yan de êdî dest bi pergâlê were kirin û ji bo destpêkê jî 17 bajar hatibûn bijartin.

Ji ber ku hin komele û sazîyên astengdaran bertek nîşanî vê pergâlê dan, pêkanîn taloqî 2015yan hat kirin.

Bi rêziknameyeke ku di meha Gulana 2012yan de hat ragihandin de dê pergala xwendina kefa destan li her derê were bikaranîn, lê belê ev yek heta niha tenê li RAMên ku girêdayî dewletê ne, tê kirin. Navendên perwerdeyî û rehabîlîtasyona taybet naxwazin vê pergâlê bi kar bînin.

Berî her tiştî zarok

Komeleyên astengdaran dibêjin ku pergala xwendina kefa destan dê derûnîya zarokan xera bike. Rêvebirîyên navandan jî heman tiştî tînin ziman.

Midûrê Navenda Rehabîlîtasyona Bir Umutê a Çewlikê Mehmet Çapak dibêje ku pergala xwendina rehan ne çareserî ye û dê pirsgirêkên nû ji ber vê çê bibin:

“Li van deran xwendekarêن pêwistîya wan bi perwerdeyîya taybet heye, perwerde dibin. Ev zarok zehmetîyên gelekî mezin dikişînin. Ditirsin. Ji bo her dersê hûn

nikarin destê zarokan bidin xwendin. Ev yek dê derûnîya wan xera bike.”

“Hûn nikarin bi kontrolkirinê vê yekê çareser bikin. Ji ber ku divê pergala zarokan nede tirsandin. Bila li dibistanan pergala kamerayê were sazkirin. Di vî warî de pêngaveke çawa pêk were jî divê taybetîyên zarokan li ber çavan were girtin.”

Wêne: Leyla Ayaz



Du rêvebir li ser pêkanîna “Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê” nîqaş dîkin

Remzî Budancir

Leyla Ayaz

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

JI ASTENGDARAN RE DESTEKA
PERWERDEYÎYÊ - 2

Li Çewlikê du midûrên navendên rehabîlîtasyonên taybet Bukan û Çapak der barê programa “Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê” de behsa pirsgirêk û çareserîyan kirin û li welatê Ewropayê şêwazê pêkanîna vê yekê anîn ziman.



Li tevayîya Tirkîyeyê zêdetirî 2 hezar navendên rehabîlîtasyonê hene. 333 hezar û 280 kesên astengdar li vir tê perwerdekirin. Piranîya kesên tê perwerdekirin, xwendekar in. Ji bo wan xwendekaran li gorî astengî û kembûna wan perwerdeyî tê dayîn.

Pirsgirêkên astengdaran ku li her dera Tirkîyeyê tê nîqaşkirin, di rojeva hin navendên taybet de ye jî. Rêvebirên gelek navandan dixwazin çavdêrî û kontrola li ser navandan zêdetir bibe ku pêşî li suîstîmalkirinan were girtin û navendên ku ji bo perwerdeyî û bazirganîyê hatine vekirin jî divê were cudakirin.

Der barê bernameyên perwerdeyîyê û kesên tê perwerdekirin û pirsgirêkên wan de li Çewlikê em bi 2 midûrên navandan re peyivîn. Yek ji wan Midûrê Navenda Rehabîlîtasyon û Perwerdeyîya Taybet a Ayışığıyê Doğan Bukan e û ê din jî rêvebirê Navenda Rehabîlîtasyon û Perwerdeyîya Taybet a Bir Umutê Mehmet Çapak e.

Doğan behsa hin pirsgirêkên di vî warî de kir û pêşnîyarên xwe ên der barê çareserkirinê de anî ziman. Çapak jî behsa pêkanînên li welatên Ewropayê kir.

Bukanê midûr diaxive

Navenda Rehabîlîtasyon û Perwerdeyîya Taybet a Ayışığıyê di sala 2013yan de hat damezirandin. 8 mamoste û psîkologek li vir 135 xwendekaran perwerde dikin. Bukan destnîşan dike ku xizmeta tê dayîn “piştgirîya perwerdeyîye” û behsa tiştên pêwist e were kirin dike.

* Xwendekarênu herî kêm %20 astengdar bin berê bi welîyên xwe re serî li Navenda Lêkolîna Rehberîyê (RAM) didin.

* Lijneya ku ji peywirdarên midûriyeta perwerdeyîye pêk tê, li gorî pêdivîyên xwendekaran

bernameya perwerdeyîya ji bo selekê dîyar dikan.

* Welî li gorî vê bernameyê navendekê hildibijêre.

Di çarçoveya perwedeyîye de hefteyê carekê 2 saetan perwerdeyîya ferdî, mehê 4 saetan jî perwerdeyîya komî tê dayîn.

Di perwerdeyîye de aheng û cudayî

Ji ber ku bernameyên navandan ne yek in, dema xwendekar serî lê didin navend jî hewl dide ku bernameya xwe nêzîkî bernameya xwendekaran dîyar bike.

Bukan dibêje ku li Navenda Rehabîlîtasyon û Perwerdeyîya Taybet a Ayışığıyê ji bo xwendekarê astengdarê zihîn û ji bo xwendekarê ku dereng hîn dîbin perwerdeyî tê dayîn.

“Xwendekarê ku dereng fêrî tiştan dîbin, di bernameya hînbûna bi hev re de ne. Ji bo wan xwendekaran dersên Tirkî û Matematîk tê dayîn. Dersên ku li navendêن taybet tê dayîn bi koordîneya dibistana ku zarok lê perwerde dîbin û RAMê pêk tê.”

“Xwendekarê li navenda me, perwerdeyîya xwe a li dibistanan jî dewam dikan. Li gorî bernameya RAMê û midûriyeta perwerdeyîye ders tê dayîn.

Ev yek li gorî taybetîyên xwendekaran hin caran tê guhertin.”

“Em xwendekaran dikan du komên cuda û bi wî awayî dersan didin wan. Du bira hene ku xwendekarê me ne. Yek ji wan di bernameya hînbûna bi hev re de tê perwedekirin. Rewşa birayê din ji wî girantir e. Ji bo ku moralê birayê din xera nebe, em wan di demên cuda de, ji malê tînin. Em her roj, du caran servîsê dişînin mala wan. Li gorî me divê ev yek bê kirin.”

Pirsgirêka servîsê

Kesên dereng fêr dîbin, ji zihîn ve astengdarên giran, astengdarê fîzîkî û temenmezin nabe ku di heman wesayîte de biçin û bêñ. Midûr Bukan dibêje ku ew kes ji bihevreçûnê aciz dîbin.

Bukan balê dikişîne ser helwesta civakê û dibêje ku hin kes, navendêñ rehabîlîtasyonê wekî “dibistana dînan” bi nav dikan.

“Zarokêñ ku têñ navenda rehabîlîtasyonê wekî dîñ têñ binavkirin. Zarok jî malbatêñ wan jî, ji vê yekê aciz in. Em bi taybetî nav û ambleman bi servîsêñ xwe ve nakin.”

Kêmayîya mamoste, pispor û servîsê

Bukan dibêje ku li navendêñ

rehabîlîtasyonê taybet digel van pirsgirêkên ku em tînin ziman, gelek pirsgirêkên din jî hene.

“Ev xwendekarê hanê li dibistanan jî perwerde dîbin. Ên ku asta van xwendekaran dizane û pêşketina wan dişopîne, mamoste ne. Gelo ev mamoste di warê karê xwe de pispor in an na? Çend personelên pispor hene?

“Çend mamosteyêñ ku di vî warî de pispor in, têñ xebitandin? Tiştekî wiha tune ye. Bi piranî mamoste bi peymanan têñ xebitandin, lê kadroyê nadîn wan. Di warê perwerdeyîye de mamosteyan li gorî pisporîya wan naxebitînin û eger

mamosteyan li ser peymana demkî bixebitînin dê pirsgirêk zêdetir bibin.

Mehmet Çaplak: Pêkanînê li welatêñ YEyê mînak in

Midûrê Navenda Perwerdeyîya Taybet û Rehabîlîtasyonê a Bir Umutê Mehmet Çapak dibêje ku pirsgirêkên li navendêñ rehabîlîtasyonê ku li gelemerîya Tirkîye hene, li Çewlikê tune ne.

Çapak dibêje ku bi kontrolkirinê tu tiş çareser nabe û pirsgirêk di pergâlê bi xwe de ye û destnîşan dike ku divê Wezareta Perwerdeyîye dema perwerdeyîye zêdetir



bike. Ji bo vê yekê jî welatên Ewropayê wekî mînak nîşan dide.

Çapak dîyar dike ku ew pergala hînbûna bi hev re ku li Ewropayê tê meşandin, li Tirkîyeyê tune ye û wiha dibêje: “Sedema vê yekê kêmâyîya kadro û avayîyên perwerdeyîyê ye.”

Li gorî biryarnameya 28296an ku di 18yê Gulana 2012yan de, di rojnameya fermî de hatiye weşandin, li navendên rehabîlîtasyonê perwerdeyîya 12 saetan wekî “perwerdeyîya destekê” tê binavkirin. Bi wê perwerdeyîya ku li gorî ast û rewşa xwendekaran tê dîyarkirin, mebest ew e ku rewşa astengdarbûna wan ji holê rabe an karibin bi wê rewşa xwe têra xwe bike û di civakê de entegre bibe.

Çapak bi kurtayî pêkanîna li welatên YEyê wiha vedibêje

*Li welatên Yekîtîya Ewropayê perwerdeyîya ji bo astengdaran bi dibistana seretayî re dest pê dike.

*Li welatên wekî İtalya, Fransa, Portekîz, İspanya û Îngîlterezeyê xwendekarên astengdar ji pergala hînbûna bi hev re baş sûdê digirin. Ji xwe pergala hînbûna bi hev re bi qanûnan dîkin mecbûrî.

*Li welatên Almanya, Hollanda û Fînlandîyayê astengdarên ku têra xwe

nakin, diçin dibistanê li gorî pêdivî û astengîyên xwe.

*Li gelek welatên endamê yekîtîyê jî him li dibistanan him jî li navendên taybet pêwist be ji bo xwendekaran perwerdeyîya taybet jî tê dayîn.



Xwendekar û welîyêñ Çewlikî dipeyivin

Remzî Budancir
Leyla Ayaz

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

JI ASTENGDARAN RE DESTEKA
PERWERDEYÎYÊ - 3

Birayê Borlukan astengdar e. Bavê wî nexwendî ye. Ew behsa belgeyên ku her meh bi bavê wî didin imzekirin dike...

Malbatênu ku dixwazin zarokênu wan ên astengdar li navendênu rehabîlîtasyonê perwerde bibin baş dizanin ka pirsgirêkênu li wir çi ne û kî ji bo perezezençkirinê raporênu zarokênu xwe didin navendan.

Sazî li ser navê astengdarênu ku naçin dersan pereyan ji dewletê distînin û ev ji bo malbatênu dixwazin zarokênu wan perwerde bibe re, dibe pirsgirêk.



Kılıç xwendekar behsa vê yekê dike

Gülseren Kılıç 14 salî ye. Ji ber pîyê wê hinekî qels e, hewl dide ku bi daran li ser xwe bisekine. Vê pirsgirêka di pîyên wê de 5 sal perê dest pê kiriye. Ew ji bo dermankirinê diçe navenda rehabîlîtasyonê. Pêvajoya dermankirinê hê jî dewam dike.

Kılıç dibêje hin kesênu ku li navenda rehabîlîtasyonê tomarkirî ne, wê ew qet nedîtine û ew kes besdarî dersan nabin.

Derfetê fîzîkî têrê nake

Kılıç tîne ziman ku li navendê derfetê fîzîkî gelekî kêm in:

“Li hin navendan asansor tune ye. Hin hevalên me an bi zehmetîyeke mezin an jî bi alîkarîya kesênu din dikarin di ser pêlikan re herin jor. Li navendê bandê meşê tune ye. Ji bo me di warê fîzîkî û hereketkirinê de perwerdeyîyeke baş nayê dayîn. Eger kêmayîyen teknîkî nebûya dê ji bo min pêvajoya demankirinê zûtir biqedîya. Saetên dersan jî gelekî hindik in.”

Xwendekarê bi navê A. dipeyive

Xwendekarê bi navê A. li navendê diçe dersên perwerdeyîyê û tiştên ku ew tîne ziman xemsarî û nelirêtîyan derdixe holê. Ew jî dizane ku derfetên fîzîkî ên gelek navendên herêmê kêm in û ew navend xwedîyê helwesta bazirganîyê ne.

Xwendekar A. dîyar dike ku herî zêde astengdarêni zihînî pirsgirêkan dijîn û der barê helwesta peywirdaran de wiha dibêje: “Dema raporê dixwazin, xwe gelekî baş dikan. Li dû meriv digerin. Lê piştî raporê distînin, her tiştên wan diguhere.”

“Em bibêjin, heke xwendekarêni ku raporêni wan ê ortopedîyê hene, bi perwerdeyîyê qayîl nebin û jê aciz bibin, dikarin bi xwe ji dibistanê veqetin. Lê belê astengdarêni zihînî nikarin vê yekê bikin.”

“Astengdarêni zihînî dikarin bi destûrdayîna malbatêni xwe dest ji dibistanê berdin. Rêvebirîya dibistanê jî têkilîyen xwe ên bi wan malbatan re xurt dike û xwe baş dide naskirin. Malbat pîranî bi pereyan têna iqnakirin.”

Xwendekaran bi pereyan iqnâ dikin”

Xwendekar A. dibêje ku hevalên wî ên li dibistanêni din jî gelek gilîyen xwe

jê re dîkin lê ew dîsa jî dev ji dibistanê bernade. A. sohbeteke bi hevalê xwe re wiha vedibêje:

“Hevaleke min heye. Ji dibistana xwe aciz e. Dersdar, midûr û perwerdeyîya tê dayîn ne bi dilê wê ye. Min jî jê re got ku eger tu acizî neçe dibistanê. Lê dev jê bernade.”

“Ji ber ku navenda rehabîltasyonê pereye wê ê Açık Öğretimê (zanîngeh an dibistana ku perwerdeyîya wê ji dûr ve tê dayîn) radizîne.”

“Min jê pîrsî ka bavê wê nikare wî pereyî razîne. Wê ji min re got: “Na. Ew nikare wî pereyî razîne.” Ew ji ber wî pereyî li wir dimîne. Bi vî awayî bi pereyan tê iqnakirin.”

Xwendekarê li malê, li dibistanê heyî tê nîşandan

Xwendekar A. dibêje ku gelek xwendekar hene ku nayêni navenda rehabîltasyonê, lê belê dîsa jî wan li wir heyî nîşan didin.

“Hin malbat bi rastî jî dixwazin zarokên wan perwerde bibin. Hin malbatêni din berevajîyê vê yekê tev digerin. Bi taybetî malbatêni li gundan qet bi perwerdeyîye re eleqeder nabin. Dibêjin: ‘Bila zarokên me biçin û pereyan bînin bes e.’ Raporêni wan zarokan derdixin û qeydên wan li dibistanan didin çêkirin.”

“Xwendekar li mala xwe rûdinê, lê li ser kaxezê wekî perwerde dîtiye tê nîşandan.”

Welîyêni xwendekaran nerazîne

Welîyêni ku dixwazin dersdar bi baldarî di pêvajoya perwerdeyîye de cî bigirin jî, ji vê yekê aciz in. Gelek welîyêni ku li bajar û gundan dijîn, dîyar dîkin ku ne pêkan e ku ew bernameyên dersên zarokên xwe bişopînin.

Welî nizanîni ka peywirdarêni navendê di dawîya her mehê de wan belgeyan cîma tînin û bi wan didin îmzekirin û dixwazin Midûrtîya Perwerdeyîye vê yekê çareser bike.”

“Bavê min nizane ji bo ci imze dike”

Ramazan Borlukan (38) debara xwe bi gorsontîyê dike.

Birayê wî ê astengdar, li navendeke rehabîltasyonê perwerdeyîye dibîne. Borlukan dîyar dike ku bavê wî kal bûye, nexwendî ye û wiha dibêje: “Ez dixebitim. Li malê namînim. Dizanim ku birayê min ji malê dibin û dibin dibistanê. Lê belê ez nizanim ka di kîjan dersan de ci hînî wan dikan? Bavê min jî nizane. Dawîya mehê têbel belgeyan didin îmzekirin û diçin. Bavê min nizane ka ji bo ci wan belgeyan imze dike. Ez jî bavê min jî; em nizanîni ka



perwerdeyîyeke çawa tê dayîn.”

Ew mafdar e ku ji perwerdeyîya didin
birayê wî bi guman be. Dibêje ku piştî
birayê wî dest bi dibistanê kiriye, rewşa
wî zêdetir xera bûye.”

“Her tiştî zêdetir diavêje hindurê xwe. Ez
dibêjim di vê pergala perwerdeyîyê de
pirsgirêk heye.”

**Derman: “Diçin nêçîra
astengdaran”**

Navendên rehabîlîtasyon û perwerdeyîya
taybet li herêmê lêkolînan dîkin û raporan
kom dîkin. Zêdetir li gundan vê yekê dîkin.

Mehmet Derman (32) dibêje ku ji ber
ku rapora wî heye peywirdarên wan
navandan çûne cem wî jî.

“Sala 2005an an a 2006an bû. Ez ji gundê
Peyasê me. Gundê me girêdayî navenda
bajêr e. Xebatkarênavandan mal bi mal
digerîyan. Rasterast derketibûn nêçîra
astengdaran.”

“Digotin ew ê ji astengdaran re bibin
alîkar, rapor û fotokopîyên nasnameyên
wan digirtin. Hatin cem min jî. Min neda.
Lê belê minbihîst ku bi dayîna alikarîyên
biçûk gelek kesan tu tiştek ji wan
nepirsîne û raporêxwe dane wan.”



Kesên astengdar bi Pergala Hînbûna Bi Hev Re dikarin perwerde bibin

Remzî Budancir
Leyla Ayaz

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

JI ASTENGDARAN RE DESTEKA
PERWERDEYÎYÊ - 4

*Sekreterê Komeleya Kesên Kor ê Altınoktayê
Berent ji Amedê der barê bernameya Ji
Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê
de peyiví, behsa pirsgirêk û pêşniyarên
xwe ên ji bo çareserîyê kir.*

Yakup Berent mamosteyê rehbertîyê ye. Ew 3 salan li Navenda Rehbertî û Lêkolînê (RAM) a Amedê xebitîye. Niha sekreterê Komeleya Kesên Kor ê Altınoktayê ye.

Em der barê pêkanîna bernameya Ji Astengdaran Re Desteka Perwerdeyîyê a li Amedê de bi wî re peyivîn.

Berent behsa pergala giştî kir, behsa pêşnîyarên xwe ên ji bo çareserîyê kir û bi taybetî bangî welîyan kir.

“Divê welî li ser vê yekê bi girîngî bisekinin, konrtolkirin jî bi awayekî baş were kirin. Meriv dikare bibêje ku bêusûlîyên li gelemeperiya Tirkîyeyê li vir jî tê kirin. Delîla vê yekê jî ew e ku li ser navê xwendekarê ku wefat kiriye, 3 mehan pere hatiye standin.”

Amed

Berent dibêje li tevayîya Amedê zêdetirî 60 navendên taybet hene. Ev navend mehê herî kêm 100 hezar Lîre pereyan ji dewletê distînin. Ev cîyên hanê baş nayêن kontrolkirin.

“Ka bînin ber çavê xwe ku wê êdî servîs baş bixebite, mal bi mal bigere, wê mazotê bişewitîne, personel û servîsên din jî peyda bibe. Hûn bawer bikin ku eger pergala xwendina rehan pêk were dê hejmara navendan nîvî-nîvî kêm bibe.”

“Ji ber ku gelek xwendekar hene, naçin dibistanan, li malê rûniştine û mehaneyên wan jî ji dewletê tê standin. Piştî kontrolên baş ev navend xwe naxin riskê, êdî. Dê hin ji wan werin girtin, hinekên din jî dê bibin yek.

Berent ji ber vê yekê pêkanîna nîşandana pergala bîyometrîk û şopandina bi kamerayê baş dibine. Piştî erêkirina Wezareta Perwedeyîyê dê dest bi pêkanîna vê bernameyê were kirin.

Pirsgirêka kêmbûna pisporan

Berent dibêje ku pirsgirêk ne tenê kêmayîyên li navandan e û pirsgirêkên der barê perwerdeyîya ji bo astengdaran û kêmayîya kadroyê tîne ziman.

“Kêmayîya kadroyên ku kontrolan dikin jî hene. Li Tirkîyeyê mufetîş û mamosteyên di warê perwerdeyîya taybet de destûr girtine gelekî kêm in. Gelo konrol di vî warî de dê çawa were kirin? Divê bi teqezî cîyên ku xwendekar lê perwerde dibin, bernameyên dersan û jîyana wan a sosyal were kontrolkirin. Divê mamoste bi xwe jî were kontrolkirin bê ka di karê xwe de pêşketî ye ana.”

Pergala hînbûna bi hev re

Berent dibêje ku eger bi pergala hînbûna bi hev re zarokên astengdar bi heval û hogirên xwe re li heman cîyî perwerde bibin, dê ji navendên rehabîlîtasyonâ taybet baştir be.

Li Tirkîyeyê di navbera salên 2014 û 2015yan de li dibistanê seretayî, navîn û bilind, 182 hezar û 917



xwendekar li gorî rêziknameyê di perwerdeyîya bi pergala hînbûna bi hev re perwerde bûne.

“Li fêrgeha ku Wezara Perwerdeyîye dibêje ku divê herî zêde 20 kes tê de bin, tenê 2 xwendekarên astengdar dikarin cî bigirin. Di fêrgehekê de herî zêde 2 xwendekarên otîstîk dikarin cî bigirin. Li gorî rêziknameyê zêdetir nabe. Lê belê fêrgehê din jî dikarin werin vekirin. Mamoste di vî warî de dikarin bibin pispôr. Dikarin dibistanan nû werin vekirin. Li navendêن taybet ji bo xwendekarên astengdar di hefteyê de 2 saet tenê perwerde tê dayîn. Ev li dibistanan dewletê 36 saet e. Di pergala hînbûna bi hev re de kesên astengdar her tim di nava perwerdeyîye de ne.

“Xwendekarên astengdar di fêrgeha xwe de li gel hevalên xwe perwerdeyîya li gorî xwe dikare bibîne. Ew xwendekar ji hêla pisporan ve li odaya destekê tê perwerdekirin.”

Dê qalîte bihata nîqaşkirin

Berent dîyar dike ku li Amedê bi pereyê ku li navendêن taybet diçe re, dikarin dibistanan nû çê bikin û wiha dibêje:

“Eger em tevayîya Tirkîyeyê bînin ber çavêن xwe, bi vê çavkanîyê meriv dikare bi sedan dibistanan veke û bi hezaran mamosteyan bixin ser kar. Li dibistanan, ji bo xwendekarên astengdar dikarin fêrgehê taybet çê bikin. Li dibistanan ku were vekirin li gorî rêziknameya Wezareta

Perwerdeyîye dikarin xwendekaran perwerde bikin. Wê demê em ê niha ne ku der barê pirsgirêkan de, der barê qeliteya perwerdeyîye de bipeyivîyana.”

Pêşnîyar

Berent pêşnîyarên xwe ên ji bo çareserîya pirsgirêkan jî wiha rêz dike:

- * Li dibistanan nû divê bi teqez odaya ji bo perwerdeyîya taybet hebe. Li dibistanan heyî jî divê midûrên dibistanan rewşa xwendekarên astengdar bînin ber çavêن xwe û derdora dibistanê li gorî vê yekê saz bikin.

- * Divê malbat jî tev li pêvajoya perwerdekirina astengdaran bibin. Divê bi taybetî li ser malbatêن ku zarokêن xwe

Remzî Budancir

Li Çewlikê ji dayîk bû û li vir dest bi rojnamegeriyê kir. Li rojnameyê Ab-i Hayat (2005), Bingol'un Sesi (2007-2008), Taraf (2008-2015) û li DIHAyê (2006) xebitî. Di sala 2014an de tevlî xebatê ‘Profîla Medyaya Herêmî’bû, 2015an de li ser projeya ‘Li Rojhilat-bâşûrê Xirîstiyan û Elewiyêni Ji Ber Zimanê Tundrew Mexdûr Bûne’ xebitî. Dema li Azadî Tvyê kar dikir, kanal bi KHK’ê hat girtin û ji ber vê jî niha bêkar e.

Leyla Ayaz

Li Wanê ji dayîk bûye. Di sala 2006an de li Ajansa Nûçeyan a Dicleyê dest bi rojnamegeriyê kir. Li Azadiya Welat edîtortî, li JîNHAYê jî mudirîya nûçeyen Tirkî û Kurdî kiriye. Li Amedê li şîrketa Anormal Filmê derhênera kûrgûyê bû. 28ê Îlona 2016an de dema li Van Dogu Radyoyê kar dikir, sazî bi KHKyê hat girtin û ew ji ber vê bêkar ma. Li Amedê dijî.

dışînin navendêن taybet were sekinandin. Divê dersêن ku li navendê wekî destekê didin zarokan were şopandin.

* Divê midûrtîyêن perwerdeyîye û ofîsêن hiqûqê kontrolêن xwe ên li ser navandan zêdetir bikin. Pergala bîyometrîk bi teqezî divê pêk were.

* Wekî mînak; li Amedê lîseya ji bo kesên ker tune ye. Ew xwendekar ji vir diçin Wan û Xarpêtê. Li Amedê ji bo wan tenê dibistana navîn heye. Gelo çîma em ê wan ji derdora wan dûr bixin û bişînin bajarê din. Eger pêngavêن ji bo perwerdeyîya astengdaran were avêtin, divê ev kêmâyî jî were çareserkirin. Li gorî hemû astengdaran, li her bajarî pirsgirêka dibistanan, divê were çareserkirin.



**“Gawirên wir” çûbûn
tenê tax mabûn,
lê tax jî bi giştî ji holê rakirin**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

SÛR - 1

Li Sûrê bi giştî 6 caran derketina derve hat qedexekirin. Qedexeya dawî di 2yê Berfanbara 2015yan de hat ragihandin. Di 9ê Adara 2016yan de operasyonên li vir bi dawî bûn. Lê belê kevir li ser kevir nehiştibûn.

Oktay Altekin

Zana Kibar

Li Tirkîyeyê piştî bidawîkirina pêvajoya çareserîyê, di navbera dewletê û hêzên PKKyê de şer ji nû ve dest pê kir. Di şerên dawîyê de li navçeya Sûrê a Amedê derketina derive gelek caran hat qedexekirin ku heta niha di dinyayê de, tu qedexe ev qasî ne demdirêj bûye.

Navçeya Sûrê cîyekî dîrokî ye. Çanda gelek netewan hê jî di nava xwe de dihewîne. Lê belê ji ber şer û qedexeyan ji bilî koçkirin, binpêkirina mafan û welatîyên hatin kuştin; berhemên dîrokî ên li navçeyê jî gelek zîyan dîtin. Taxa Hasırliyê ku Amedî jê re dibêjin Xançepêk û wekî Taxa Gawiran jî tê zanîn, bi giştî hat hilweşandin. Paşê bi biryara Lijneya Wezîran, dewletê dest danî ser 6 hezar û 300 avayî û xanîyên li Sûrê û kir “malê dewletê”.

Li 6 taxan qedexe dewam dike

Qedexe û hilweşandina li navçeya dîrokî dewam dike. Qedexeya herî dawî di 2yê Berfanbara 2015yan de dest pê kir. Piştî qedexeya 103 rojan ji 10ê Adara 2016yan de dest bi hilweşandina mal û kargehan kirin û ev yek hê jî didome. Li 6 taxên Sûrê kevir li ser kevir nehatine hiştin.

Qaymeqamtîya Sûrê di daxuyanîya xwe a berî niha de ragihandibû ku qedexe li 9 taxên navçeyê (Abdalde, Alipaşa, Lalebey, Süleyman Nazif, Ziya Gökalp, Camii Kebir, Camii Nebi, İskenderpaşa û Melikahmet) hatiye rakirin lê, li 6 taxan (Cevatpaşa, Fatihpaşa, Dabanoğlu, Hasırlı, Cemal Yılmaz û Savaş) qedexe hê jî dewam dike.


Taxa Gawiran êdî tune ye

Herêma Sûrê di sala 1988an de bi temamî wekî “bajarê taybet (sît)” hatibû ragihandin. Di Tîrmeha 2015yan de Kela Amedê û Baxçeyê Hewselê ji hêla UNESCOyê ve di lîsteya Berhemên Çanda Dinyayê de hatin bicîkirin.

Di operasyonan de welatî ji navçeyê hatin derxistin, TSKyê bi tank û topan êrişî navçeyê kir û her der wêran kir. Piştî biryara destdanînê, mal û kargehên ku hindik zîyan bûne an saxlem mane jî hatin hilweşandin û zêdetirî nîvîyê navçeyê ji holê hat rakirin.

Navçeya Sûrê bi kolan, malên berê, kanî, bazirganîya kevneşopîyê û bi avayîsazîya xwe di nava ahengekê de bû.

Di wêneyênu ku li herêma lê qedexe heye de hatiye kişandin de, xuya dibe ku taxa Hasırliyê ku welatîyên Amedî jê re dibêjin Xançepêk ango wekî Taxa Gawiran jî tê zanîn, hatiye hilweşandin û bi giştî ji holê hatiye rakirin.



8ê Sermawea 2015yan

10ê Gulana 2016yan



Hasırlı Mahallesi



8ê Gulana 2017yan

21ê Avrêla 2017yan



Bi blokên beton rê hatiye girtin

Berhemên dîrokî ên hezar salan ku ji bo navçeyê sembola kozmopolîtyê bûn hatine tunekirin. Li taxê tenê Mizgefta Ereb Şêx maye. Hawraya Cihûyan, Dêra Ermenêن Katolîk û Dêra Surp Giragos ku li Rojhilata Navîn dêra herî mezin bû ji holê hatine rakirin. Welatî berê ji navçeyê hatin derxistin û niha jî destûr nayê dayîn ku vegerin warê xwe. Devê kolanêن ku lê qedexe heye, bi blokên beton hatine girtin û benda polîsan lê hatiye danîn. Ji bo rojnamegeran jî çûyîna wir hê jî qedexe ye. Ji xwe welatîyên ku ji wir hatine derxistin vegerin jî, tu tiştek nemaye ku biçin ser.

Li ser vê yekê baroyê bi hinceta biryar bêhiqûqî ye serî li dageha bilind dabû.

Taxên ku dewletê dest danîne ser wiha ne: Abdalde, Alipaşa, Cemal Yılmaz, Camii Kebir, Cevatpaşa, Dabanoğlu, Hasırı (Gawir), İnönü, İskenderpaşa, Lalebey, Malikahmet, Özdemir, Süleyman Gazi, Savaş, Şemhane, Ziya Gökalp, Köskler û Yenişehir”\

*Hûn dikarin li ser vê linke li nimareya parsêlên taxên ku dest danîne ser bibînin.

Bi lezgînî kirina “malê dewletê”

Desteya Wezîran biryar da ku li navçeya Sûrê 16, li Yenişehirê jî 2 bi temamî 18 tax bi lezgînî bibe “malê dewletê.” Biryar di 25ê Adara 2016yan de di Rojnameya Fermî de hat weşandin.

Baroya Amedê ji bo pêkanîna wê biryarê were sekinandin û paşê jî were betalkirin serî li Daîreya Dadgeha Şêwirê a 6. da, lê daxwaza baroyê hat redkirin.

Li ser vê yekê baroyê bi hinceta biryar bêhiqûqî ye serî li dageha bilind dabû.

Taxên ku dewletê dest danîne ser wiha ne: Abdalde, Alipaşa, Cemal Yılmaz, Camii Kebir, Cevatpaşa, Dabanoğlu, Hasırı (Gawir), İnönü, İskenderpaşa, Lalebey, Malikahmet, Özdemir, Süleyman Gazi, Savaş, Şemhane, Ziya Gökalp, Köskler û Yenişehir”\

*Hûn dikarin li ser vê linke li nimareya parsêlên taxên ku dest danîne ser bibînin.

Dest danîn ser %8oyê Sûrê û kirin “malê dewletê”

Bi biryara Desteya Wezîran ku di 25ê Adarê de di Rojnameya Fermî de hat weşandin, dewletê li Sûrê dest danîye ser 6 hezar û 300 mal û kargehan û bi lezgînî kirin “malê dewletê.”

Li navçeya dîrokî, bi giştî nêzîkî 7 hezar û 742 mal û kargeh hebûn. Bi vî awayî dest danîne ser %8oyê navçeyê. Mal û kargehêن welatîyan di carekê de ji destê wan hat standin. Wezareta Derdor û Bajaran li navçeyê Plansazîya Parastina Avayîsazîyê pêk neanî. Mafê jîyanê, mafê perwerdeyîyê, mafê tendiristîyê, mafê gerê ku mafênen merivan ên gerdûnî ne, li ber çavê hemû dinyayê hatine binpêkirin.

Demografî hat guherandin

Yek ji bajarê herî girîng ê Mezopotamyaya Jorîn, Amed e. 17 navçeyen Amedê hene. Navçeya herî kevnar û dîrokî ku berhemên gelek şaristanîyan di hindurê xwe de dihewîne, Sûr e.

Dîroka sûrên Kela Amedê digihêje 7 hezar sal berî niha û navê xwe jî li navçeyê kiriye. Piştî Benda Çînê, dîwarê herî dirêj û fire ên ji bo parastinê hatiye çekirin, Sûrên Kela Amedê ne û di vî warî de xwedîyê girîngîyeke navneteweyî ye.

Li ser sûrên derive û hindûr gelek

motîfên hene ku ev motîf ên bi qasî 30 şaristanîyên cuda ne. Li navçeya ku gelek berhemên olî jî lê heye, %7ê serjimara Amedê lê dijî. Ji alîyê serjimariyê di rêza 5an de ye.

Dîrok hê jî zindî ye

15 taxên navçeyê ku Abdalde, Alipaşa, Cami-i Kebir, Cami-i Nebi, Cemal Yılmaz, Cevat Paşa, Dabanoğlu, Fatihpaşa, Hasırı, İskenderpaşa, Lalebey, Melikahmet, Savaş, Süleyman Nazif û Ziya Gökalp di nava sûran de dimînin.

Ji %45ê serjimara navçeyê li ser 132 hektarê di nava sûran de dijîyan.

Li Amedê dema me nûçe çê dikir, kesên em bi wan re peyivîn tiştên li wir pêk hatine yek bi yek ji me re gotin. Ne tenê bûyerên dawî, bi hafizeyeke zindî behsa 1915yan dikan. Der barê komkirina Ermenêن ji bo tehcirkirinê li cîyê ku Kurd jê re dibêjin “zindan” de, li her navçeyen Amedê biranînê cuda hê jî tê vegotin.

Di heman salan de gelê Suryan jî bi darê zorê hatin koçkirin û kuştin. Wisa tê texmînkirin ku hejmara kesên kuştî, nêzîkî 300 hezaran e. Li Amedê di sala 1914yan de hejmara gelê Ermen 73 hezar bûye lê di sala 1918yan de 3 hezar kes mane. Hejmara Suryanan jî ji 100 hezarî daketiye 27 hezaran. Ci qasî di çavkanîyên cuda de rêjeyen cuda were nivîsandin jî, di çavkanîyên Ermen, Kurd û Osmanîyan

de baş tê dîtin ku berî sala 1915yan %3oyê serjimara Amedê ji Ermen, Keldan û Suryanan pêk dihat.

Türkay: Xemgîya mezin a Ermenan

Ji bo çêkirina nûçeyê em li Amedê, bi Endamê Desteya Rêvebirîyê a Wexfa Dêra Surp Giragos a Ermenan Gafur Türkay re der barê bîranînên wî ên li taxa Gawir de peyivîn. Wî anî ziman ku tax bi giştî hatiye hilweşandin.

Türkay destnîşan dike ku Amed ji berê de warê Ermenan bûye û welatîyên Ermen bi piranî li nava sûran dijîyan. Türkay dîyar

dike ku bîranînên wî ên der barê Taxa Gawiran de ji demêن gelek berê ve dest pê dike.

Li gorî Türkay heta sala 1915yan welatîyên li nav sûran dijîyan %60 Xirîstîyan, %40 jî Misilman bûne û got: “Em dizanin ku gelekî wan Xirîstîyanan jî Ermen bûne.”

Türkay dibêje taxa ku wekî Gawir tê zanîn bi Ermenan, bi avayîsazîya Ermenan tê nasîn.

“Demêن berê, Ermenêن ku bi huner, avayîsazî, xwarin û muzîka xwe tê naskirin li vir dijîyan. Her kes heta êvarê dixebeitîn. Êvarê jî sifra xwe radixistin û tembûra xwe dixistin destê xwe. Mînak



Ji bo temaşekirina vîdeoyê bitikîne



Sami Hazinses, Bedri Ayseli û Coşkun Sabah li wê taxê ji dayîk bûne.”

Türkay di dawîyê de der barê bûyerên li Sûrê dipeyive:

“Dibe ku ez hingî zêde dibêjîm lê der barê Ermenan de tu tiştek nehiştine. Berê digotin ku Gawir çûne lê taxa wan maye; niha êdî tax jî tune ye. Mixabin ew berhemên ku motîfên wan rojan li ser neqîşkirî bû yek bi yek hatin hilweşandin.

“Berê dema hûn ji Mînareya Çarling bi jêr ve diçûn, kolanêن navdar derdiket pêşîya we. Kolanêن ku jê re digotin “kuçe” ku wesayît bi zorê karîbûn tê re derbas bibûna. Niha balafir dikare peyayî wir bibin. Anglo hemû berhem û ahenga dîrokî li wir hat kavilkirin. A rast, em niha gêj

bûne. Ez wekî welatîyekî li Amedê dijîm, ker û gêj bûme.”

“Tiştên ku hatin kirin, ji bo Ermenan xemgînîyeke mezin bû. Qet tiştek nebûbe jî, êdî kolana Mîgirdîç Margosyan tune ye, mal û taxa wî tune ye. Taxa Gawir mixabin hat hilweşandin.”

Dayîka Makbûle: Ji bilî Sûrê ez nikarim li tu cîyî bijîm

Dayîka Makbûle, li taxa Hasırlîyê dijîya û paşê Sûr terk nekiriye û niha li taxeke din dijî. Me li Dayîka Makbûle guhdarî kir. Dike lawelaw û behsa hilweşandina taxa xwe dike. Dayîk bi kelegirî dibêje ku mala wê bi giştî anîne xwarê, ew nikare ji bilî Sûrê li tu cîyî bijî.

“Min zarokên xwe xapand û ji
wan re got ku fîlm tê kişandin”

Dema em li taxên Sûrê digerin ji paceya
malekê dengek tê me ku dibêje: “Mala me
jî xera kirin.”

Em berê kameraya xwe didin wir. Bav
behsa tiştên bi serê wan de hatiye dike û
keça wî a biçük jî li bavê xwe guhdarî dike.

Bav dibêje ku ew li gel hevser, zarok, dê û
bavê xwe, li taxa Hasırılıyê di jêrzemînekê
de 4 mehan tî û birçî, her roj di bin sîya
mirinê de jîyane. Wê demê ji bo zarokên
wî netirsin, ji wan re gotiye ku li taxê
fîlm tê kişandin. Zarok piştî ji jêrzemînê
derdikevin rastîyê dibînin.

Li kuçeyeke din, kalek tê cem me û li ser
pîyan behsa halê xwe dike. Ji ber mala
wî a sêqat hatiye hilweşandin pereyekî
hindik dane wî. Lê wî nikarîbûye tu tiştekî
ji mala xwe derxîne. Bi xemgînî dibêje ku
wekî mala wî, tax bi giştî hilweşandine û
hêdî hêdî di nava kuçeyên teng de dimeşe
diçe.



Migirdîç Margosyan behsa kolan û derdora sûran kir

Oktay Altekin
Zana Kibar

NÜÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

SÛR - 2

*“Ez nabînim. Ez nava Sûrê “kulîk bi kulîk”
ango kuçe bi kuçe, kevir bi kevir dizanîm. Berî
niha min zanîbû ka li ku kanî heye, li ku firûn
heye. Min bi gişkî zanîbû. Lê ez niha biçim wir,
ez ê li wan deran winda bibim.*



Meclîsa Şaredarîya Sûrê, di 9ê Berfanbara 2009an de biryar da ku navê kolana Direkçi wekî “Migirdîç Margosyan” were guherandin. Şaredarê Sûrê ê wê demê Abdullah Demirbaş, bi destê xwe tabela guhert û di daxuyanîya xwe de gotibû ku Amed bajarekî pirreng e, gelek netew, bawerî û çandên cuda di nava xwe de dihewîne û ji berê ve her kes bi aştî û biratî dijîn.

Pêngava pirzimanî a Şaredarîya Sûrê a ji bo jîyana aştîyane, di nava civakê de bi girîngî hatiye pêşwazîkirin. Lê belê Migirdîç Margosyan wê demê gotibû ku helwesta li Tirkîyeyê hê jî neguherîye, dibe ku ev pêngavê hanê di siberojê de bê betalkirin û nexwestibû navê wî li kolana ku ew lê ji dayîk bûye were daliqandin.

Tiştên pêk hatine,
pêşbînîyên Margosyan
bi xwe ne.

Ne tenê navê wî ê li kolanê daliqandî
hatiye xwarê. Di qedexeya ku di
25ê Berfanbarê de dest pê kir û
103 rojan dewam kir de, kolana
Migirdîç Margosyan jî bi giştî hat
hilweşandin û niha kolaneke wisa
tune ye.

Him der barê van bûyerên dawîyê
de, him jî der barê jîyana berê a li
Sûrê de, em bi Migirdîç Margosyan
re peyivîn.



Migirdîç Margosyan kî ye?

Di 23yê Berfanbara 1938an de li taxa Xançepêkê (Gawir) a Amedê hatiye dinyayê. Li Dibistana Seretayî a Süleyman Nazif dest bi perwerdeyîyê kiriye. Piştî perwerdeyîya li Dibistana Navîn a Ziya Gökalp diçe Stenbolê. Li Dibistana Navîn a Bezcîyan û li Lîseya Getronaganê perwerdeyîya xwe didomîne.

Paşê li Zanîngeha Stenbolê, Beşa Felsefeyê diqedîne. Di navbera salên 1966-1972yan de li Üsküdar Selamsızê dibe midûre Lîseya Ermenan a Surp Haç Tibrevankê. Di heman demê de li dibistanê dersên felsefe, psîkolojî û zimanê Ermenî jî dide.

Hin çîrokên wî ên bi Ermenî nivîsîbû û di rojnameya Marmarayê de hatibûn weşandin, bi navê “Ayt Goxmerî” (Odeyên Me) wekî pirtûk hat çapkiran. Ev pirtûka

wî di sala 1988an de hêjayî Xelata Elîz Kavûkçûyan a Edebîyatê (Paris-Fransa) hat dîtin. Vê xelatê didin nivîskarêni bi Ermenî dinivîsin. Piştî pirtûkên wî ên “Taxa Gawiran”, “Bibêje Margoso Tu Ji Ku yî?”, “Bilêta Me yî Stenbolê Hat Birin” bi Tirkî hatin çapkiran, pirtûka wî a duyemîn ku bi Ermenî nivîsîbû “Dîkrîsî Aperen (Keviyê Dîjleyê)” jî hat çapkiran.

Pirtûka wî a “Gavur Mahallesi” bi navê “Li Ba Me, Li Wan Deran” ji hêla Weşanê Avestayê ve bi Kurdî hat weşandin.

Piştî pirtûkên wî ên “Kurd”, “Nameyên Ji Kirîv re” û “Derzîya Bi Çembil” çap bûn, pirtûka wî a dawî “Tanrıının Seyir Defteri” ji hêla Weşanê Arasê hat weşandin. Quncenivîsên Margosyan hê jî, di rojnameya Evrenselê de tê weşandin.

“Direkçi” bû “Margosyan”

Sûr warê Ermenan ê berê ye. Hûn jî li wir dijîyan. Hûn dikarin behsa derdora sûran, Taxa Gawiran bikin ka ew der di bîra Ermenan de xwedîyê cîyekî çawa ye?


Ji xwe gava ku em behsa Sûrê dîkin ew bajarê Amedê bi xwe ye. Paşê li derveyî

sûran mal û kargeh hatine çêkirin ku ew li derveyê Ameda kevn e. Welatîyên Ermen bi piranî li Xançepêkê ango li taxa Gawir dijîyan. Wekî ku ji navê wê jî dîyar e, li wê taxê kesêni ku ne Misilman bûn, dijîyan. Zaroktîya min a heta sala 1950yî li wir, li Amedê derbas bû. Bajarekî ku Xirîstîyan û Misilman tevî hev dijîyan. Taxê Ermanan, Suryanan hebûn. Ne bi qasî ên din be jî, gelek malêñ Keldanîyan jî hebûn...

Jîyanêke bi hev re hebû. Taybetîya Taxa Gawiran ew bû ku ên lê dijîyan bi piranî esnaf bûn. Ango zêrfiroş, hesinkar, paxirkar û hwd. Ew li gel hev dijîyan. Wê demê televîzyon tune bû. Di şevêñ zivistanê de Ermenên wir dihatin gel hev, behsa xwe û karêñ xwe dikirin. Di sohbetan de wekî “Kirîv” bangî hev dikirin: “Kirîv tu li ku derê qefleyê bûyî.” Qefleya ku behs dikirin ên li ser biryara tehcîrê koç kiribûn bû. Li Amedê behsa “Jenosîd” an “tehcir”ê nedikirin, tenê digotin “qefle”. Dema wan di şevêñ dirêj de ev sohbet dikirin, em jî li gel zarokêñ din li ber sobeya sac rûdiniştin û me gûz dixwarin. Jîyana me bi vî rengî bû.

Taybetîya taxa Gawiran ew e ku her tim hevgirtî bûye. Di dîrokê de gelek caran li ser taxê êriş kirine. Gelo sedema vê taybetîyê çi ye?

Li Amedê, li tu cîyî, dirêjîya tu kolan an kuçeyan jî 500 mêtre-1 km ne zêdetir e.



Orjînalbûna malên li wir, ji xwe ev yek e. Mal bi avayîsazîyeke wisa hatibûn çêkirin ku hindurên wan zivistanan zef nedicemidî û havînan jî hênik bû. Berî niha banê malan hebûn.

Meriv dikarî di ser banan re biçûya maleke din. Jîyan wiha bû. Li Amedê du cureyên kevirê bazaltê hebûn. Kevirên mêtê kevirên nêr. Kevirên mêtê qulikqulikî bû û pê hewş dihat lêkirin.

Dema hewş dihat şuştin, ji ber qulikên keviran hinek av li ser wan dima û derdor hênik dikir. Kevirên nêr bi destan dihat neqîskirin û pê eywan û kemerên malan dihatin çêkirin. Ên ew çê dikirin jî, %90 Ermenên hosteyên keviran bûn. Bavê min jî yek ji wan bû.

Di sala 2010an de navê we li kolaneke Taxa Gawiran kirin. We di hevpeyvînekê de gotiye ku hûn tiştekî wisa naxwazin. Gelo sedema wê ci bû?

Ez ji bo restorekirina Dêra Ermenan gelek caran çûme Amedê. Ji bilî wê, ji ber ku min der barê Amedê de jî pirtûk nivîsîbû, gelek caran ez dawetî Amedê dihatim kirin û ez diçûm. Xebatkarên şaredarîyê ên wê demê ji ber keda min rojekê gotin ku ew ê navê min li kolana ku ez lê ji dayîk bûme daliqînin.

Min jî ji wan re wiha got: "Dibe ku hûn di vê konjukturê de vê yekê bixwazin. Em ne munecim in. Kes nizane dê sibê ci bibe. Di pêşerojê de eger zihniyet û konjuktur biguhere, dibe ku meriv bibêjin em êdî vî

navî naxwazin. Ez vê yekê naxwazin. Dibe ku mafdar an ne mafdar bin jî.


Eger piştî 3 salan an piştî 30 salan tiştekî nebaş bibe û wî navî ji wir bînin xwarê, him hûn û him jî ez, em ê aciz bin." Rojekê min dît ku navê min lê daliqandine. Wekî min berê jî got ku ez ne munecim im. Lê belê piştî demekê ew nav êdî ne li wir e. A girîng ne nav e jî. Min dixwest ku bi ci navî dibe bila bibe lê, tenê bila çend kesên "Gawir" li wir bijîn.

Piştî hilweşandina Taxa Gawiran û Kolana Migirdîç Margosyan gelo hûn qet çûne Amedê û we ew der dîtine?

Belê ez çûme Amedê lê belê ez neçûme taxê. Wê demê qedexe hebû û bi qasî ku ez dizanim qedexe hê jî dewam dike. Bê guman ez dixwazim biçim bibînim. Lê ez baş dizanim ku eger ez wir bibînim, ez ê gelekî xemgîn bibim.

Em çûn wan deran me ew der dîtin û wêne kişandin. Berî niha hevpeyvîneke bi we re bi serenavê "Bibêje Margosyan Tu Ji Ku yî" hatibû weşandin. Em jî niha ji we dipirsin: "Bibêje Margosyan Ka Kolana Te?"

Ez nabînim. (Li wêneyên taxa hilweşandî dinêre) Ji ber ku li vir tax nemaye. Li vir erse an rîyeke fireh xuya dike. Ez dikarim



bibejim ku ez her derê Sûrê baş dizanim.

Kêlî bi kêlî, kevir bi kevir tê ber çavê min. Berê li ku firûn, li ku aş hebû min zanîbû. Lê belê ez niha biçim wir, teqez ez ê li wir winda bibim.

Ev der kolana ku navê we lê hatiye lêkirin e

(Li wêneyên taxa wêrankirî dinêre) Belê nav jî çûye, kolan bi xwe jî... A rast min ev qasî texmîn nedikir. Ev der kirine wekî meydana futbolê. Cîyê ku meriv lê hatibe dinyayê û baş zanibe, gelo dibe ku meriv nas neke? Mixabin me ev jî dît.

(Li wêneyan dinêre) Ev der kumbeta çana dêrê ye. Berî niha di dewsa vê de yeke din hebû. Li ser saeteke gilover hebû. Ew kumbeta dêrê, baş nayê bîra min lê di navbera salê 1913-15yan de bû ku, ji ber ku ji mînareya mizgeftê bilindtir bû, bi tank û topan hat hilweşandin.

A li vir xuya dibe, paşê hatibû çêkirin. Ji sala 1915yan bi şûn de Ermenên li vir bi darê zorê ji cî û warê xwe derketin. Ma dixwazin berhem û şopên Ermenan jî tune bikin? Ji xwe tu tiştek nemabû.

Ne tenê avayîsazî, çanda wê demê jî hat tunekirin. Dibe ku di dewsa van cîyên hilweşandine de avayîyên modern jî çê bikin. Lê êdî Ameda berê ku min di pirtûkên xwe de behsa wê dikir namîne li holê. Anglo demekê serokwezîrekî me digot, ez ê vê derê bikim Toledo.

Bi Toledokirinê tenê nabe.

Gelo Sûr dibe Toledo?

Ji Sûrê tu tiştek çê nabe. Tenê dikarin şibandiseke bi wî rengî bikin. Tiştê ku derkeve holê jî dîrok, çand û taybetîya Amedê di nava xwe de nahewîne. Dibe ku çend malan boyax bikin û bibiriqînin. Lê merivê li wir dijîn? Lê çanda wan a hezar salan? Ew ruhê hevgirtî û yekbûyî li ku ye? Tiştekî wisa nabe.

**Di dawîyê de em dixwazin ji we
bipirsin ka niha divê ci were kirin
û pêşnîyara we ci ye?**

Ne tenê ji bo Sûrê, ji bo li tu deverê welatê

Rapora NYyê: Qîyamet rabû

Neteweyên Yekbûyî (NY) operasyonên li Şîrnex, Cizîr, Nisêbîn, Sûr, Silopîya û ên li herêmê hatine kirin, di rapora xwe de wekî “tabloya qîyametê” bi nav kiriye. Ofîsa Mafê Merivan a NYyê rapora xwe a binpêkirina mafan ku di navbera Tîrmeha 2015yan û Gelawêja 2016yan de li herêma rojhilatê Tirkîyeyê amade kiriye, hefteya borî dîyar kir. Di rapora ku li ser malpera wan a fermî hat weşandin û ji 26

rûpelan pêk tê de wiha hat gotin: “Di operasyonên ku hêzen hikûmetê pêk anîne de, hatiye gotin ku hilweşandineke mezin hatiye kirin, gelek merivan canê xwe ji dest dane û di gelek warê din de jî, îdiayê binpêkirina mafê merivan hene.”

Li gorî raporê, nêzîkî 30 navçe û gundêni li derdora wan ji ber operasyonan di nava rewşeke xirab de mane. Piranîya wan Kurd di navbera 355 hezar û nîv milyon meriv ji cî û warê xwe hatin derxistin. NYyê her wiha wêneyên Nisêbîn û Sûrê ên di operasyonan de hatibûn hilweşandin jî ku ji peykê hatine kişandin, di raporê de weşandin.

Hûn dikarin li ser vê lînkê raporê
vekin.

Rêxistina Bexîşînê: 500 hezar kes bi darê zorê koçber bûn

Rêxistina Bexîşînê a Navneteweyî di ropora xwe a ku di Berfanbara 2016yan de dîyar kiribû de, ragihand ku herî kêm nîv milyon meriv bi darê zorê ji cî û warê xwe hatin derxistin. Rapor bi serenavê “Ên Bi Darê Zorê

Ji Cîyê Xwe Hatine Derxistin û Milkên Wan Ji Wan Hatine Standin: Mafê Vegerînê ê Ji Bo Gelê Sûrê” hat weşandin û wiha tê gotin : “Sûr yek jî navçeyên di lîsteya mîrateya dinyayê a UNESCOyê de ye. Li wê navçeyê ji ber êriş û cezakirina hêzên dewleta Tirkîyeyê li gorî texmînan nîv milyon meriv ji cî û warê xwe hatine derxistin.”

Rapora HDPyê: “Mîrateya Çandê” hat hilweşandin

Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) di rapora xwe a piştî operasyonan dîyar kir de daxuyand ku li Sûrê 90 sivîl, 71 polîs an tîmê taybet canê xwe ji dest dan, berhemên navçeya kevnare jî hatine hilweşandin. Di raporê de Sûr wekî “di warê çand, civak, aborî û dîrokê de dilê Amedê” tê binavkirin. Di raporê de tê dîyarkirin ka çend caran bi giştî derketina derve hatiye qedexekirin û bi taybetî piştî qedexeya dawî der barê bûyerên li navçeyê qewimîne de agahî tê dayîn.

Hûn dikarin li ser vê lînkê raporê
vekin.

me bûyerên bi vî rengî çê nebin, divê demokrasîyeke rastîn were sazkinin.

Eger di nava civakê de helwesta demokrasiyê neyê înşakirin û zora jîyana yekperestî bi ser merivan were kirin, mixabin dê tiştên wiha dewam bikin.

Heke civak xwedîyê helwesta bi vî rengî be, her kes karibe bi serbestî fîkr û ramana xwe bibêje, dê çareserî jî pêk were. Heke behsa qawet û pevçûnan were kirin, wekî Amedî dibêjin ku her tişt wê bibe "zumzuka". Wê demê demokrasî ji holê radibe û li cîyê ku demokrasî lê tune be jî jîyana wekhev û azad nabe. Ji vir bi şûn de tiştê herî girîng ku li welatê me divê demildest were kirin sazkinina demokrasîye ye.

Oktay Altekin

2010an de li Zanîngeha Stenbolê, ji beşa rojnamegeriyê destûr girt. Piştî xebatêni li hin rojname û kovaran, li Ozgur Gundemê bû edîtorê nûçeyan.

2016an de li Zanîngeha Okanê di beşa Sînema û Televizyonê de dest bi perwerdehiya masterê kir.

Zana Kibar

Ji Zanîngeha Kocaeliyê beşa rojnamegeriyê destûr girt. Niha li Zanîngeha Mimar Sinan di beşa Sosyolojiyê de master dikê. Li Kovara Amigrayê Berpirsa Karên Nivîsê, li rojnameya Turuncu Kocaeliyê edîtortî kir. Piştire li Ozgur Gundemê jî nûçegihanî û edîtortî kir. Di xebatêni Komeleya Lêkolîn û Zanistên Civakî ya Dut Agaci, Navenda Heqîqet, Edalet û Hafizeyê, Goç-Der de tevlî lêkolînên li meydanan bû. Rêvebira Komeleya Çavdriya Koçberiyê ye.



**Kesên li dijî nefretê jîyan,
evîn û berxwedanê diparêzin**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TRANS - 1

Jîyana transan bi taybetî piştî derbeya leşkerî a 1980yî zêdetir dij-war bû. Kesên ku di bin zexta polîs, medya û dewletê de bûn, pêngava destpêka rêxistinê avêtine.

Michelle Demishevich

Elif Ural

Kesên trans li dijî helwesta malbatbûnê, exlaqê hişk û rolên zayendê ku bi destê merivan hatiye avakirin, her tim bûne perçeyekî civak, çand û dîroka merivayîyê. Heta îro bi vî awayî hebûna xwe jî parastine.

Trans li her devera dinyayê li dijî hişmendîya şaş û nefretê neçar mane ku berxwedana ji bo nasnameya xwe bidin. Bi vî awayî li dijî astengkirina mafê wan ê herî sereke fêrî hêzdarbûn û berxwedêriyê bûne.



Ew her tim hebûn

Hinek ji wan di bin lambeyên dibiriqe de bê xew heta sibê dixebeitin, hinek ji wan bi bedenê xwe yên tazî di bin sîya fantezîyên birçîyan de hewl didin bijîn. Hinek ji wan di nava bîrên bêdawî ên tarî de, li quncikan xwe vedîşerîn. Hinek ji wan li dijî patrîarkaryayê û malbatê çok danîne û xwe di nava jîyanê din de veşartin. Lê belê hinek ji wan li dijî nefretê, jîyan, evîn û berxwedan parastin.

Wekî rengên keskesorê karîbûn bi yekdengî ligel hev bimînin. Di hemû dîrokê de kesên gay, lezbîyen, bîseksuel, trans, intersex, LGBTİ her tim hebûn û wê ji vir bi şûn de jî hebin.

Şert û rêgezên civaka feodal û hişk, di serî de trans, ji hemû kesên xwedîyê nasnameya “queer”ê ne re mafê sereke asteng kir. Ji mafênen hêwirîn, xebat, perwedeyî, tendiristî û jîyanî bêpar hatin hiştin.

Polîs, dewlet û medya

Li Tirkîyeyê piştî derbeya leşkerî a 12yê Rezbera 1980an bi taybetî ji bo transan jîyan zêdetir dijwar bû. Bi vê yekê êdî tundî û êrişen li dijî transan bûbû rûtîneke jîyanâ rojane.

Ne karîbûn wekî her welatîyan bi serbestî derketana derve, ne jî karîbûn li qadeke jîyanâ bi awayekî azad cî bigirtana.

Jinê trans ji ber mafê xebatê li wan hat astengkirin, neçar man ku li ber otobanan kedkarîya seksê bikin. Dema ev yek dikirin, mîr û polîsan li ser rê destdirêjî û tundî li wan dikirin, li qereqolan îşkence li wan dihat kîrin û di medyayê de manşetên wekî “travestîyan dîsa derdor xera kîrin” dihat weşandin. Ji ber van sedeman gelek transan canê xwe ji dest dan.

Her kesî xwe bêdeng kir

Li hemberî kuştina transan sîyasetvan, rojnameger, rewşenbîr, edebîyatvan, şoreşger, jin û mîr ango her kesî xwe bêdeng kir. Ci qasî dem derbas bû, qîrîna transan ew qasî zêdetir bû û bi berxwedana li Kolana Ülkerê bû serhildan.

Ji wê rojê bi şûn de trans êdî ne bêdeng bûn. Wan dîtin ku ji dengekî bi tenê zêdetir hêzdar dibin. Ji bo mafê xwe ê sereke li dijî pergal, tundîya mîran û nefetê fêrî berxwedana rêxistî bûn.

Êdî bi dengekî bilind diqîrîyan: “Li dijî nefretê, her bijî jîyan”, “Jin bi yekîtîyê hêzdar in!”.

Berxwedana hiqûqî a li dijî binpêkirina maf, kuştin û tundîyê hat dayîn, berxwedana transan gihand asteke bilind. Ci qasî ku li daghehan cezayê mîrên tundkar ji ber “halê baş” hatibe kêmkirin jî, êdî trans jî fêrî mafê xwe ê makeqanûnî bûn ku xwe biparêzin.

Hande û Eylül

Di lêpirsînên der barê kuştina transan de hin caran kujer hatin girtin, hin caran jî kujer hatin parastin, ser dosyeyê hat girtin û kîrin faîlê meçhûl.

Wekî girtina dosyeya Eylül Cansın ku xwe ji Pira Boğaziçîyê avêt xwarê. Wekî der barê Hande Yeter ku ew hat şewitandin û bi vî awayî ew kuştin de tu lêpirsînek jî nedan destpêkirin.

Hin caran der barê bûyeran de lêpirsîn bi dawî dibin, doz tê vekirin lê dadger biryarên transfobîk didin. Hin kes û sazî binpêkirina maf bi vî rengî dîkin kampanyaya navneteweyî û car caran encamên baş digirin. Ci qasî ku bi dehan gilî were kîrin û lêpirsîn dest pê bike jî, edalet ji bo transan di bîra bêdawî de ye.



Çîroka sê kesên trans

Em ê di dosyeya “Trans” de çîroka 3 kesên trans bi we bidin naskirin. Yek ji wan li dibistanêñ herî baş perwede bûye û behsa avakirina karîyera xwe dike. Yeke din kedkara seksê ye ku ji ber zextên civakê û tundîya mîran neçar maye ku vî karî bike.

Yeke din jî transeke astengdar e. Bi wî halê xwe li dijî tundî û nefretê têkoşînê dike û dê behsa xwe bike ka bi wî halê xwe çawa di polîtîkayê de cî girtiye.

² Jinê trans û mîrekî trans ku peyameke hevpar didin û dibêjin: “Berî her tiştî mafê merivan û aşitîya civakê”. Em vê dosyeyê dîyarî hemû transên ku ji hêla mîran û dewletê ve hatine qetilkirin, dîkin.



Ece Devrim: Min li dijî kedkariya seksê a bi darê zorê gelekî li ber xwe da

Michelle Demishevich
Elif Ural

NÜÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TRANS - 2

Ece Devrim ji firaqşuştinê heta DJbendîyê hewl daye li gelek cîyan bixebite. Lê belê di dawîyê de ji xwe re tu kar peyda nekiriye. Çi qasî ku li dijî kedkariya seksê li ber x-we dabe jî neçar maye ku wî kari bike.

Ece, di sala 2014yan de li Şişli, Halaskargaziyê, dema ji bo kokoreçê bikire li ber rê diseleine, texsîyek bi bez li wê dixe û ew êdî dibe astengdar.

Bi piştevanîya Partîya Tevgera Karkeran (EHP) û Platforma Li Dijî Qetilkirina Jinan ji Almanyayê kursîyeke bi teker a taybet jê re tê standin. Niha li kolanên Şîşliyê li ser wê kursîya xwe heste, pênûs û desmalan difiroşe ku debara xwe bike.

“Erktoria” platformeke proakatîf e ku li dijî gotin û naverokên zayendperest xebatan dimeşîne. Çend roj berê wan kampanyayek da destpêkirin û têra salekê pereyê kirê ji Ece re hat komkirin.

Ew di 14 salîya xwe de ji Munîhê hatiye Stenbolê. Heta vê rojê çi hatiye serê wê, der barê Ülker Sokak, tecawiz, polîtîka û LGBTIyê de em pê re peyivîn.

Dema me pirsên xwe ji metnê derxistin, me dît ku çîroka Ece Devrîm bi xwe vedibêje derket holê. Me çend serenav kir nav metnê û bi vî awayî em pêşkêşî we dikan:



Ji Munîhê ber bi Stenbolê ve

Ez jinekê trans im û 50 salî me. Ez keça malbateke kedkar ku bi statuya koçberîyê çûne Almanyayê me. Di 14 salîya xwe de dema min bedena xwe nas kir, min dît ku ez ji kesên derdora xwe cudatir im.

Bavê min di nava malbatê de dîktator bû. Wisa bawer dikim ku ji ber wê di min de berxwedêrîyeke li dijî dîktatoran ava bû.

Di nava dema bihûrî de ez bi tercîha zayendî têgihiştîm. Ji ber bavê min ê dîktator û zextên malbata min, ez ji malê veqetîyam. Bavê min ji bo min biguherîne, ez biribûm cem psîkîyatr. Bîjîşk ji bavê min re got ku ev rewşa min naguhere. Wî jî ji bo çareserkirina pirsgirêkê ez şandim Tirkîyeyê, ba xizmên xwe.

3 salan ez li kuçeyan mam. Gelek caran li kuçeyan tecawîzî min kirin. Eger tu trans an kedkara seksê bî, mîr mafê tecawizkirinê di xwe de dibînin.

Bavê min dîktator bû

Ez berê hatim Îzmîrê û li ba xaltîya xwe mam. Ez û kurxaltîyê xwe, em ji xwe re digerîyan. Wî ez dibirim cîyên cuda û dixwest kesayeta min hinekî biguhere. Qaşo dê ez bikirama mîr û ji bo vê yekê ez dibirim pavyonan.

Li Îzmîrê cîyekî bi navê Rota Club hebû. Piranî kesên hevzayend diçûn wir. Rojekê ez birim wir û ji min re got: "Min zanî ku tarza te bi çi rengî ye." Ez behsa salên 1982-84an dikim. Kurxaltîyê min, ez siwarî otobusê kirim ku ez biçim Stenbolê û ji wir jî derbasî Almanyayê bibim.

Ez li Stenbolê bi telefonê, bi bavê xwe re peyivîm û min jê re got ku va ye ez li benda balafirê me û ez ê werim Almanyayê. Di telefonê de dîsa dîktorîya xwe kir, me şer kir û min jê re got: "Ez nayêm."

Ji wê rojê bi vir ve, ez hê jî bi bavê xwe re napeyivim. Bû 35 sal. Ji bo merivayî û xatirê keç û bavtîyê, ez car caran lê gerîyam, lê belê wî bersiv neda min. Herî dawî dema min qeza kir, li min gerîya. Ji min re di telefonê de got: "Ez bavê te me." Min jî jê re got: "Kîjan bavê min".

Min jê pirsî ka bo çi li min gerîyaye. Wî ji min re got ku dê biçe umreyê û dixwaze ez mafê xwe yê li ser wî helal bikim. Min jê re got, "Eger wîcdanê te qebûl dike ku tu vê yekê ji min dixwazî, va ye ez mafê xwe ê li

te helal dikim". Paşê wî ji min re got ku te qeza derbas kiriye, derbasî be.

Ez du salan bi tecawizkarê xwe re jîyam

Dema cara yekemin tecawîzî min kirin, ez 15 salî bûm. Ez wê demê li Stenbolê li kolanan dijîyam. Wê demê Cadeya Îstîklalê ji wesayîtan re jî vekiribû. 3 mîran tecawîzî min kirin û ez bi yekî ji wan re 2 salan jiyam. Ji ber ku wî ez ji kolanan derxistim.

Wê demê nû derbe hatibû kirin. Êdî hûn bînin ber çavêن xwe ka li Tirkîyeyê rewşeke çawa hebû. Niha kenê min bi halê min ê wê demê tê. Ji ber ku min ji neçarî 2 salên xwe bi kesê ku tecawîzî min kiriye re derbas kir. Navê wî Psikopat Bülent bû.

Li kolanan pirtûk difirot. Ji bo min li xwarinxaneyekê karê firaqşuştinê peyda kir. Dewr û dewran derbas bû û êdî ez li kluban wekî Dj xebitîm.

Li gerekola polîsan...

Rojekê dema min li Balık Pazarîyê kokoreç dixwar, min li wir çend jinê trans nas kirin. Jineke trans ku navê wê Canan bû, ez birim Kolana Pürtelaşê. Ez neçar mam ku min dest bi kedkarîya seksê kir. Paşê Midûrê Exlaqê ê Emnîyeta Stenbolê avêt ser mala me, em birin gerekolê û işkenceyê cur bi cur li me hat kirin.



Em dibirin Daristana Belgradê, li me dixistin, tecawîzî me dikirin, tişt miştên me ji me distandin û em bi tazîtî li wir dihiştin û diçûn. Dema em bi wî halî vedegerîyan mala xwe dîsa tecawîzî me dikirin. Piştî ku kolanêن Pürletaş û Ülker ji hev hatin belavkirin, min careke din dest bi DJtîyê kir. Wê demê ez bûm endamê Partîya Azadî û Hevgirtinê (ÖDP) û min dest bi polîtîkayê kir.

Kî dixwaze bedena xwe bifiroşe?

Di nava civakê de jinê trans tenê ji ber kedkarîya seksê têن sûcdarkirin. Lê belê di nava jinê trans de gelek kesên xwendî hene ku naxwazin bedena xwe bifiroşin.

Tu kes naxwaze bedena xwe bifiroşe. Bêyî

biryara meriv dagirkerî li bedena wan tê kirin. Tu jineke trans xeyal nekiriye ku rojekê bibe kedkara seksê.

Pergal tenê kedkarîya seksê li jinê trans rewa dike. Ez tu wextî kedkarîya seksê qebûl nakim. Ji ber ku ev civak bi xwe dixwaze têgihiştineke wiha derxîne holê.

Ez der barê fahîseyên trans, jîgolo û kedkarên seksê de dibêjim: "Ew ji bo pereqezenzkirinê bi darê zorê vî karî dikan." Ji ber ku mafê herî sereke li wan hatiye qedexekirin û di jîyanê de nikarin bîna xwe bidin û bistînin neçar mane ku vî karî bikin.

Herî zêde hişmendîya erkperset piştgirîyê dide kapîtalîzmê. Ji ber vê yekê operayonêن fihûşê herî zêde li dijî jin û

transan têr kirin. Tu carî li dijî mîrên ku kedkarên seksê ne operasyon nayêr kirin. Ji ber ku halê pergalê wiha ye.

Dema li hotelên herî luks fihûşê dîkin, ji bo meran dibêjin zamparatî kiriye.

Min li dijî kedkarîya seksê gelekî li ber xwe da

Ji bo ez bedena xwe nefiroşim, min li dijî pergalê li ber xwe da. Ji firaqşuştinê bigire heta DJtîyê, min gelek kar kirin. Ez çûm kursên İŞ-KURê û ez demekê bûm kedkara tendiristîyê jî.

Berdevka Giştî a Platforma Li Dijî Qetilkirina Jinan Dr. Gülsüm Kav di dersan de alîkarîya min kiribû. Min li Beykozê, li nexweşxaneya ku zarokêni bi sendroma down lê dihatin dermankirin, staja xwe kir. Rêvebirîya nexweşxaneyê ji xebata min gelekî memnûn bû. Ez 5 rojêñ hefteyê dixebeitîm.

Lê belê dema staj qedîya, min nikarîbû ez li wir bixebitîm. Ji bo kar min serî li gelek nexweşxaneyan da. Lê jî ber nasnameya min a transbûnê tu kesî kar neda min.

Mecbûr mam ku ez dîsa kedkarîya seksê bikim. Piştî wê qezaya trafîkê, Partîya Tevgera Kedkaran (EHP) ji min re ev kursîya astengdaran kirî û ez niha hewl didim li kolanan bi firotina pêñûs û desmalan debara xwe bikim.

Pergala dagirkirîyê a herî mezin malbat e

Pergala dagirkir a herî mezin di nava malbatê de ye. Li gorî min xizmtî çîrok e. Pergal ji bo dakirkirîyê piştevanîya malbatbûnê dike.

Gelo çîma dibêjin 3 zarok? Di roja îro de êdî şerîn mezin dest pê kir. Koleyêni ji bo şandina şer pêwist in.

Ji bo dewamkirina pergala kapîtalîst şer pêwist e.

Mixabin ên di şer de jîyana xwe ji dest didin jî, zarokêni gel in.

Ez ne aktîvîsta LGBTîyê me, sîyasetvan im

Di serî de kesîn wekî Demet Demir xwe fedâ kirine. Berdêlîn giran hat dayîn. Lê belê Demet ji ber mafparêzîya LGBTîyan di zindanê de maye.

Tundî bi awayekî cur bi cur di roja îro de jî dewam dike. Ez ne aktîvîsta LGBTîyê me, sîyasetvan im. Ez di wê bawerîyê de me ku divê ji bo mafê hemû gelêñ bindest berxwedan were kirin.

Îro naveroka komeleyêni ku mafparêzîya LGBTîyan dîkin, ji hêla pergalê ve hatiye valakirin. Ên li dijî pergalê ne jî yek bi yek

têr girtin. Medyaya muxalif ku stûyê xwe xwar nake jî tê girtin.

Di navbera salêñ 1980yî û 2017yan de tu cudayî tune ye. Rojnamegerêñ wê demê ji ber zextêñ siyasi nikarîbûn nûçeyêñ der barê qetilkirina transan de çê bikirana. Ji ber ku jinêñ trans ne polîtîze ne û xebatêñ komeleyêñ wan bêkêr e, wekî tevgera jinan nikarin xwe bi rêexistin bikin.

Ji bo hemû gelêñ bindest divê em ji vê dîktatorîyê re bibejin na. Girseyeke mezin ku alîgirê desthilatdarîyê ye jî dê dengê na bidin. Kesîn dibêjin na wekî terorîst îlan dîkin û bi vî awayî xebata referandûmê dîkin. Tirs xistin dilê gel. Dê ruhê Geziyê di referandûmê de xwe bide der. Em bibêjin bila kesîn bindest bibin yek. Ji şer re na, bijî aştî. Careke din dubare bikim ku jî bo dinyayeke azad em bibêjin na.



Şahîka: Meriv nikare paşê bibe trans

Michelle Demishevich
Elif Ural

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TRANS - 3

Şahîka dibêje:

“Hin kes dibêjin ku ji ber li me hatiye tecawîzkirin, em bûne trans. Hismendîyeke ew qasî çewt çawa dibe? Ev yek dema jidayîkbûnê dest pê dike. Meriv nikare paşê bibe trans.”

Şahîka jineke trans e, temenê wê nêzîkî 4oî ye, li Stenbolê, li Beylikdüzüyê dijî û ji bo karibe debara xwe bike, mecbûr e kedkarîya seksê bike.

Şahîka girîngîya rêzgirtina ji bo merivan tîne ziman, behsa tundîya polîsan, erkperstîya medyayê a di salên 9oî de dike. Bi awayekî zelal dibêje ku ji ber hişmendîya hişk û cudakarîya civakê a li ser wan, wê nikarîbûye, ew bibe xwedî karîyer û neçar maye ku dest bi kedkarîya seksê bike.

Piştî hevpeyvîn qedîya, me li strana Sezen Aksu a bi navê Dua guhdarî kir, me hev du hemêz kir û em girîyan.

Dema me pirsên xwe ji metnê derxistin, me dît ku çîroka Şahîka bi xwe vedibêje derket holê. Me çend serenav kir nav metnê û bi vî awayî em pêşkêşî we dikan:

Desthilatdarî bi ser me de nehat

Ji halê me ê îro re jî gelekî şikur ji Xwedê re. Di salên 9oî de dema em siwarî texsîyê dibûn ku biçin klubê, li derdorê polîs hebûna me xwe vedîşart. Ji ber ku dema em didîtin, em binçav dikirin. Me nikarîbû ku em bi serbestî li derive bigerin. Polîsan berdidan me.

Niha ne wisa e. Jinbûn û merivbûna me li holê ye û em zêdetir serbest in. Di dema AKPyê de desthilatdarîyê bela xwe ji me berda û em hinekî rehet bûn. Berî niha porê me jê dikirin û em diavêtin derive.

Çi qasî ku wê demê tundî û işkenceyên mezin li me dihat kirin jî; me li ber xwe da û em xwedî li nasnameya xwe derketin. Eger min jîyana bê nasname qebûl bikira, ez ê biçûma li ber çoka dayîka xwe rûniştama. Me ji bo hebûna xwe gelek berdêl dan.

Hevalên min ên zaroktîyê

Me di serî de malbata xwe, gelek kes winda kirin. Wekî mînak ez 18 salan bi birayê xwe re nepeyivîm. Min car caran dêya xwe didît. Lê belê birayên min, xizmên min, hevalên derdorê piştî 18 salan ez qebûl kirim.

Li gorî civakê helwesta der barê transan de cuda bû. Em wekî jirêderketîyan didîtim. A rast hê jî ev yek dewam dike.

Meriv nikare paşê bibe trans

Hin kes dibêjin ku ji ber li me
hatiye tecawîzkirin, em bûne trans.
Hişmendîyeke ev qasî çewt çawa dibe?

Wekî mînak ew jinêن hatine tecawîzkirin
naçin li kerxaneyê naxebitin. Ev yek dema
jidayîkbûnê dest pê dike. Meriv nikare
paşê bibe trans.

Meriv nikare bixwaze bibe
transseksuelîte.

Transfobî her demê hebû

Ji ber ku berî niha êriş û tundîya mîran
gelekî zêde bû, mixabin me nikarîbû ji bo
xwe plansazîya karîyerê bikin. Em mecbûr
diman ku bibin kedkara seksê.

Wê demê ji Komeleya Mafê Merivan
Parêzer Eren Keskîn, bi rastî jî ji bo
parastina mafê transan gelekî xebitî.
Dema ez li rewşa xwe a îro dinêrim,
dibînim ku em ji berê çêtir in.

Transfobî her demê hebû. Îro jî heye.
Ango him di nava civakê de, him jî di
navâ sazîyên dewletê bi xwe de ev yek
heye. Ji dadgehê bigire heta qereqolan, ji
dibistanan bigire heta nexweşxaneyan...

Ez êdî wekî merivekê difikirim ka ez ji bo
çi hatime dinyayê.

Heta ku tu bibêjî işkence li me hat kirin

Îro wekî welatîyekê mafê min heye. Bi
qanûnêñ dîyarkirî, ez bi welatîyêñ din re
wekhev im. Heta ku tu bibêjî işekenceya
fîzîkî û psîkoljîk li me hat kirin û îro jî
dewam dike.

Wê demê wisa bû. Tundîya ku li ser
transan dihat kirin, li ser jin û mîran jî
dihat kirin. Wê demê krîzîn polîtîk û aborî
zêde bûn. Welatekî bînin ber çavê xwe ku
di serdema 12yê Rezberê de be.

Ez çima hatime dinyayê?

Min gelek caran gotiye ku xwezî ez bi vê
nasnameyê nehatima dinyayê. Lê belê
di serdema niha de ez dibêjim ku xwezî
qet nehatama dinyayê. Şer, wêrankirina
xwezayê, guhertina demsal û ekolojîyê,
qetilkirina jinan, îstîsmarkirina zarokan...

Ez êdî wekî merivekê difikirim ka ez ji bo
çi hatime dinyayê.



Cudayîya tundîyê a li dijî jinêñ trans

Divê meriv tundîya li ser jinan û a li ser
transan neke yek. Jin ji hêla mîrêñ ku herî
nêzî wan in ve rastî tundîyê têñ. Lê belê
li derive mîrêñ ku qet em wan nas nakin,
tundîyê li me dikin.

Sedema vê tundîya hanê jî "transbûn" e.
Qanûna dinyayê bi xwe çewt e. Ev ne ji bo
Tirkîyeyê tenê, li her deverê wiha ye.

Dema em behsa tundîyê bikin, divê
ne tenê Tirkîyeyê bînin ziman. Îro li
her devera dinyayê tundî heye. Li dijî
Cihû, Misilman, Rengreş, jin, zarok û
penaberan...

Em ji bo bibin jin hatine Stenbolê

Cîyê ku kes lê hatiye dinê, perwerdebûn
û çawabûna malbatê siberoja meriv jî
dîyar dike. Mînak şansa min hebû ku ez
li Îzmîrê mezin bûbûm û min perwerdeya
xwe li wir kiribû. Piştî ku min awayekî
eskere nasnameya xwe a transbûnê dîyar
kir, jîyana min a berê ji bo sitarbûna li
Stenbolê gelekî bi kêrî min hat.

Serdema 30 sal berê bînin ber çavêñ
xwe. Hema bibêje ji her devera Tirkîyeyê
gelek trans hatibûn Stenbolê. Hin ji wan
kesan dema hatine Stenbolê hin tiştêñ nû
dîtibûn. Her kes ji bo jînbûnê hat Stenbolê
û mecbûr bûn ku pere qezenc bikirina.

Hinek ji wan li kolanan, hinekê wan li

kluban dest bi xebatê kirin. Baş tê bîra min ku wê demê xwedîyê kluban her kes nedikir ser kar. Min her tim jinêñ baş ji xwe re kir mînak.

Min tu carî xwezîya xwe bi jineke trans neanî. Wekî Marilyn Monroe û Hande Ataizi, her tim xwedîyê stîlekê bûm. Kêfa min dihat ku ez kincêñ rind li xwe bikim. Ji ber ku min ji civakê re rêz digirt, lixwekirina kincêñ xwe jî bi wî awayî dîyar dikir.

Meletî zêdetir, bi ewle ye

Demekê ji ber pirsgirêkên di navbera min û destgirtîyê min de ez çûm Meletîyê. Li gorî Stenbolê meriv zêdetir rehet û ewle dikare li kolanêñ Meletîyê ji xwe re bigere, di nava civakê de bijîn. Şert û rêgezên civakê hene. Divê meriv rêz li vê yekê bigire. Divê meriv terza kincêñ xwe jî li gorî vê yekê dîyar bike. Meriv nikare were kincêñ wekî ên starêñ Oscarê li xwe bike û biçe bazarê. Divê standarta vê yekê hebe.

Ez jî gelekî ji dekolteyê hez dikim. Lê belê vê yekê him ji bo jinan him jî bo meran dibêjim ku nabe meriv bi kincêñ xwe ên şevê derkeve derive. Eger kincê li yekê/xweş nexuyê, bijartina wî/wê şas e.

Mînakeke gelekî baş e. Mafparêza herî mezin Bûlent Ersoy e. Berdêlêñ mezin da. Divê ji vir bi şûn de em jî tiştêñ baş bikin.

Dekolte çalakîyeke me a polîtîk bû

Kêfa min gelekî ji jenerasyona nû a jinêñ trans re tê. Li gorî temenê xwe kincan li xwe dikan. Hin ji wan kincêñ balkêş li xwe dikan, lê hin jinêñ trans hene ku bi kincêñ xwe ê xweşik ji gelek jinan jî bedewtir in.

Me berê kincêñ bi dekolte li xwe dikan û em derdiketin derive. Me bi vî awayî bertek nîşanî tundîya polîsan dida. Dekolteya me serhildan bû.

Ji ber ku niha tundîya wekî a wê demê tune ye, pêwistîya dekolteyê jî tune ye. Tu carî min negot ku ez bi van kincan ne xweşik im. Lê tu carî jî min xwe wekî keseke bi namûs jî nîşan neda.

Ez gerîyam negerîyam, min namûs peyda nekir. Tune ye. :)

Mafparêza herî mezin, Bûlent Ersoy e

Eger îro em dikarin bi nasnameya trans bijîn û dikarin nasnameya jinan li xwe bikin, ev yek bi saya serê wê bûye. Dikare xwe gelekî baş îfade bike û bi malbata Özal re têkilîyêñ xurt çê kiribû. Bi vî awayî rê li ber me vekir.

Mînakeke gelekî baş e. Mafparêza herî mezin Bûlent Ersoy e. Berdêlêñ mezin da. Divê ji vir bi şûn de em jî tiştêñ baş bikin.

Ne hewce ye êdî piştgirîyê bide aktîvîstêñ LGBTîyê. Ji xwe ci ji deste wê hatiye kiriye. Tu kes ne mecbur e, bi zorê kesan di jîyana xwe de bihewîne.

Aktîvîzm kirine qada rantê

Îro aktîvîzma LGBTîyê bûye qada berjewendîyan. Li derdora min, hin heval hene ku ji can û dil dixebeitin. Lê hin komele vê yekê ji bo berjewedîyên xwe bi kar tînin. Ji ber ku li holê tu xebateke baş ku hatibe kirin, tune ye.

Weki mînak mîvanxaneya transan heye û em dibînin ka di rewşeke ci qasî dijwar de hewl didin ku vekirî bimîne. Bi alîkarîyên hatine dayîn, ji bo hin hevalên me bûye cî û war. Xwezî komeleyan alîkarî bidana wir.

Li gorî min divê dewlet wekî mala jinan, ji bo transêñ mexdûr jî cîyekî veke. Her kes dikare bi dilekî rehet alîkarîyan jî bide vir.

Kedkarîya seksê, karek e

Ez ji karê xwe hez dikim û bi vî rengî dixebeitim. Heta meriv ji karê xwe hez neke, nikare bixebite. Heke ev gotina min wekî bêexlaqî were dîtin jî bila were dîtin.

Heke kedkarîya seksê bêexlaqî bûya wê demê dewletê jî ji kerxaneyan bac nedigirt. Dixwazim kedkarêñ seksê ku bi awayekî serbixwe dixebeitin jî bace bidin. Ji ber ku kedkarîya seksê jî karek e.

Tu kes nikare mafê perwerdeyîyê binpê bike

Ez li jenerasyona nû pêşnîyar dikim ku bila perwerdeyîya xwe bidomînin. Bila tu kes mafê perwerdeyîyê binpê neke. Min jî dixwest ez bibim xwedîyê karîyereke baş. Lê ez tırsiyam û min ji xwe re nekir rîsk.

Ez gelekî ji xwarinpijandinê û modayê hez dikim. Min dixwest ku ez ji van her du sektoran di yekê de bixebeitim. Lê belê ji ber erkperestîya medyayê, tundîya mîran, tundîya polîsan û helwesta hişk a civakê me xwe di nava kedkarîya seksê de dît.

Ez tu carî nebûm keseke jîr. Min di hemû jîyana xwe de tenê qezenc kir û xwar. Min gelek caran ji tunebûnê dest pê kiriye. Pereyê ku min qezenc kiriye jî, daye kincêñ bi marqe, çente û pêlavân.

Ferqa navbera Tirkîye û Ewropayê

Di salêñ 90î de ji bo xebatê ez çûm Swîsreyê. Ez bi salan li bajarêñ navdar ên Ewropayê mam. Di navbera Ewropa û Tirkîyeyê de tu cudayî tune ye.

Eger te li vir bibin qereqolê, piştî demekê te berdidin. Lê li wir kesan dersînor dikin. Qanûnê wan jî cuda ne. Mafê merivan zêdetir hatiye fêmkirin. Lê belê wisa cudayîyeke zêde tune ye. Wekî mînak

Ewropayî gelekî ji pereyan hez dikin. Li Swîsreyê ji bo 10 frank pereyê texsîyê digotin biha ye. Gelo em li Stenbolê di rojekê de çend caran siwarî texsîyê dibin.

Medyayê em wekî nebaş nîşan dida

Her meriv û her alî di rastîya xwe de durû ye. Ev yek bi civakê ve girêdayî ye. Berî niha medyayê em wekî nebaş nîşan dida. Cudakarîya niha ji ber wê yekê ye.

Manşetên dûrî aqilan hatin weşandin. Wekî “Travestîyan Derdor Xera Kirin” Lê mebesta wan cuda bû. Ji ber vê yekê emlakgeran xanî nedidan me.

Çavê dildarê min li derive ye

Kesek heye ku 12 sal in ez bi wî re me. Ji demekê bi şûn de evîn bêbandor dibe. Evîn dilhejîyek e. Hin tişt hene ku ji evînê girîngtir in, ev bawerî û jîyana bi hev re ye.

Evîn tiştekî gelekî xweş e. Meriv nûjen dike. Min gelek meriv nas kirin ku hêjayî evîndarîyê bûn lê ji bo xatirê tekilîya xwe, min nexwest. Heta vê rojê qet dengê xwe bi min re bilind nekiriye. En ji têkilîyen dûdirêj hez dikim.

Referandûm

Referandûm tê wê wateyê ku her kes bi awayekî azad îradeya xwe bi kar bîne. Encam ci dibe bila bibe. Divê alîye kêm, li gorî alîye zêde tev bigere. Demokrasî ev e.

Piştî referandûmê encam ci qasî bandorê li welatîyeke derive bike, dê li ser me transan jî ew qasî bike. Ne hewce ye ku em serê xwe biêşînin.

Divê meriv ji serokomarê ku ji hêla gel ve hatiye bijartin re rêz bigire. Piranîya gel wiha xwestiye. Lê belê eger li hemberî nasnameya min neheqî were kirin, ez ê mafê xwe biparêzim.

Demek berê li Amerîkayê jî hilbijartin pêk hat. Min jî wekî jinekê dixwest Hilary Clinton bi ser keve. Ez dixwazim bi gotineke damezirênerê komarê M. Kemal Atatürk peyamekê bidim: “Li welêt jî, li dinyayê jî aştî.”

Divê êdî hemû dinya zanibe ku berî her tiştî em meriv in. Divê li hemberî hemû merivan rêz were girtin. Her tişt bi hezkirinê çê dibe. Ez ji bo hemû merivan aştî û aramîyê dixwazim.



**Emirhan:
Divê berxwedana rêxistinî û
tiştên hatine jîyîn werin
tomarkirin.**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

TRANS - 4

Emirhan Deniz Çelebi, mamosneyê Ingilîzî ye, mîrekî trans e û gelekî pêşketî ye. Ew jî wiha dibêje: "Min her tim xwendekarêن xwe fêri berxwedana li dijî neheqîyê kir. Ez ê kêfxwes bim ku min ji vî alîyi de hinek guhertibin.

Michelle Demishevich

Elif Ural

Min Emirhan di Tîrmeha 2016ê de li Izmir, li Torbaliyê di kampanyaya aktivîzma transan de nas kiribû ku her sal ji hêla Komeleya Pembe Hayat LGBTIyê ve tê lidarxistin. Wekî her kesî çirokeke jîyana wî jî heye. Rastî tundîyê hatibû. Dema ku wî behsa serpêhatîyên xwe kiribû, ez girîyabûm.

Emirhan Deniz Çelebi, mamosteyê Ingilîzî ye, mîrekî trans e û gelek pêşketî ye. Zanîngeha Gazî ya Enqereyê qedandiye. Li Zanîngeha Stenbolê di Fakulteya Ragihandinê û li Zanîngeha Yıldız Teknîkê jî di beşa civaknasîyê de masterê dike.

Li Ewropayê û Amerîkaya Bakur gerîyaye. Endamê Desteya Rêvebiriya SPoD LGBTIyê ye. Ez gelekî kêfxweş im ku min ew nas kiriye.

Regl ji bo min travma bû

Ez di sala 1990î de li Stenbolê hatime dinê. Ji min meztir 3 xwişkên min hene. Rojekê ez û kurxaltîyê xwe, me li derve dilîst. Wî got mîza min tê û li ser piyan mîza xwe kir.

Ez di xwe de fikirîm û min got ku ez çîma nikarim wekî wî bikim. Min ji kurxaltîyê xwe pirsî ka ew çîma li ser pîyan dimîze. Wî got, “çûçikê min heye”.

Ez fikirîm ka eger ê wî çûçik be, ê min ci ye gelo. Dema ez çûm malê min jî hewl da ez li pîyan bimîzim. Lê min xwe şil û pil kir.

Wê demê min got, ê min hê mezin nebûye û heta dibistana navîn, ji min tirê çûçikê min heye û wê rojekê mezin bibe. Lê dema ez regl bûm, ketim travmayê.

Piştî reglê çîçikên min mezin bûn. Ji bo ku mezinbûna çîçikên min xuya nebe, min xwe ji her kesî vedişart û ez bi vî awayî li derve digerîyam. Ez ji çîçikên xwe aciz bûm. Wê demê min zanî ku tiştekî din heye.

Ez êdî dişibîyam xwişkên xwe

Di dema dibistana navîn de jînê muhafazakar dihatin dibistana me. Jînê sergirtî, ji me re behsa reglbûn û paqijîya bedenê dikirin. Xwendekarêن keç û law ne di heman fêrgehê de bûn.

Rojekê wan jinan tiştek ji me pirsîn: “Heta niha derpiyê kesî bi xwîn bûye an na? Ez gelekî matmayî mam. Min got ka behsa penceşêrê dike, ci ye. Ji ber ku heta wê demê dêya min behsa hin tiştan dikir lê min guh nedida wê.

Rojekê dema ez çûm fêrgehê, zarêñ kur jî digotin, “vajînaya we heye û xwîn jê tê. Ez careke din matmayî mam. Her tişt gelekî bi lez diqewimî.

Ti carî helwesta êrişkar a kuran û bêdengbûna zarokêñ keç ji bîra min naçe. Her ku derbas dibû ez dişibîyam xwişkên xwe. Lê belê min fêm kir ku ez ne wekî xwişkên xwe me û kêfa min ji zilaman re nayê.

Eger vajînaya te hebe tu jin î,
rîya te hebe tu mîrî

Malbata min jî xwedî nirxên gelêrî bû. Di cejnê de ji min re binkirasekî zer kirîbûn û dema min li xwe kir, min jê hez nekir. Zavayê me bi vê yekê hesîya û şalekî qehwe ji min re kirîbû.

Ji wê rojê bi şûn de min di hemû ciwantîya xwe de êdî kincên li gorî kêfa xwe li xwe kirin. Rojekê xwişka min jî min re got ku divê ez pirça çîpêñ xwe birûçikînim. Ez gelekî aciz bûm. Ji ber ku pirça di çîpêñ min de, hêvîya min bû. Ji ber ku wê demê hebûna pirçê wekî mîrantîyê hatibû sembolkirin.



Piştî pirça min çû, dema min li çîpêñ xwe nîrî ez dîsa aciz bûm. Min hebûna vajînaya xwe jî red dikir, ji ber ku min nedixwest ez bibînim.

**Min 24 salan derîyê dolabekê
bi ser xwe de kilît kir**

Min her tim xeyal dikir ku ez bibim xwedî bedena mîran. Min 24 salan derîyê dolabekê bi ser xwe de kilît kir. Di lîseyê de hin xort li pey min digerîyan, lê min guh nedida wan.

Rüzgar Erkoçlar ji bo gelek kesan bû pêşêng. Ez gelekî ditirsîyam ku tevî van memikan û vê vajînayê bimirim. Min qet

bi çavêñ jinan li xwe nenêrîbû. Min di dilê xwe de digot ka ez ê çawa ji vî laşî xilas bibim.

Di lêkolînan de derbarê ji mîrbûnê derbasbûna jînbûnê de agahî dihatin dayîn. Li ser ûnternetê agahîyê ku min bidest dixistin piranî bi Ingilîzî bûn. Ji ber vê yekê min biryar da ku ez fêrî Ingilîzî bibim. Min li kafeya ûnternetê bi dizî lêkolîna vê yekê dikir ku cudakarî li min neyê kirin.

Di lîseyê de bi piştgirîya mamosteyê min ê Ingilîzî min beşa mamostetiya Ingilîzî qezenc kir. Wê demê min dikarî tenê bi dersêñ xwe re mijûl bibim. Min xwe di dolaban de vedîşart û ez ji merivan direvîyam.

Îro li dibistanan bi awayekî eşkere êrişî xortêñ trans tê kirin. Di lîseyê de hevaleke min hebû. Cara yekem min têkilî bi wê re danî. Em du sal û nîvan bi hev re man. Wê ez bi mîrekî netrans re xapandim. Min pê re şer kir û ji min re got: " Ji xwe tu yê bi vê bedenê bimirî." Ez mam bi tenê. Paşê min li ser ûnternetê keçek nas kir û bûm evîndarê wê.

Rüzgar Erkoçlar bi hin mîrên trans re têkilî danîbûn. Min jê re gelek peyam şand lê wî bi tu awayî bersiva min neda. Gelo ez wî sûcdar dikim? Na. Xwezî ji nava me jî mîrekî trans ê navdar derketa û wî li ber xwe bida...

Min bi hevala xwe a ku li ser ûnternetê ew nas kiribû re têkilîyê xwe xurt kir û ez êdî dicûm mala wê. Hevala min rojekê ji malbata xwe re behsa hevaltiya me kir. Têkilîya me ne bi dilê malbata wê bû û bertek nîşanî min da.

Ez jî xortekî wêrek bûm wê demê. Ez li dijî malbata wê derketim. Wekî fîlmên Yeşîlçamê, min digot ku ez jê hez dikim. Bê guman di dawîyê de têkilîya di navbera me de qut bû. Ez ji têkilîyê yekşevî hez nakim.

Bi saya serê dildara min a berê...

Bi saya serê dildara min a berê min dest bi jîyanke nû kir. Li Haccettepeyê bû alîkarê destpêkirina pêvajoya veguhesdinê ya transbûna min. Dema ez bi wê re bûm, bûm evîndarê keseke din û me dev ji hev berda.

Piştî zanîngeh xelas bû, min li Ted Kolejiyê dest bi xebatê kir. Ez wekî unisexan dixuyam. Bi pêvajoya terapiya men a li Haccettepeyê re êdî şekl û şemalê min guherîbû. Ji ber vê yekê min biryar da ku ez dev ji vî karî berdim.

Rêvebirîya dibistanê nedixwest ez dev ji kar berdim. Lê derket holê ku ev yek xapînok bû û der barê min de doz dabûn vekirin. Lê min li dijî wan doza tazmînatê venekir û min nexwest li hemberî şermekê, ez şermeke din bikim.



Min xwendekarêن xwe fêrî wî tiştî kir ku li dijî neheqîyê derkevin

Dema min xatir ji xwendekarêن xwe xwest, min ji wan re got ku ez ji bo tedawîya pençeşêrê dev ji kar berdidim. Ji ber ku min derew li wan kiribû paşê ez gelekî aciz bûm. Ji ber ku min gelekî ji wan hez dikir. Xwendekarêن min gelekî jîr bûn. Min xwendekarêن xwe fêrî wî tiştî kir ku li dijî neheqîyê derkevin.

Min ji wan re digot, "Eger midûrê we be jî hûn ê mafê xwe biparêzin." Xwendekarêن min niha amadeyîya zanîngehê dikan. Xwezî bi wê yekê ku min berxwedan hînî kesekî/ê jî kiribe...

Paşê li Zanîngeha Yıldız Teknikê di Beşa Civaknasîyê de min xwendina xwe domand. Min der barê xwe de jî, her tişt ji malbata xwe re gotin. Dêya min ji min re got: "Min 24 salan ji te re got keça min. Ez ê ji vir şûn de bibêjim kurê min".

Malbata min ez qebûl kirim. Tu pirsgirêk çê nebû. Çi pirsên wan hebû, min bi bînfireyî bersiv dayê. Xwişka min rojekê ji min pirsî: "Tu yê biçî leşkeriyê jî?" Min li Zanîngeha Stenbolê di heman beşê de dest bi mastera duyemîn kir.

Em trans şîna xwe jî bi tenê digirin

Min xwest ku ez bi awayekî birêxistî di nava LGBTIyê de cî bigirim. Ji ber ku min

dixwest ez ji bo civakê jî xebatan bikim. Mebesta min ew bû ku ez ji bo mîrê trans tiştekî bikim.

Paşê bûm endamê Komeleya Xebatê Arasteya Zayendî û Nasnameya Zayendî ya Polîtîkayêن Civakî ya Stenbolê (SPoD). Okyanus Efe ku mîrekî trans bû, dema hat kuştin, min êdî zanî ku em şîna xwe jî tenê bi transan re digirin. Paşê min dît ku mîrê trans di tu komeleyê de xwe nadîn der.

Min di destpêkê de li komeleyê karêن biçûk dikirin û paşê wekî endamê rêvebirîya komeleyê hatim bijartin. Cara yekemîn mîrekî trans di rêvebirîya komeleya LGBTIyê de cî digirt. Eger di komeleyan de helwesta transfobîk hebe, divê em xwe jî di ber çavan re derbas bikin.

Wekî mînak ez li wir im. Lê belê bi gelempêrî gelo kesêن trans ci qasî diçin komeleyan? Rêxistina ku niha ez endamê wê me, xebatê der barê qetilkirina transan de dike. Divê tiştên nebaş ku beriya niha pêk hatine li alîyekî bimînîn û bifikirin ka em ji vir bi şûn de dikarin ji bo tevgerê ci bikin.

Li Tirkîyeyê di rêxistinbûna transan de gelekî pirsgirêk hene. Di transan de çanda madîyê (Li gorî ferhenga lûbûniyê:derxistina teşqeleyan/nebaşî) heye. Gelek jînîn trans, mîrê trans wekî "lezbîyenîn mîrane" bi nav dikan.

Haya me jê tune ye lê, em jî car caran wekî tundîya civakê dikan. Ji bo mîrê trans jî beşdarî tevgerê bibin Min di SpoDê de însîyatîf girt.

Em dev ji DAŞê berdin,
ez ê ji we re...

Pirsgirêka me a herî mezîn terapîya hormonê ye. Ji ber ku em naçin ba jînekologan û terapîyeke şaş pêk tînin. Ji bo me divê ji 6 mehan carekê ev terapî pêk bêñ.

Li gorî ku ez dizanim, 712 mîrê trans hene. Ev hejmara kesên di koma me ya facebookê ne ku komeke taybet e. Ez beşdarî civînê navneteweyî dibim û behsa tevgera LGBTI û tundîya li wan tê kirin dikim.

Ez behsa êriş û tundîya li dijî jînîn trans dikim ku kedkarên seksê ne. Di civîneke li Amerîkayê de ji min xwestin ku ez behsa terora li Rojhilata Navîn bikim. Min jî got: "Em dev ji DAŞê berdin. Ez behsa êrişen li Tirkîyeyê bikim ku polîs li dijî transan dikan."

Min behsa îşkenceya ku di qereqolan de li dijî transan tê kirin ji wan re kir. Ü behsa bertêlêñ ku polîs li kolanan ji jînîn trans distîne kir. Ez her demê dibêjim ku ji bo me berxwedana birêxistî pêwist e.

Ez çûme 5-6 welatan. Min li her derê

behsa berxwedana transan kir. Lê dema min behsa berxwedana kolana Ülkerê kir; matmayî man û xemgîn bûn.

Ez guh nadim xala 40emîn

Divê tiştên ku em behsê dikan, tomar bikin. Divê em nûçeyên der barê xwe de çê bikin, fotografan bikişînin. Ji ber ku jenerasyona piştî me, wê pirsa vê yekê ji me bike.

Ne hewce ye ku em di bin banê komeleyekê de xwe birêxistin bikin. Rêxistin bi komên biçûk jî çê dibe. Li dijî mehkûmbûna nasnameyên pembe û şîn divê em hevgirtî bin. Ez guh nadim xala 40emîn a Qanûna Medenî.*

Bi lezgînî ji bo me şêwirmendîya hiqûqî pêwist e. Em hewl didin ku li SpoDê vê yekê bikin. Ji bo têkoşîna birêxistî komele ji bo me pêwist e.

Tirkîye ji 1945an vir ve endamê NYyê ye

Divê em pêşdarazên xwe yên der barê komeleyan de biguherînin. Em dikarin bi dîyalogê vê yekê çareser bikin. Pirtûka Jîyana Pembe 48 rûpel in.

Ji hêla Transgender Europe ve ji bo pêwendîyên trans û Neteweyên Yekbûyî hatiye amadekirin. Min ji Ingilîzî wergerandiye Tirkî.

*Qanûna Medenî ya Tirkîyeyê, madeya 40.:

Kesê dixwaze zayenda xwe biguherîne, dikare serî li dadgehê bide û destûrê bixwaze. Lê belê divê serlêder herî kêm 18 salî be û ne zewicî be û transseksuel be û raporekê ji nexweşxaneya lêkolîn û perwerdeyê bistîne ku tê de bide nîşandan, guhertina zayendî ji bo tenduristiya giyanî zerûrî ye û serlêder bi ti awayî nikare bizê.

Li gorî destûra hatiye dayîn, heke bi rapora fermî were piştrastkirin ku guhertina zayendî bi rîya ameliyata tabî hatiye çêkirin, dadgeh biryarê dide ku di tomarêن nifûsê de ev guhertin bê çêkirin.

Min di pêşgotina pirtûkê de wiha gotibû: "Li Tirkîyeyê transfobî bi piranî piştî sala 1980yî xwe da der. Keseke wê demê ji dayik bûbe hê jî li wan kolanan dijî ku transfobî lê heye. Xuya ye ku hê gelek tiştên neçê hene.

Divê meriv zanibe ka di nava tevgerê de çi heye. Em dikarin li NYyê der barê xebatên pêwist de lêkolînan bikin.

Divê ji vir bi şûn de mafparêziya me di

asta NYyê de be. Çima? Ji ber ku Tirkîye ji sala 1945an bi vir ve endamê NYyê ye. Lê em vê yekê di nasnameya xwe ya mafparêziyê de naynin ziman. Mixabin di qada navneteweyî de xebatên me yên lobîyê tune ne.

Referandûm

Na, na, bê guman na. Ji bo parastina mafê LGBTîyan hezar caran na. Encam çi bibe jî em dev ji berxwedanê bernadin. Hêvî her tim heye...

Divê em bixwînin... Tiştê ku meriv herî dawî xwendiye gelekî bandorê li dil û mejîyê meriv dike. Di wê berxwedanê de divê hêviya me xurt be ku em li dijî kesên dixwazin roja me tarî bikin didin. Divê berxwedana me bi awayakî stratejîk dewam bike. Çi qasî ku bi KHKyân komele yek bi yek werin girtin jî bandora civaka sivîl li ser desthilatdarîyê cuda ye. Dibe ku em encamên keda xwe nebînin. Lê ji bo jenerasyona piştî me, divê em berxwedanê bidomînin. Trans û jin bi hev re xwedî hêz in.

Michelle Demishevich

Rojnameger, aktîvîsta LGBT û mafê mirovan e. Di sala 1995an de dest bi rojnamegeriyê kiriye. Di van demê dawî de li IMC TV û T24ê de xebitî. Niha ji tazgazateyê re dinivîse. Yek ji damezirînera Partiya Siberoja Çep û Keskan de.

Elif Ural

Ji Zanîngeha Egeyê besa ziman û edebiyata Îngîlîziyê destûr girt. Li Kanal Dyê, CNN Turkê û Al Jazeera weke nûçegihan xebitî. Li ser polîtîkayê Tirkîye, Îsraîl û Rojhilata Navîn de pispor e. Niha bi awayekî serbixwe rojnamegerî dike.



**Komeleya Sarmaşıkê hat girtin;
Gelo mexdûr di çî rewşê de ne?**

NÜÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

KOMELEYA SARMAŞIKÊ - 1

*Komeleya Sarmaşikê di 22yê Sermawezâ
2016yan de bi KHKya hejmara 677an hat girtin,
32 hezar meriv ku alikarî ji wan re dihat dayîn
mexdûr bûn.*

Nûrhak Yilmaz

Sertaç Kayar

32 kesên navdar komele damezirand

No	Nav û Paşnav	SAZÎ
1	Osman Baydemir	Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê (Niha Parlementerê Rihayê ê HDPyê ye)
2	Mehmet Şerif Camcı	Şêwirmendê Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê (Niha Serokê Desteya Rêvebirîya Komeleya Sarmaşikê ye)
3	Kutbettin Arzu	Serokê Odeya Pîsesazî û Bazirganîyê (Serdemekê bû parlementerê AKPyê)
4	Raif Türk	Serokê DİSİADÊ
5	Sezgin Tanrıklä	Serokê berê yê Baroya Amedê (Niha Parlementerê Stenbolê ê CHPyê ye)
6	Ahmet Fikret Öcal	Serokê bere ê MÜSİADÊ
7	Şah İsmail Bedirhanoglu	Serokê GÜNSİADÊ
8	Alican Ebedinoğlu	Serokê DESOBÊ
9	Abdul Kadir Akboz	Serokê GÜNGİADÊ
10	Fahrettin Akyıl	Serokê Borseya Bazirganîyê
11	İlhan Diken	Bijîşk- Serokê Odeya Tabîban (wefat kir)
12	Mehmet Selim Ölçer	Bijîşk- Serokê Giştî yê berê yê Yekîtiya Tabîban.
13	Cemal Mercan	Endamê Desteya Rêvebirîya DİSİADÊ
14	Haydar Kılıçoğlu	Dersdar
15	Mehmet Işıktaş	Malnişîn
16	Fuat Hayri Demir	Parêzer- Serokê berê Komeleya Pîr Sultân Abdal ê
17	Ali Akıncı	Serokê berê KMMYê ê Şaxa Amedê
18	Celalettin Birtane	Karsaz
19	Abdulkadir Aydın	Cotkar
20	Ali Öncü	Berdevkê Platforma Demokrasîyê
21	Muharrem Erbey	Serokê berê KMMYê ê Şaxa Amedê ê- niha parêzertiyê dike.
22	Cavit Ceylan	Gerînendeyê Xizmetên Civakî
23	Fahrettin Çağdaş	Sekretêrê berê yê TMMOB İKKYÊ
24	Necdet İpekyüz	Bijîşk-Endamê Desteya Rêvebirîya THİVÊ
25	Mahmut Ortakkaya	Bijîşk
26	Süleyman Gökalp	Şêwirmendê Aborîyê
27	Mehmet Kızıltepe	Serokê Keyayê Başûrê Rojhilat
28	Sait Şanlı	Serokê Odeya Qesaban (Wefat kir.)
29	Ali Rıza Yıldırım	Pisporê Xizmetên Civakî
30	Makbule Altıntaş	Yerel Gündem 21
31	Naşide Buluttekin	Nûnera Koperatîfa Jinê Umut İsligiyê
32	Fuat Kumruaslan	Malnişîn

Komeleya Sarmaşikê 11 sal berê li Amedê hatibû avakirin ku ji bo lêkolîna derbarê kesên rewşa wan a aboriyê nebaş bike.

Lê belê ji ber rewşa nebaş, komele dest bi hevgirtina bi kesên feqîr re dike. Sarmaşik di dawîya sala borî de hat girtin.

Di 22yê Sermaweza 2016yan de bi KHKya hejmara 677an ligel 550 komele, 9 sazîyen medyayê û 19 sazîyen taybet ên tendiristîyê Komeleya Sarmaşikê jî hat girtin.

Yek ji wan komeleyên ku ji ber girtina wê, bertekên tund hatin nîşandan Sarmaşik bû. Ji ber ku piştî komele hat girtin, alîkarîya ji bo 5 hezar û 400 malbatan dihat dayîn qut bû û ew kes niha bi birçîbûnê re rû bi rû ne. Di dosyeya me de xebat û pêkanînê 11 salan ên komeleyê û mexdûrîyetên piştî biryara girtinê hene.

Navê komeleyê ê rast Komeleya Pêşxistina
Herdemî û Li Dijî Xizanîyê a Sarmaşikê ye.

Di Avrêla 2006an de li Amedê
hat damezirandin. Lîsteya lijneya
damezirênerên komeleyê jî “pirreng” bû.

Selahattîn Demîrtaş ku wê demê
hevserokê Partîya Aştî û Demokrasiyê,
Kutbettîn Arzu ku wê demê Serokê Odeya
Pîşesazî û Bazirganîyê bû û demekê bû
parlementerê AKPyê jî, Osman Baydemîr
ku wê demê Şaredarê Bajarê Mezin ê
Amedê bû û niha jî Parlementerê Rihayê
ê HDPyê ye, Sezgin Tanrikulu ku wê
demê Serokê Baroya Amedê bû û niha jî
Parlementerê Stenbolê ê CHPyê ye ji bo
damezirandina komeleyê hatibûn cem
hev.

Lîsteya lijneya damezirêner hat dîyarkirin
ku jî 32 nûnerên sazîyan jî tê de bû
(tablo1) û paşê hin kes ji wan li Tirkîyeyê
navdar bûn. Tiştekî hevpar hebû ku
hemû kesên di lîsteyê de ji Amedê bûn û
dixwastin ku xizanîya li bajêr bi dawî bibe.

Armancê komeleyê wiha hatibûn
rêzkirin:

1- Dê ji bo bidawîbûna xizantîyê xebatan
bike û li ser vê bingehê dibe ku bi sazîyen
neteweyî û navneteweyî re hevkarî were
kirin.

2- Ji bo bidawîbûna xizantîyê armancê ku
di qada navneteweyî de hatine dîyarkirin,

li qada herêmî werin kirin.

3- Divê di serî de desthilatdarî û
rêvebirîyên herêmî, sazîyen sivîl jî di nav
xebatan de cî bigirin û li tevayîya Tirkîyeyê
divê girîngîya bidawîbûna xizantîyê were
vegotin.

4- Pêşxistina hevgirtina civakî were
zêdekirin.

5- Ji bo bidawîbûna xizantîyê pêkanîna
xebatêن pêşxistina herdemî bêن kirin.

6- Ji kesên xizan re alîkarîyên wekî
xwarin, lixwekirin, tenduristî, perwerdeyî,
şewat û hêwirînê werin dayîn.

7- Ji bo bidawîbûna xizantîyê, pêkanîna
projeyên demdirêj bêن çêkirin.

“Nexşeya Xizantîyê” hat çekirin

Mebesta sereke ew e ku jî bo çareseriya
xizantîyê divê were tesbîtkirin ka li ku
dera bajêr xizantî zêde ye. Komeleyê piştî
damezirandinê ji bo tesbîtkirina vî karî, li
qadê dest bi xebatêن lêkolînê kirin. Ji bo
qada lêkolînê jî 5 taxên di nava sînorê 4
navçeyan de hatin bijartin.

Taxên bijartî wiha bûn: Taxa Gürdoğanê
(Yenişehir), Fatihpaşa (Sûr), Huzrevleri û
Peyas (Peyas), Korhat (Rezan).

Li van taxan bi piranî kesên ku di salêن

Hejmara hemû malan	5706
Serjimar	36215
Hejmara jinan	17974
Hejmara mêran	18241
Bi istatîstîkî hejmara kesên di her xanîyekî de	6,3

90î de ji gundêن xwe hatibûn derxistin
hebûn. Li van taxan bi awayekî zelal
dixuya ku gel xizan e û malen tê de jî, ne
zexm in.

45 anketoran xebat û lêkolînê qadê
di sala 2006an de li taxa Gürdoğanê
dan destpêkirin. Xebatêن li 5 taxan di
Reşemîya 2007an de bi dawî bû. Bi 5

hezar û 706 malbatan re hevdîtîn hatin
kirin.

Pêdivîya sereke: “Xwarin”

Di anketê de 45 pirs hebûn. Di pirsan de
rewşa 5 hezar û 706 malbatan di warê
ewleyîya sîgorte, perwerdeyî, tenduristî û
hêwirînê de hat lêkolînkirin.

	Hejmara Xanîyan	%
Xwirek	1743	38,3
Kinc	208	4,5
Kirê	558	12,3
Tenduristî	240	5,3
Ardû	312	6,9
Perwerdeyî	292	6,4
Xwarina rojane	123	2,7
Tiştên malê	189	4,2
Kar	882	19,4
Bi Tevayî	4547	100

Di encamê de gelek agahîyên girîng derketin holê. Ji pirsa “pêdivîya we a sereke çi ye?” re herî zêde bersiva “xwarin”ê hat dayîn. (Tabloya 3) Vê bersiva hatibû dayîn jî ji xwe bi serê xwe her tişt derxistibû holê.

Serokê Desteya Rêvebirîya Komeleya Sarmaşikê Şerîf Camci dibêje ku bi taybetî ev daxwaz ji hêla jinan ve tê kirin.

“Ji ber ku malbat ji ber şer û koçberîya bi darê zorê perce bûbûn, êdî malxwêyê malê jin bûn. Jinan jî ne pere, xwirek dixwestin. Ji hêla din ve dibe ku jinan dixwest ku pereyê were dayîn ji hêla mîran ve li derive neyê xerckirin û ji ber vê yekê xwirek dixwestin.”

Dahatû	Hejmara malan	%	Kumulatif %
Dahatûya wan Tune ye	309	5,4	5,4
1-50 YTL	64	1,1	6,5
51-150 YTL	916	16,1	22,6
151-250 YTL	807	14,1	36,7
251-350 YTL	1 419	24,9	61,6
351-500 YTL	1 258	22	83,6
Zêdetirî 501 YTLyî	933	16,4	100
Tevayî	5 706	100	100

Malbatênu ku qet “dahatûya” wan nîne

Sedema zêdebûna daxwaza xwirekê ew e ku feqîrî pir zêde ye û jîyana di sînorê birçîbûnê de li wan rewa tê dîtin. Di serdema Berfanbara 2006an û Reşemîya 2007an de mûçeya herî kêm li Tirkîyeyê 403.03 TL bû. Lê belê lêkolînan da nîşan da ku (tablo 4) ji sisêyan duduyê malbatan ku bi wan re hevdîtin hatiye kirin, di bin vê mehaneyê de ne û hewl didin bi wî awayî bijîn.

Ji encamên lêkolînê a herî girîng jî ew e ku “tu dahatûyên bi sedan malbatan tune ne”. Di destpêkê de dema encamên lêkolînên li taxên Fatihpaşa û Gürdoğanê derket holê û di medyayê de hat

belavkirin, raya giştî matmayî ma. Mijara malbatênu “qet dahatûya wan tune ye” demeke dirêj di rojevê de ma.

Di wan rojan de TÜİKê jî mesrefên sînorê birçîbûn û xizanbûnê dîyar kir. Di daxuyanîya TÜİKê dayî de wiha hat gotin: “Dahatûya 10 hezar kesan a rojane di bin 1 dolarî re de ye.”

Dîsa di wê demê de nivîsa Nazmi Belge a der barê lêkolîna Sarmaşikê de, di Radikalê de hat weşandin. Di nivîsa bi navê “Were xizanîyê li Amedê bibîne” de helwesta Enqereyê a der barê xizanan û xizantîyê de wiha hatibû rexnekirin:

“Agahîyên TÜİKê ên der barê sînorê birçîbûn û xizanîyê de “bi awayekî istatîstîkî” tê dîyarkirin, ji ber vê yekê gel guhê xwe nade vê yekê. Ji bo dîtina istatîstîkîn dahatûyê ên di navbera xizan û dewlemendan de were dîtin, divê bi kesên “herî li jêr” re rû bi rû bin.

“Em dibêjin; an agahîyên TÜİKê an jî çavên me, me dixapînin. Rastî jî kesên ku li taxên Fatihpaşa û Gürdoğan dijîn di malên yekçavî de û ji her cure sîgorte û mafî bêpar in.

Xeterîya Birçîbûnê “Bankeya Xwirekan” derxist holê

Lêkolîna ku li 5 taxan ji hêla Sarmaşikê ve hat kirin, bi qasî raya giştî xebatkarê

komeleyê jî matmayî hiştibû. Derket holê ku li navenda Amedê eger yek danekî jî alîkarî neyê dayîn, dê xeterya birçîbûnê derkeve holê. Ji ber vê yekê plansazîya komeleyê guherî. Xebatênu li qadê û raporkirin li alîyekî ma û komeleyê “ji bo meriv ji ber birçîbûnê nemirin” dest bi xebatan kir. Bi gotina Serokê Komeleyê Camci: “Xebatkarênu komeleyê encama ku di lêkolînên 2007an de derket holê dan pêşîya xwe û biryar dan ku “Bankeya Xwirekan” were avakirin.”

Pêvajoya hevgirtinê bi vî awayî dest pê kir.

Ev xizanî çawa derket holê?

Yek ji bajarên ku di salên dawîyê de rîjeya kesên bêkar herî zêde hê hene Amed e. Çi qasî ku rastîya agahîyên Sazîya Istatîstîkê a Tirkîyeyê were nîqaşkirin jî, rîjeya xizanî û betalbûnê a heft salên dawîyê, nîşan dide ka bêkarî li Amed û Rihayê di çi astê de ye.

(2010: %13,1, 2011: %8,4, 2012: %12,4, 2013: %17,5, 2014: %17,4, 2015: %17,5, 2016: %17,2)

Rîjeya xizanîyê her ku diçe zêdetir dibe.

Koçberîya salên 90î

Sosyolog Aynur Zengeralp dîyar dike ku sedema sereke a xizanîya li herêmê



koçberîya di salên 90î de ku ji ber şer û pevçûnan pêk hatiye ye û wiha dibêje:

“Bi destpêkirina şerên dijwar re, welatîyên gundan ber bi bajaran ve koç kir. Ka bînin ber çavêن xwe ku bi hezaran gund hatine valakirin. Bi hezaran merivî li gundan sewal xwedî dikirin û hilberîna cur bi cur tiştan dikirin. Vê yekê zîyaneyeke mezin da aborîya welat jî.

“Ango pirsgirêkek dibe sedema pirsgirêka din. Bi piranî koç bajaran tê kirin û kapasite jî ranake. Ev yek jî dibe pirsgirêka perwerdeyî, tendiristî, îstîxdamê

Sal	Serjimar
1980	778 hezar û 150
1990	milyonek û 94 hezar û 996
1997	milyonek û 282 hezar û 678
2000	milyonek û 362 hezar û 708
2007	milyonek û 460 hezar û 714
2008	milyonek û 492 hezar û 828
2009	milyonek û 515 hezar û 011
2010	milyonek û 528 hezar û 958
2011	milyonek û 570 hezar û 943
2012	milyonek û 592 hezar û 167
2013	milyonek û 607 hezar û 437
2014	milyonek û 635 hezar û 048
2015	milyonek û 654 hezar û 196
2016	milyonek û 673 hezar 119

û hwd. Di dawîyê de pirsgirêk wisa dibe ku meriv nikare ji nav derkeve.

Ên li dû hatine hiştin

Zengeralp dibêje ku di salên 1980î de serjimara navend û navçeyên Amedê 700 hezar bûye, lê belê ji salên 2000î bi şûn de ev hejmar gihiştiye milyon û nîvekê.

Li gorî agahîyên Sarmaşıkê “Ji ber koçberîya bi darê zorê serjimara Amedê di nava 20 salan de ji 350 hezarî bûye zêdetirî milyonekê.”

Li gorî lêkolîna Enstîtuya Etutêن Serjimarê a Zanîngeha Hacettepeyê ku di sala 2006an de hatiye kirin, %96ê kesên ku bi zorê koçber bûne malên xwe, %93yê wan zevîyên xwe, %97ê wan bax û baxçeyên xwe, %96ê wan hacetên xwe ên hilberînê, %83yê wan jî sewalên xwe hiştin û koç kirin.”

Ango kesên koçî bajaran kirin, hemû debara xwe jî li dû xwe hiştin.

Ji bo çareserîyê divê pirsgirêka sereke ji holê were rakirin

Sosyolog Aynur Zengeralp dibêje kesên ku koçî Amedê kirine, ji ber xizanî û tunebûna kar ji vir jî careke din koç dîkin û diçin metropolên rojava.

“Bi vî awayî koçkirina kesên xizan dewam dike. Di vê pêvajoyê de tiştê ku qet naguhere ew e ku hemû desthilatdarî başkirina rewşa wan kesan dîkin mijara sîyaseta xwe. Ji vê yekê re dibêjin “politikaya destvekirinê.”

“Ji bo çareserîya vê pirsgirêka mezin divê pirsgirêka sereke were çareserkirin. Divê şer û pevçûn bi dawî bibe. Eger wiha nebe, projeyên aborîyê li herêmê tenê bi kêrî çîna navendî tê. Ango ên dewlemend dê dewlemendtir bibin û ên xizan jî dê di halê xwe de bimînin”



Bankeyeke alternatif: Bankeya Xwirekan a Sarmaşikê

Nûrhak Yilmaz
Sertaç Kayar

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

KOMELEYA SARMAŞIKÊ - 2

*Komeleya Sarmaşikê ji destpêkê ve bi piştgiriya
hin sazî û kesên xêrxwaz xebatên xwe pêk anî.
Di demeke kurt de bû modeleke ji bo bidawîkirina
xizanîyê.*



Komeleya Pêşxistina Herdemî û Li Dijî Xizanîyê a Sarmaşikê birtyar da ku “bankeya xwirekan” were avakirin. Lê belê wê demê 30 hezar merivî ji komeleyê pêdivîyên xwe digirt û hejmara wan kesan her ku diçû zêdetir dibû. Ji bo ku her mehê alîkarî li deh hezaran merivî were belavkirin divê koordînasyona hevgirtinê bihata avakirin.

Di destpêkê de gelek derdoran piştgirî da komeleyê û ev yek jî ji bo avakirina bankeya xwirekan gelekî girîng bû. Di pêngava destpêkê de Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê, Odeya Pîşesazî û Bazirganîyê a Amedê, Şaredarîya Sûrê, Odeya Tabîban a Amedê, Baroya Amedê û Komeleya Karsaz û Pîşesazan jî tê de 32 pêkhateyên Platforma Demokrasiyê a Amedê di nava xwe de protokolek îmze kir. Di vê protokolê de hin sendîqe, sazîyen malbatên girtî û komeleyên koçberîyê jî hebûn.

Mebesta protokolê ew bû ku bi derfetên kêm be jî her meh piştgirîyê bidin bankeya xwirekan. Sendîqe û ode dê endamên xwe, sazîyen din jî dê alîgirên xwe teşwîqî vê yekê bikirina.

Kesên alîkarî dan her ku çû zêde bûn

Bankeya xwirekan di 15yê Gulana 2007an de dest bi belavkirinê kir. Di destpêkê de li 3 hezar û 600 malbatan alîkarî dihat belavkirin. Lê belê piştî demeke kurt hejmara malbatan derket 5 hezar û 400î. Anglo hejmara kesên ku ji komeleyê alîkarî distandin gihişt 32 hezaran.

Li gorî agahîyên Serokê Komeleyê Şerif Camci da, kesên ku piştgirî dane komeleyê her ku çûye zêde bûne. Êdî kesên ku bi awayekî serbixwe alîkarî didan ji endamên

sazîyen ku protokol îmze kiribûn zêdetir bûn û gihişt 9 hezaran.

Di nava wan kesan de dergevanekî ku 10 salan her meh 20 TL dida jî hebû, kargeheke ku her meh hinek ji kara xwe alîkarî da jî hebû. Lê belê Camci dibêje ku ji sala 2014yan bi şûn de ji ber “zêdebûna zextan û pirsgirêkên civakî ên din” hejmara kesên alîkarî didan kêm bû û daket 5 hezar û 800.

Girseyeke nû derketibû holê ku piştî şerê li Sûrîyê û pevçûnên li Tirkîyeyê di nava mexdûrbûneke mezin de bûn. Kesên ku bi salan e

piştgirî didan Sarmaşikê, êdî ji bo wan medûrên nû jî bûn alîkar. Lê belê vê yekê alîkarîyêng jî bo bankeya xwirekan kêm nekirin.

Li gorî istatîstîkan her sal 2 milyon û 400 hezar TL alîkarî ji komeleyê re dihat. Ji %86ê van alîkarîyan li kesên xizan hat belavkirin.

Kesên ji bo standina alîkariyê dihatin bankeya xwirekan, karîbûn bi awayekî dewamî 15 cure xwirek, kevnikê zarokan û kevnikê nexweşan bibirana.

Kesên cerdevan jî, AKPyî jî alîkarî ji Sarmaşikê standin

Girseyâ ku Sarmaşikê alîkarî dida wan jî, girseyâ ku piştgirî dida komeleyê jî ne li gorî rêzê bû.

Kalepîrênu ku êdî nikarin di mekanizmaya hilberînê de cî bigirin, kesên astengdar, jinêng jî hevserên xwe qetîyane û ên hevserê wan miriye, nexweşen bi dewamî tedawî dîbin, malbatênu ku nikarîbûn debara xwe bikin jî komeleyê alîkarî distand.

Serîf Camci dibêje: "Me helwesta sîyasî a kesên ku serî li komeleyê didan meraq nedikir. Me ji wan pirs nedikir ka dengê xwe dane kîjan partîye." Ji bankeya

xwirekan kesên cerdevan jî, AKPyî jî, HDPPYî jî bi salan alîkarî standin.

Projeyêng jî bo jin û zarokan

Piştî projeyêng nexseya kesên xizan û bankeya xwirekan kêmâyî û pêdivîyên nû hatin tesbîtkirin. Paşê projeyêng nû ketin rojeva wan:

Ji Bo Zarokan Programa Piştgirîya Perwerdeyîyê

Bi vê projeyê hat xwestin ku jî zarokên dicin dibistanê, ên nikarin biçin û ên li gel dibistanê dixebeitin jî re piştgirîya perwerdeyîyê were dayîn ku rewşa wan baştıri bibe. 120 zarokî jî vê projeye feyde girtin.

Projeya Tendiristîyê Ji Bo Jinan (pîlot)

Bi vê projeyê hat xwestin ku zanîna hijyenê pêk were, bi jin û keçen ciwan re parvekirina agahîyêng jî bo parastina tendiristîyê par ve bikin, jî bo bikaranîna xizmetên tendiristîyê bêng teşwîqkirin û di çarçoveya projeyê de tiştên paqijkirinê li malbatan belav bikin.

Proje ji bo salekê pêk hat. 105 jinêng jî bankeya xwirekan alîkarî distandin ji vê projeyê feyde girtin.

Projeya Îstîxdama Bi Teknolojîyên Gaza Xwezayî

Ev proje jî di çarçoveya pêşketina aborî de hatibû dîyarkirin. Ev yek ji bo du girseyan hatibû dîyarkirin.

Girseyâ yekemîn; ew kesên ku hinekî jî kar fêm dîkin lê sertîfîkayêng wan tune ne.

Girseyâ duyemîn jî endamên malbatênu ku serî li Benkeya Xwirekan a Sarmaşikê dane ne.

Temenê wan di navbera 18-35an de ne. Di çarçoveya projeyê de bi giştî 300 saet perwerdeyî hat dayîn.

"Modela Sarmaşikê" bal kişand

Xebatênu komeleyê ji demekê bi şûn de êdî him li welêt û him jî di qada navneteweyî de deng veda. "Tecrubeya Sarmaşikê" di gelek civînêng li welêt û derveyî welêt de hat rojevê.

Sempozyuma Xizanîya Navneteweyî (2010-Stenbol), Sempozyuma Rêvebirî û Pêşketina Herêmî a 4. (2009-Enqere), Konferansa Weqfa Etudênu Aborî û Civakî a Tirkîyeyê (2008), Konferansa Weqfa Sektora Sêyem a Tirkîyeyê û Konferansa Mafê Merivan a Stenbolê hin ji wan civînan e ku Sarmaşikê di rojeva wan de cî girtiye.



Çi qasî ku komele “mînaka modela hevgirtinê” bû jî, der barê xebatê wan de gelek lêpirsîn hatin destpêkirin.

Kontrolkirina yekemîn di 11-24ê Pûşpera 2009an de ji hêla mufetîşen Wezareta Navxweyî ve hat kîrin. Hemû ewraqên komeleyê 14 rojan hat lêkolînkîrin.

Li gorî wan, armanca kontrolan ew bû ku “ka komele li gorî mebesta xwe a di rîziknameyê de tev digere an na.”

Li gorî rapora ku mufetîşan amade kîrin, der barê xebat û çalakîyên komeleyê de tu kêmayî nehatin dîtin.

Komeleya ku alîkarî da mexdûrên erdhejê, kîrin hedef

Piştî erdheja ku di sala 2011yan de li Wanê çê bû, Sarmaşık li ser medyaya civakî bû hedefa komên nijadperest. Di twitterê de parvekirinê bi etîketa “sarmasikderneginebagisyok” (alîkarî neşînin ji Sarmaşîkê re) di rêza yekem de cî girt.

Çi qasî ku berî salekê hemî xebat û pêkanînên komeleyê hatibin kontrolkirin jî, ji ber êriş û hedefnîşandanê Walîtîya Amedê du mehan dest danî ser hemû hesabêñ bankeyê ê komeleyê.



Ji bo vê yekê jî walîtîyê di hinceta xwe de dîyar kir ku “alîkarîya ji bo mexdûrên erdhejê, ne li gorî mebesta komeleyê ye.” Li ser îtîraza komeleyê, biryara blokekirina hesabêñ bankeyê hat rakirin. Lê ji ber vê yekê, sê caran cezayê pereyan li komeleyê hat birin.

Der barê Komeleya Sarmaşîkê de vê carê sala 2012yan jî di çarçoveya “Doza Sereke a KCKyê” de lêpirsîn hat vekirin. Her wiha rîvebirîn komeleyê çûn der barê lêpirsînê de îfade dan. Lê belê bêyî ku doz were vekirin, dosye ji ber nebûna tu delîlan hat girtin.

Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê hevparê projeyan bû û di heman demê de peywirdarêن Sayıştayê û Wezareta Karê

Navxweyî der barê hesabêñ şaredarîyê de lêpirsîn dan destpêkirin.

Di encama lêpirsînê de rapor hat amadekirin û hat gotin ku şaredarîyê “dijhiqûqî” di navbera salên 2008-2009an de alîkarî daye Komeleya Sarmaşîkê.

Mufetîşan protokala di navbera Sarmaşîk û şaredarîyê de nedîtin ji xwe. 900 hezar TLyê ku wekî alîkarî ji komeleyê re hatibû şandin, ji şaredarê wê demê Osman Baydemir û kesên ku îmzeyên wan di bin peredayînê de hebûn, hat xwestin.

Her wiha Wezareta Karê Navxweyî destûr da ku der barê Şaredar Osman Baydemir û endamên şaredarîyê de lêpirsîn dest pê bike. Şaredarîyê der barê wê biryarê de li



Danıştayê îtiraz kir lê, Danıştayê îtiraz red kir û birtyar şand ji Serdozgerîya Amedê re.

Şaredarî neçar ma ku 900 hezar TLyê dabû komeleyê ji wan bistîne. Komeleyê li ser vê yekê daxuyanî da ku wê deynê xwe wekî 6 teksîtan bide û ji bo vê yekê jî banga piştevanîyê kir.

Lê tê zanîn ku ji bo alîkarîdayîn û xebatêni wiha, pişkek ji şaredarîyan re hatiye dîyarkirin. Li hemberî vê yekê jî şaredarî neçar ma ku pereyê ji Sarmaşikê re sandiye, ji wan bixwaze.

Paşê şaredarîyê pêdivîyên sereke tesbit kir û ew pêdivî bi xwe standin. Bi awayekî hevparêن wan ev pêdivî gihadin destê

malbatêñ xizan. Heta tayînkirina qeyûm, şaredarîyê hevgirtina bi kesêñ xizan re wiha dewam kir. Piştî qeyûm ev yek dan sekinandin.

Der barê kesêñ ku bi dilxwazî ji komeleyê re dixebeitin jî, lêpirsîn hat vekirin. Rojnameger Evrim Alataş ku di sala 2012yan de wefat kiribû jî, gazî ïfadedayînê kirin. Yek ji dilxwazêñ komeleyê nivîskar Müge Tuzcuoğlu jî, hatibû binçavkirin.

Di tu raporêñ der barê komeleyê de hatibû amadekirin de tu tiştekî nebaş nehatibû gotin. Heta mufetîşekî ji wan digot ku eger xebateke wiha li bajêrekî dinbihata kirin, teqez dê hêjayî xelatê bihata dîtin.

Nûrhak Yılmaz

Ji Zanîngeha Stenbolê, ji beşa rojnamegeriyê destûr girt. Li rojnameya Demokrasiyê dest bi rojnamegeriyê kir. Ulkede Gundem, 2000'de Yeni Gundem, Ajansa Nûçeyan a Dicleyê û Azadî TVyê xebitî. Hêjî bi awayekî serbixwe rojnamegerî dike.

Sertaç Kayar

Sertaç Kayar dema li Zanîngeha 18 Mart ya Çeneqale beşa Diroka Hûnerê diwend û dev jî zanîngeh berda û di sala 2005an de dest bi rojnamegeriyê kir. Di sala 2006an de li Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DİHA), dest bi rojnamevaniyê kir. Li gelek bajarêñ rojhilatê Tirkiyê û bajarêñ kurdan ji bo medyaya neteweyê û navneteweyê kar kiriye. Li saziyên weke Gali Kurdistan, Xendan, Hurbakis.net, Azadî TV, rojnameya Diyarbakır Ozgur Habero, Diyarbakır Yenigun Gazetesi, Reuters (serbixwe) û Sputnik xebitî.



Jî bo Stenbola modern projeya bi xemla dîrokî: Balat

Ecem Engin
Şenay Öztürk

NÜÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

BALAT

*Bajarokê Balatê ku di dîrokê de li wir gelek şewat
çê bûne, bi fabriqeyên kevn, keştiyên stûnsikestî û
bi pisikên kulek tê zanîn.*

Taxa Cihûyan a berê Balat li peravê Haliçê, li ber deryaya Bîzansê dirêj dibe û diçe. Kesên Roman herî dawî xwe sipartine wir. Li wê deverê ev 15 sal in hewldana modernkirinê tê kirin û ev pêvajo di asta sêyemîn de dewam dike.

Pêvajoya yekemîn di salên 2000î dest pê kir. Proje bi hevkarîya Şaredarîya Fatihê û Yekîtiya Ewropayê, bi mebesta zexmkirin, parastin û rehabîlîtekirinê dest pê kir. Di asta duyemîn de di dewsa projeya yekemîn de Projeya Nûkîrina Fener û Balatayê ket pratîkê. Bi vî awayî êdî xebatêñ restorasyonê ku bi hevkarîya Şaredarîya Fatihê û Yekîtiya Ewropayê pêk dihat bi dawî bû di dewsa wê de, bi hevkarîya dewlet û sektora taybet, xebatêñ nûkîrinê dest pê kir. Balat di sala 2006an de bi qanûna 5366an a Restorekirin û Nûkîrina Berhemên Çandî û Dîrokî wekî devera nûkîrinê hat ragihandin.

Di sala 2007an de îhaleya pêkanîna projeyê dan GAP İnşaatê ku girêdayî Çalik Holdingê ye. Li ser nerazîbûna civakê pêkanîna projeyê dan sekinandin. Lê belê îro di asta dawîyê de dewam dike. Piştî sermayeya taybet ket nav Balatê îro guhertinek li herêmê tê kirin.



Kesên ku bi dehan sal in li Balatê dijîn, nikarin li gorî pêkanînên polîtîkayêñ neolîberal tev bigerin û dewlemend bibin. Ji ber vê yekê, nikarin adapteyî reng û jîyana nû a bajêr bibin û neçar têñ hiştin ku bi rîyêñ ne qanûnî pereyan qezenc bikin.

Şopêñ dîrokî bi destûra biryarêñ avayîsazîyê bi boyaxêñ nû têñ tunekirin. Gelê Balatê di vî reng û vê jîyana nû de nikare pilansazîya pêşeroja xwe bike.

Îro dema hûn biçin kolaneke Balatê, hûn ê bi teqez otêlekê bibînin. Her ku diçe li devera ku çanda kevneşopî lê heye, kafeyêñ ku fîncanek qehweyê bi 10 TLyan difiroşin, zêdetir dibin. Fener û Balat niha ji bo sermayedarêñ navxweyî û navneteweyî gelekî populer in.

Çi qasî ku bi projeya veguherandina bajêr re “ronakkirina” civakî pêk nehatibe jî, ev yek niha bi dînamîkên aborî û civakî, bi awayekî xwezayî pêk tê. Her ku diçe gel zêdetir xizan dibe û bi bêdengî bajarokê terk dikin.

Hunermenda karên camê Yasemin Aslan Bakiri, li Camxaneyê ku berî niha maleke Rûman bûye û bi beşdarbûna Şaredarê Bajarê Mezin ê Stenbolê Kadir Topbaş ve hatiye restorekirin, xebatên xwe didomîne.

Derîyê wan ji her kesî re, bi taybetî ji gelê Balatê re vekiriye. Lê belê ew dibêje ku ev huner bala gelê Balatê nakişîne.

“Kafeyên nû ne mayînde ne”

Camxane, li Balatê yek ji cîyên ku bi serkeftî hatiye restorekirin e. Li vê derê her tişt li gorî halê xwe yê wê demê hatiye venûkirin. Yasemîn Aslan Bakiri jî, ji bo



Destdanîna bi lezgînî ci ye?

Destdanîna Bi Lezgînî di qanûna 2942yan de cî digire.

Destdanîna bi vî rengî bi biryara Desteya Wezîran an jî di bûyerên taybet de pêk tê.

Di vê pêkanînê de prosedurên destdanînê bi lezgînî bi cî tê.

Bi vî awayî hemû prosedur piştî destdanînê pêk tê, li ser rapora kesên di mijarê de pirspor in ve ev yek tê kirin.

domandina ruhê Camxaneyê, berhemên xwe bi motîfên Osmanî dixemilîne.

Yasemîn Aslan Bakiri, ji hejmara kafeyên ku di salên dawî de hatine vekirin, aciz e. Bakiri der barê mijarê de dibêje: “Kî radibe, wekî li Tünel û Galatayê kafeyekê vedike. Lê belê ew kafeyên demkî ne, îro hene lê dê sibê tune bin. Li her derê dikanên antîkayan vebûne. Lê ew dikan, êdî bûne bit pazarı (bazara kel û pelên rojane ên kevn). Tiştên wiha derbeyê li avayîyan dixin. Ez xemgîn dibim. Tiştên wiha li Galatayê jî hat kirin û ruhê avayîyan xera kirin.”

Bakiri dibêje ku yek ji sedema ranta li Balatê “gelê nezan” e. Kesên milkên xwe radestî sermayedaran dikan, tenê li ser aborîyê difikirin û taybetîya avayîyê nabînin. Bakiri wiha dibêje: “Ji bo bidestxistina tiştên biçük, nabe meriv berhem û devera dîrokî feda bike. Divê meriv xatirê kevirên ku ruhê dîrokê pê re ye, zanibe. Wan bi wê taybetîya wan biparêze. Divê meriv çanda taxê biparêze.”

Bajarakê ku ketiye ber pêla koça ref bi ref

Ji bo hewldana ronakkirina li Balatê baş were fêmkirin, divê dîroka navçeyê bi kurtayî were zanîn. Ji berî Osmanîyan, heta piştî avakirina komara Tirkîyeyê

li bajarok gelek kêmnetew, bi taybetî jî welatîyên Cihû dijîyan. Piştî bûyerên 6-7ê Rezberê û Operasyona Qibrisê kêmnetewên wir pêl bi pêl ji bajarok derketin. Ji ber ku bajarok nêzîkî deverên kar e, berî 10 salan jî, kesên ji bajarê xwe koçî bajarê mezin dikirin, dihatin vir. Di salên dawîyê de hunermendên li pê cîyên nû ne û ciwanên di warê xebatê de pêngava yekemîn diavêjin, li wir bi cî dibin.

Berî Osmanîyan li devera Fener û Balatê gelên Rûm û Cihû hebûn û di dema Osmanîyan de jî ew dîsa li wir dijîyan. Piştî sedsala 19. ji ber bazirganîya li devera Xelîcê kêm bû û gelek şewat derketin, nirxê Balatê li ber çavan hinekî kêm bû.

Di salên 1930î de plansazîgerê bajêr Henry Prostî ê Fransî hewl da ku wir bike devera endustriyê. Piştî fabrîqeyên dewletê û imaretxane li wir hatin avakirin, rengê Balatê hinekî guherî.

Di koşkê li devê deryayê ku ên welatîyên Rûman bûn de, atolye û kargeh hatin avakirin. Vê yekê bandor li ser rewşa civakê jî kir û bi taybetî piştî bûyerên 6 û 7ê Rezberê Rûm û Cihûyan cî û warê xwe ê bi sedan salan hiştin û çûn. Piştî li Balatê endustrî hat avakirin, kêmayîya xebatkaran derket holê. Kedkarê ji Anatolyayê hatibûn, li malên Yewnan û



Cihûyên welat terk kirine, hatin bicîkirin. Bi vî awayî li Balatê di dewsa kêmnetewan de kesên bi erzanî kar dikin bi cî bûn û pêkhateyên civakê guherîn.

Di sala 1985an de hewldana ji bo paqirkirina Xêlîcê dest pê kir û di heman demê de welatîyên ji herêma rojhilat û başûr-rojhilat koç dikirin, dihatin li deverên Fener û Balatê bi cî dibûn. Welatîyên ku bi darê zorê koç kiribûn, êdî tu warê wan nemabû ku vejerin û ji xwe re li vir jî kar peyda nekiribûn ku bixebitin.

Sedema hatina wan a Balatê, nêzîkbûna deverên kar û kirêya erzan bû. Piştî koçkirina wê demê, civaka Balatê a niha, kêm zêde derket holê.

Projeya YEyê di nîvî de ma

Li Balatê derdor û devê behrê hat paqirkirin û kargehêن endustrîyê jî, ji nav bajarok hatin derxistin.

Nîvgirava dîrokî piştî di 1985an de ji hêla UNESCOyê ve di Lîsteya Mîrateya Çanda Dinyayê de hat nîşandan, nirxê deverê zêde bû. Di Lütkeya Habîtatê ku di 1996an de li Stenbolê hat lidarxistin de, rehabîlîtekirina Fener, Balat û Ayvansarayê hat rojevê. Lê belê pêkanîna projeyê di 2003yan de dest pê kir.

Yekîtiya Ewropayê ji bo restorasyon û rehabîlîtekirina herêmê 7 milyon Euro hibeyî Tirkîyeyê kir. Di dema restorasyonê de gel ji cî û warê xwe nehat derxistin û ji gel tu pereyê lêçûnê jî nehat xwestin.

Bi ser de jî li gorî peymana ku YEyê bi xwedîyên milkên wir re danîbû, piştî restorasyonê heta 5 salan tu kes nikare milkên xwe bifiroşe an kirêdarên wir ji cî derxe. Ji ber lêçûnê restorasyonê ji a hatibû hesabkirin zêde derket, Şaredarîya Fatihê karîbû tenê 35 avayîya bi giştî restore bike. 121 avayî jî, tenê bi awakî di ser re derdora wan hatin çêkirin.

Di sala 2006an de qanûna 5366an a Nûkirin û Restorekirina Berhem û Derdorê Dîrokî wekî hincet hat nîşandan û Projeya Fener, Balat û Ayvansarayê hat ragihandin. Di 2007an de ji bo îhaleya pêkanîna projeyê dan GAP İnşaata ku girêdayî Çalik Holdînga ku ji Projeya

Tarlabâsiyê dihat naskirin. Bi vî awayî peymana ku bi NYyê re hatiye danîn, bêyî agahdarkirin û pirskirina ji gel hat betalkirin.

Di malpera fermî a GAP İnşaâtê de agahî û mebesta projeyê bi vî awayî hatibû vegotin:

“Devera ku dê were nûkirin, 59 avayî, 909 parselên ji ber sûran (Kolanê Ayvansaray û Mürselpaşa) dest pê dike û heta Xelîcê diçe. Ev never li ser destê sûran herî zêde 79.345 m² ye. Mebesta sereke a projeyê ew e ku derdor ji alîyê fîzîkî ve were nûkirin û zêdekirina kapasîteya civakê ye. Tê xwestin ku kalîteya bikaranîna devera



devê deryayê jî zêdetir bibe.

Bi vê projeyê hewl tê dayîn ku cî û warên heyî were nûkirin û bi avayî jîyana li devê deryayê a nû xweş û dewlemendtir bibe. Bi vê projeyê him tê xwestin ku cîyên dîrokî were parastin, restorekîn û restutîsyona wan were kirin û her wiha li gel vê jî avayîyên nûjen jî werin avakîn, da ku li herêmê jîyana şev û rojê li gel hev baştır bibe.

(Çavkanî: Neoliberal Kent Politikaları ve Fener-Balat-Ayvansaray, r. 93, Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, www.gapinsaat.com/KDBalat.aspx; Gelawêj 2014)

Biryarêñ betalkirinê, kirina malê dewletê û di dawîyê de serkeftin

Di Berfanbara 2009an de Projeya Avan a Nûkirina Fener, Balat û Ayvansarayê li meclîsa Şaredarîya Fatihê hat qebûlkirin. Piştî wê biryarê, gelê li herêmê dijîn bûn yek û Komeleya Parastina Mîrateya Çanda Balat û Fenerê (FEBAY-DER) damezirandin û ji bo betalkirina biryara şaredarîyê, îtirazî daghehê kîrin.

Hewldana gel serkeftî bû û daghehê di sala 2012yan de biryar da ku proje were betalkirin. Çi qasî ku biryara betalkirinê hate dayîn jî Lijneya Wezîran biryarekê nû da Fener-Balat-Ayvansarayê bi lezgînî kir malê dewletê.

FEBAY-DERê dev ji dozê berneda û di sala 2013yan de pêkanîna projeyê bi biryara daghehê dan sekinandin. Di meha Rezberê de jî Dadgeha Şêwirmendîyê biryara kirina malê dewletê betal kir.

Di sala 2014yan de Dadgeha Îdareyê a Stenbolê a 1. plana avayîsazîyê ku projeya Fener-Balat-Ayvansarayê jî di nav de bû, bi giştî betal kir û doz bi vî rengî bi dawî bû. Gelê Balatê li hemberî xetereya hilweşandina taxê êdî rehet bûn. Lê belê tiştî ku bi guhertina bajêr re pêk nehat, niha bi guhertina civakê re pêk tê.

Tûrîzma xerckirinê

Berdevkê FEBAY-DERê Alkr. Doç. Dr, Çiğdem Şahin anî ziman ku qurbanîyên cara yekem ên guhartina bajêr ew in û wiha got: Mixabin dema dor hat ser me, hem pêvajo nedîyar bû hem jî me rîbazên berxwedanê baş nizanîbû. Lê niha her kes her tiştî dizane.

Çiğdem Şahin dibêje ku li Stenbolê ji bilî Fener û Balatê tu cî nemaye ku guhertin nehatiye kîrin û ji bo rant û berjewendîyên ferdî, çavê dewlet û sermayedaran li ser vir e.

Şahîn anî ziman ku di guhertinê avayîyan û ên civakî de, dîrokîbûna bajêr li ber çavan nayê girtin û tûrîzm ne li ser rastîyan, li ser dekoren nû tê meşandin.



Şahin wiha dibêje:

“Behsa tûrîzmeke li ser çanda xerckirinê tê kîrin. Tûrîzmeke ji nirxan bêpar û bi dekora nû. Ji otel, restoran, bar û kafeyên wir pereyan qezenc dikin. Anglo qezenc ji berhemên dîrokî pêk nayê.”

Prof. Dr. Seçkin Dindar 6 sal berê li Ayvansarayê, li ber Zindanê Anemasê li gorî gotina wî “cîyekî kavîl” kîriye û paşê ew der kîriye hotel û kafe. Dindar dîyar dike ku nirxdarbûna avayîyê jî ber dîrokê ye û kes nikare dîrokê bikire.

Şahin dibêje ku restorasyona bi rastî ne tenê karê pereqezenzkirinê ye, divê kesên wî karî dikin ji dil û can vê yekê bîkin.

Ev yek guhertina çandê ye

Seçkin Dindar çar avayîyên dîrokî kîriye, ji destpêkê de restore kîriye. Niha li Ayvansarayê otêlek, wargehake xwendekaran û kafeyeke wî heye. Dindar dibêje ku ber her kesî ew wekî sermayedar hatiye Herêma Ayvansarayê, karkirina vir zehmet e lê, ji vir bi şûn de wê sermayedaren din jî li herêmê kar bikin.

Dindar wiha got: “Ji ber ku Fener, Balat û Ayvansaray ne di nava projeya guhertina bajêr de ne, taybetîya wan a dîrokî hê nehatiye guherandin. Ji bo Sultanahmetê jî heman tişt tê gotin lê li wir jî gelek otêl hatine çêkirin. Cîyekî din jî herêma Galatayê ye ku li wir jî tu cî nemaye. Niha cîyê ku herî zêde potansîyela rantê lê tê



dîtin, herêma Fener, Balat û Ayvansarayê ye.”

Prof. Dr. Seçkin Dindar 11 salan li Zanîngeha Stenbolê bûye şêwirmendê rektor, di Lijneya Akademîk a Navneteweyî û Projeyên civakî de serokatî kiriye.

Niha di ser Yekîtiya Medyayê re Şêwirmendîya Medyaya Civakî a 60 zanîngehan dike. Rojên dawîya hefteyê ji bo hemû xwendekarên xwe li herêma Fener, Balat û Ayvansarayê “gotûbêjên li ser çand û dîrokê” li dar dixe û tecrubeyên xwe ji wan re vedibêje. Dindar wiha dibêje:

“Min bi sedan meriv li vê de gerandine. Mebesta min ew bû ku bila werin vir û bigihêjin wê asta têgihiştinê. Min di her

gotina xwe de anî ziman ku divê kesên hunermend û rewşenbîr werin vir.” Dindar dibêje ku li herêmê pêvajoya pêşketina çandê dest pê kiriye û wiha dewam dike:

“Divê ev der bibe warê hunermend û rewşenbiran. Hêdî hêdî wisa jî dibe. Mînak hunermendeke ez nas dikim tiştên darînî zindî dike, yekî din hat û di 8ê Adarê de li vir pêşangeha wêneyên xwe kir. Hin niviskar têن vir, pirtûkên xwe îmze dikan.”

Ew radighîne ku gelek bijîşk û hunermend bi saya serê wî li Balat, Fener û Ayvansarayê bi cî bûne. Dindar destnîşan dike ku guhertina civakî a herî mezin ev e û tenê bi vî awayî meriv dikare taybetîya herêmê biparêze.

Ku veguherîna bajêr nebe dê guhertin xwe bi xwe çê bibe!

Piştî salên 1930î bi endustrîyê, Balat ji bo bicîbûnê dibe cîyekî bi qezenc. Lê piştî salên 198oyî pêkanîneke berovajîyî vê yekê dest pê dike, kargehêن endustrîyê ên li wê herêmê têن girtin û gelê wir her diçe xizantir dibe.

Piştî salên 1990î ji bo başkirina rewşê hin mijar hatine rojevê û gelê wir jî bi hêvî bûne ku pirsgirêkên wan çareser bibin. Lê belê piştî salên 2000î bi projeyên dîyarkirî xizantîya gel bi şêwazeke din hat guhertin: Êdî gel ji destdanîna ser milkên xwe ditirse. Ji bo wan projeyan digotin

mebest dewlemendkirina gel e. Lê belê gel bi wan projeyan zêdetir xizan bû û hat bêrûmetkirin.

Li Sulukleyê û Tokludereyê gel ji cî û warên xwe hat derxistin û projeya guhertinê pêk anîn. Lê belê pêkanîna heman projeyê li Fener, Balat û Ayvansarayê pêk nehat. Niha “hewldana ronîkirinê” ku nikarîbûn bi hilweşandinê bikin, dixwazin bi mekanîzmaya pîyasayê ku kontrola wê di destê sermayedaran de ye bikin. Bi ci awayî be jî “Ronîkirin” tê kirin.

Alkr. Doç. Dr. Çiğdem Şahin ku li Balatê dijî û di nava tevgera ji bo bajaran de cî



girtiye, dibêje ku tiştê li Cihangir, Tophane û Ortakoyê kirine dixwazin li hêrêma Fener û Balatê jî bikin. Ew tîne ziman ku ji ber spekulasyonên der barê herêmê de bihayê mal û erazîyan zêdetir dikan, xwedîyên milkan ku malê xwe bi erzanî nefirotine şaredarîyê bi vî awayî wê bifiroşin sermayedaran. Ji ber bihabûnê, kesên li vir nikarin debara xwe bikin, vir terk dikan û di dëwsa wan de kesên dewlemend bi cî dabin. Şahin wiha got:

“Me wekî gelê li herêmê pêşî li projeya guhertina bajêr girt, lê niha dixwazin heman tiştî bi awayekî din bikin û mixabin dikan jî.”



“Ronîkina bi mecbûrî”

Rojnameger-nivîskar Ersin Kalkan jî li Balatê ji dayîk bûye, di sala 2014yan de bi keda xwe Meyxaneya Agorayê daye restorekirin û ji hemû herêmê re gelek xebat kiriye. Kalkan dibêje ku xeterîya guhertina bajêr êdî nemaye lê belê dixwazin vê yekê bi guhertina civakê bi xwe ve bikin:

“Wê teqez vê yekê bikin. Barcelona jî wisa ye, New York jî. Ev der êdî nabe wekî Tarlabâsiyê. Piştî doz bi encam bû, gelê li vir dest bi restorasyonan kiran, kafe vekirin û ji vir bi şûn de êdî bi paş de naçe.”



Birçîbûn li dijî sofîtîyê ye

Dema em ber bi kolanên nava Balatê ve diçin, bajarokekî din derdikeve pêşberî me ku sermeyedar ji wan aciz in. Zarokên 14-15 salî bi zora malbatêna xwe dizewicin, ku xwedî zarokên “sabiqepaqij” çê bibin. Zarokên nû ku wê sabiqeya wan tune be, ji bo malbatê dabin hêvî ku alîkarîya debara malê bikin. Pîşeyên ku zarok neçar dabin bikin jî afyonfiroşî û dizî ye.

Piranîya Romanên li herêmê dijîn, tûrîzmger an jî muzîkjen in. Piştî bişûndeçûn û krîza di sektora tûrîzmê de qezanca gelekan ji wan nîvî-nîvî kêm bûye. Li ser vê yekê pereyê kirêya wan jî hatiye zêdekirin û ji ber vê yekê neçar dimînin ku karên bêqanûnî bikin.

Pirsgirêka herî mezin li Balatê bikaranîn û firotina afyonê ye. Muzîkjenek bi xemgînî dibêje: “Li malê 3 zarokên min hene. Zikê wan birçî ye. Kî wê wan têr bike?” Dema êvaran ji kar tê, li dêrgehan tê cem hev, bîra û çayê vedixwin, behsa bihabûna kirêyan û nedîyarîya siberojê dikan. Dizanin ku bi guhertina bajêr re cudakarî li ser wan tê kirin. Yek ji wan muzîkjenê Roman ku naxwaze navê xwe eşkere bike, dibêje: “Di vê jîyanê de, serê meriv xweş nebe nabe.” Her wiha dibêje li bajarokê ci qas bûyerên dizîye çê bibin, wan wekî sûcdar dibînin. Dikene û dibêje, “Me dizî kiribe, nekiribe jî em dîsa sûcdar in.” Gazinan dike û dibêje ku ew nikarin di karekî bi sîgorte de bixebeitin. Ji ber ku xwedîyên kar naxwazin bi wan re bixebeitin.”

Herêm bi mudaxeleyên neqanûnî tê terorîzekirin

Alkr. Doç. Dr. Çiğdem Şahin sedema pirsgirêkên neqanûnî berdewamîya guhertina bajêr e. Dema nikarîbûn yek bi yek îqna bikin, rêbezeke wiha derxistin. Niha polîtîkayên bêrûmetkirinê li hemberî Fener û Balatê tê kirin. Şahin wiha dibêje: “Tînerkêş û mafyaya afyonê anîne vir.

Piştî demekê gel jî ji xwe re dibêje ku eger ez li vir bimînin, dê zarokên min jî bibe tînerkêş û tev li mafyayê bibe û ji vir derdikevin diçin. Ev yek herî dawî li Bağcılarê kirin.” Şahin dibêje ku herêm tê terorîzekirin û wiha dewam dike: “Ji bo rewşa ku wicdanê merivan aciz dike ji holê were rakirin, merivên wir têbêrûmetkirin û mudaxeleya li dijî wir bi vî awayî tê meşrûkirin.”

“Derîyê me ji her kesî vekirî ye, bes bila me aciz nekin”

Yek jî rîspîyên bajarok Halit Vitali ye ku tekstîlxane û qehwexane vekiriye demekê, lê belê niha neçar maye ku karê neqanûnî bike. Vitali wiha dibêje: “Ev der êdî ne ewle ye. Lê belê li derive jî dinyayeke nehiqûqî heye. Ji ber wê em vir terk nakin. Heta dawîyê em ê li vir bin. Her roj têbê vir, kevir bi kevir malan kontrol dikan, agahîyan li gel xwe tomardikan. Dixwazin heta 5-10 salan peymana

kirêkirinê deynin. Mala min li qata jor e û ji bilî wir tu cîyê min tune ye ku ez bisitirim. Ji vê xan û qehwexaneyê bêtir ji bo me tu jîyan tune ye.” Halit Vitali wiha dawî li gotina xwe tîne: “Em bi kesên ku dema ji kar têbê dizwazin du bîrayan ji xwe re bikirin û li malê bêhna xwe vedin re dijîn. Derîyê me ji her kesî re vekiriye. Tenê bila me aciz nekin.”

Ecem Engin

Ji Lîseya Ragihandinê ya Aydin Dogan û Zanîngeha Kocaeliyê beşa fotografgeriyê destûr girt. Li rojnameya Radîkalê weke stajyer dest bi rojnamegeriyê kir. Li BirGun û kovara Mimarlikê nuçegihanî û edîtortî kiriye. Ji sala 2015an vir ve bi awayekî demkî nûçe amade dike.

Şenay Öztürk

Li rojnameya Radîkal û Milliyet Sanatê dest bi rojnamegeriyê kir. Wek rojnamegera serbixwe dixebite.



Hunera di bin dorpêça tqeyûman de

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

DI DEMA OHALÊ DE HUNER - 1

Bi îlankirina OHALê re (rewşa awarte) li gelek şaredariyên ji Partîya Herêmên Demokratîk (DBP) qeyûm hatin tayînkirin û bi vê yekê re xebata çand û hunerê ku bi piştgiriya şaredariyan dihat kirin, bi dawî bû.

Zehra Doğan
Refik Tekin

Navenda Sazîya çavdêriya xweîfadekirinê Freemuseê li Danîmarkayê ye. Sazî her sal der barê sansur û êrişên li dijî huner û hunermendan raporan amade dike. Di wê rapora binpêkirinê mafan de, Tirkîye di nava 10 dewletên ku herî zêde êriş û sansurkirin lê hatine kirin de cî girtiye.

Di raporê de tê gotin ku bi taybetî zextên li ser hunerê piştî Îlankirina OHALê dest pê kiriye. Di sala 2016yan de li dîjî xweîfadekirina hunerî di 23 bûyerên girîng de maf hatine binpêkirin. Her wiha di wê raporê de hat gotin ku li Tirkîyeyê 11 hunermend di zindanan de ne, li dijî 3 hunermend û berhemên wan êriş hatin kirin û gef li 2 hunermedan hat xwarin.

Li gorî raporê 13 caran bi sansurkirin, 11 caran girtin, 7 caran lêpirsîn, 3 caran êriş û 2 caran jî bi gefxwarinê mafê merivan hatiye binpêkirin.

Di raporê de hat destnîşankirin ku piştî OHALê zextên herî zêde li bajarê Kurdan tê kîrin û vê yekê li ser pêkanîna hunerê jî xwe daye der.



Tayînkirina qeyûman çawa dest pê kir?

Piştî di 21ê Tîrmeha 2016yan de rewşa awarte (OHAL) hat ragihandin, bi Biryarnameya Di Hukmê Qanûnê de a bi hejmara 674an, êdî payeya tayînkirina qeyûman li ser şaredarîyên ku bi îradeya gel hatine bijartin, ket destê hukimetê.

Cara yekem di 11yê Rezbera 2016yan de li 28 şaredarîyan qeyûm hatin tayînkirin ku 24 ji wan şaredarîyan ên DBPyî bûn. Herî dawî, li Şaredarîya Gêlê tayînkirina

qeyûm ve hejmara şaredarîyên DBPyî ku dest danîne ser û qeyûm lê tayin kirine derket 84an.

Li ser şaredarîyan tayînkirina qeyûman dewam dike û li Şîrnexê Alîkarê Walî Turan Bedirhanoğlu qeyûmtîya sê şaredarîyan dike. Şaredarîyên Şîrnex, Dêrgulê û Gundikê Melê di destê wî de ye.

Heta Avrêla 2017yan hejmara hevşaredarê DBPyê ku hatine girtin, 83 ye.

Bi tayînkirina qeyûm û KHKyan xebatêن hunerî rawestîya

Astengîya herî mezin a li hemberî xebatêن hunerî qeyûmên li şaredarîyan hatine tayînkirin in. Bi tayînkirina qeyûman re li gelek bajar û bajarokan, êdî li navendêن çand û hunerê tu xebat nayê kirin, gelek peymanên bi hunermendan re hatibû danîn jî, hatin betalkirin.

Daneyêن fermî tune ne, 14 sazîyêن fermî bersiv nedan me


Der barê geşedanêن li ser xebatêن hunerî ku ji herêmê têن de, tu

agahîyeke fermî nayê bidestxistin.

Di çarçoveya mafê agahîgirtinê de me daxwaz ji van şaredarîyan kir ku der barê mijarê de agahîyê bidin me: Navenda Amedê, Farqîn, Navenda Mêrdînê, Nisêbîn, Qoser, Kerboran, Dêrika Çiyayê Mazî, Elîh, Şîrnex, Cizîr, Silopya, Hezex, Colemêrg, Gever. Lê belê tu cîyî bersiv neda me.


A rast ji xwe di mijara mafê agahîgirtinê de şaredarî xwe di malperên ïnternetê de jî dîyar dikin. Di malperên wan de dema meriv bişkoka agahîgirtinê vedike, galerîya wêneyan derdikeve. Anglo ew maf ji xwe di pergalê de betal kirine.

► Il gorî cureyên hunerên di sala 2016'de zerarburûnê kû li hember azadîya hûnerê hatîye pêk anîn



Curêن huner
 ● Film
 ● Şano
 ● Curêن ji yekê zêdetir
 ● Muzik


► Il gorî cureyên betal kirî di kû di sala 2016'de zerarburûnê li hember hûnere hatîne pêkanîn



Curêن zerardan
 ● Sansur
 ● Zindan
 ● Dadkirin
 ● Gef
 ● Eriş

FREEMUSE
ARTSFREEDOM

Nawêndêن çand û hunerên hatine girtin û hemî xebatkarêن we hatîye derxistin



Me jî hewl da li ser wan malperan û bi şandina e-mailê agahîyê bigirin. Lê belê me tu encam negirt.

Hunermend agahî û hejmaran ji me re radighînin

Di nava van bêderfetîyan ku girtina agahîyên fermî ne pêkan e de, me ji bo dosyeya xwe agahî ji nûçeyênu ku di medyayê de cî girtine berhev kirin, bi hunermend û kedkarênu ku ji karênu xwe ên li şaredarîyan hatine derxistin re hevdîtin kirin.

Li 14 bajarênu li herêmê 4 milyon û 730 hezar kes dijî û di dema OHALê de:

- 21 navendêن çandê hatin girtin, hemû xebatkarênu wan ji kar hatin derxistin.

- 288 hunermend, kedkar û dersdarêن çandê ji kar hatin derxistin.

- Li navendên hatin girtin 3 hezar û 366 xwendekar ji vê derfetê bêpar man.

- Lidarxistna 21 mîhrîcanan hat betalkirin.

- 220 çalakîyên wekî bîneal, perwerdeyî, şano, nîşandana fîlman û pêşangeh hatin betalkirin.

- 2 peyker hatin hilweşandin.

21 navendên çandê hatin girtin: Qoser, Kerboran, Dêrika Çiyayê Mazî, Nisêbîn, Farqîn, Şîrnex, Hezex, Silopya, Cizîr.

Li navenda Colemêrg û Geverê ci qasîku navendên çandê hebin jî, destûr nayê


dayîn ku tu çalakî were lidarxistin.

Em bi kesên wekî hunermend, dersdar û kedkarêni ji 14 bajar û bajarokan ku ji karêni xwe hatine derxistin re peyivîn. Wan anîn ziman ku xebatêñ hunerî ên wekî şano, sînema, govend, wêne, enstruman li navendêñ çandê bi piştgirîdayîna şaredarîyan dihatin kirin.

Hunermenden her wiha gotin ku ji ber ku mîhrîcan û nîşandana fîlman, li avayîyen girêdayî şaredarîyan dihatin kirin, piştî tayînkirina qeyûman ne pêkan e ku çalakî û xebatêñ hunerî êdî were kirin.

Em di vê mijarê de bi hunermendêñ ku piştî tayînkirina qeyûman li Amed û Mêrdînê dixebeitîn re peyivîn.

Berê Mêrdîn...



SEYDA PERİNÇEK
Stranbêj

Serdozgeriya Komarê ya Bakirkoyê di sala 2015ê de bi tometa “propagandakirina ji bo rêxistinê” lêpirsîn li ser Seyda Perinçek vekir. Di 14ê Kanûna Pêşiyê ya 2016ê de bi heman tometê dadgehê salek, 6 meh û 22 roj cezayê girtinê da Perinçekî di bangeşeyên referandûmê de, ji bo HDYPê strana “Bêjin Na” çêkiribû. Stran hat qedexekirin û cezayê wî di 28ê Adarê de wek biryara esehî hat diyarkirin.

Li Mêrdînê navendêñ çandê hatin girtin, serokê daîreyê hat girtin

Yek ji bajarêni di dema OHALê de û navbera salêni 2015-2016yan de wêrankirina mezin lê hatiye kirin, Mêrdîn e. Hevşaredarê Şaredarîya Bajarê Mezin a Mêrdînê Ahmet Türk û Februniye Akyol ku ji.

DBPyê hatibûn bijartin di 16yê Sermawezâ 2016yan de ji karêni xwe hatin dûrxistin û di dewsa wan de Walîyê Mêrdînê Mustafa Yaman wekî qeyûm hat tayînkirin.

Di 24ê Sermawezê de ji Ahmet Türk hat girtin. Çi qas ku Ahmet Türk di 3yê


Reşemîyê de hatibe berdan jî, peywira wî teslîmê wî nekirin.

Piştî tayînkirina qeyûman li Nisêbînê Navenda Çand û Hunerê a Mîtanî, li Qoserê Navenda Çand û Huner a Ali Temel, li Dêrika Çiyayê Mazî Navenda Çand û Hunerê a Çiyayê Mazî hemû xebatêñ çand û hunerî dan sekinandin.

Serokê Xizmetên Çandî ê Şaredarîya Bajarê Mezin a Mêrdînê Seyfettin Yavuz û serokê heman şaxê Mehmet Ali Dal piştî ji karêni xwe hatin derxistin, di 12yê Berfanbara 2016yan de hatin girtin û ew şandin Zindana Tîpa E a Mêrdînê.

Li bajêr Rojêñ Fîlmên Çerçî ku her sal

Bianelên hatiye betalkirin, pêşengeteh, perwerde, şano, berhemêñ pêşkirina filman



dihat lidarxistin, hat betalkirin. Her wiha, ji Sermaweza 2009an vir ve her sal Mîhrîcana Şanoya Zarok û Ciwanê Mêrdînê a Navneteweyî dihat lidarxistin, ji ber sazîya organîzator Komeleya Perwerdeyî û Lêkolîna Hunerên Dramatîk (DRASED) hatibû girtin, ew jî nayê kirin. Komeleya hatibû girtin, piştî 4 mehan di 22yê Sermawezê de bi KHKyâ nû careke din vebû û ragihand ku dê ew mîhracan di Sermaweza 2017yan de were lidarxistin.

Selamo: “A rast niha dem, dema hunerê ye”

Li bajêr bi rojan derketina derive hat qedexekirin. Em der barê astengîyên ku di vê demê de li ser xebatêن hunerê hat kirin de, bi derhêner û senarîstê fîlman Selamo re peyivîn.

Selamo dibêje ku OHAL ji hunermendan re derfet e.

Selamo dibêje, “Niha dema afirandina hunerê ye” û tîne ziman ku ji xwe ji destpêkê ve “şas” bû ku hunermendan di bin sîya şaredarî û sazîyên dewletê de xebatêن xwe dimeşandin.

Ji bo em nûçeya xwe bi gotina Selamo: “Di bin sîya qeyûm de be jî, hêvîya afirandina hunerê heye” biqedînin, em li Selamo guhdarî bikin:

“Ez matmayî me ku hunermendên Kurd

qeyûman wekî astengî li ber hunera xwe dibînin. Bi girêdayîbûna şaredarîyan re çi qasî ku hunermendan di warê aborî de rewşa xwe baş kirin jî, ev yek bû sedema tiralîyê jî.”

“Bi vê tiralîyê re êdî em neçar bûn ku hemû xebatêن xwe li gorî rîziknameya şaredarîyê bimeşînin. Ji xwe me bi xwe digot ku; “Nabe meriv bibe hunermendê dewletê.” Em him di sazîyên dewletê de dixebeitin û him jî dibêjin ku; “Em di bin sîya desthilatdarîyê de hunera xwe nakin.” Tiştekî wiha nabe. Heke em bi vî awayî her tiştê xwe bikin jî, ev yek nakokî ye.

“Ez niha matmayî me ku hevalên me ên hunermend dibêjin: “Qeyûm hatiye dest danîye ser xebatên me, destê me hatiye girêdan.” Niha dem dema bi hevparî afirandina hunerê ye. Yek bi kameraya xwe, yek bi senaryoya xwe, ê din bi lambeyên xwe dikarin bi awayekî komun fîlmekî çê bikin. Em ê wê demê karibin bibêjin: “Em hunerê diafirînin.”



**Hunermend û bîner bê dik mane,
xwendekar ji konsevatarê bûne**

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

DI DEMA OHALÊ DE HUNER - 2

*Salê herî kêm 35 hezar bîner dihatin Şanoya
Bajêr a Amedê. Li Navenda Çand û Hunerê a
Cegerxwîn salê 100 xwendekarî destûrname
digirt û li saziyê 30 mamos te dixebeitîn.*

Zehra Doğan
Refik Tekin



Ruknettin Gün: “Dixwazin hunermendan bi birçîbûnê kontrol bikin”

Em bi gotinên wî sedema vê yekê vebêjin:

“Niha tu avayî an dik ji bo me tune ye ku em tê de vê hevpeyvînê bikin. Ji bo dîmenkişandina we neyê astengkirin, em nikarin vê hevpeyvînê li derive jî bikin. Va ye rewşa herêmê wiha ye.”

Gün dibêje ku qeyûmê li Şaredarîya Amedê hatiye tayinkirin, di 5ê Rêbendana 2017yan de peymanên

bi 31 lîstikvanên li Şanoya Bajêr dixebeitîn re hatibû danîn, betal kiriye:

“Li gorî benda 2. a madeya 40. a rîziknameyê xebatkarê ku pê re ji bo salek peyman hatibe danîn û piştî bidawîbûna wê demê, di destê serokê şaredarîyê de ye ku peymana bi wî re were nûkirin an na. Ji ber vê yekê peymanên bi hevalên me re hatibûn danîn, bi hinceta “We di warên cuda de dîplome girtiye!” di warê xebatê din ên şaredarîyê de hatin belavkirin.

“Ez û hevaleke xwe, ci qasî ku me ji besa şanoyê destûrame girtibin jî,

Me bi Hevderhênerê Hunerê ê Şanoya Bajarê Mezin a Amedê (DBŞT) Ruknettin Gün re li kafeyeke ku pir nayê zanîn û dûrî navenda bajêr e, hevdîtinek kir.

ji ber dawîkirin an nûkirina peymanê di destê qeyûmê de bû, wî li gorî madeya 49. peymana nû bi me re danenî. Peymanên bi hunermendan

“Em bûbûn şanoya tevayîya herêmê”

Gün dibêje ku salê herî kêm 35 hezar bîner diçûn Şanoya Bajêr a Amedê, wan her sal turne li dar xistine û bi vî awayî bûne şanoya tevayîya herêmê.

Piştî repertuara bi Kurdî hejmara bîneran gelekî zêde bûye. Bi vî awayî ji bilî Tirkîyeyê li Ewropa, li Kurdistanâ û Îraqê jî hunera xwe pêşkêş kirine.




RUKNETTİN GÜN Şanolîz

Ruknettin Gün di şanogeha Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê de wekî hevderhênerê hunerê kar dikir.

Qeyûm ew û 30 şanoger ji karê wan dûr xistin.

Ruknettin Gün beşa şanoyê xwendiyê. Qeyûm bi xala 49an a karkirinê hevpeymana wî a şanogerîyê betal kir.

Şagirten ku hatin tesîrkirin



Hevşaredarên Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê Fîrat Anlı û Gültan Kışanak (DBP) di 25ê Kewçêra 2016yan de hatin binçavkirin. Piştî binçavkirina 5 rojan der barê wan de di 30yê Kewçêra 2016yan de biryara girtinê hat dayîn. Qaymeqamê Enqere, Etimesgutê Cumali Atilla di 1ê Sermawezê de wekî qeyûm li şaredarîyê hat tayînkirin.

Xwendekar êdî nikarin perwerde bibin

Gün wiha tîne ziman ku qeyûm li ser navê şaredarîyê helwesteke çawa li hemberî hunerê pêk tîne:


“Tehemila wan ji hunerê re tune ye.

Konservatuvara Aram Tîgran ji 2010an vir ve di 5 warêن hunerê de perwerdeyî dida. Dîsa Navenda Çand û Hunerê a Cegerxwîn wekî akademî xebat dikir û salê herî kêm 100 xwendekarî jê destûrname digirtin. Her du jî hatin girtin.”

Hevşaredarê Peyasê Mehmet Ali Aydin di 8ê Berfanbarê de hat girtin. Paşê qaymeqamê navçeyê Mustafa Kılıç, li şaredarîyê wekî qeyûm hat tayînkirin. Li ser wê yekê Navenda Çandê a Cegerxwîn ku girêdayî şaredarîyê bû hat girtin.

Li Navenda Çandê a Cegerxwîn beşên şano, sînema, şan, enstruman, govend û wêne hebûn, li navendê 300 xwendekar perwerde dibûn, salê herî kêm 100

Mîhrîcanêن hatin betalkirin



xwendekarî destûrname ji wir digirtin û 30 mameste li wir dixebeitîn.

Navenda Çandê a Cegerxwîn ji 2010an vir ve xebatê çand û hunerê dikir ku li herêmê di vî warî de navenda herî girîng bû.

Li hêwana navendê her sal 5 konferans, 40 semîner, 30 panel, 20 civîn, 20 şano, nîşandana 40 fîlman dihat kirin û her wiha 30 pêşangehê wêne, fotograf û peykeran jî dihat lidarxistin.

Her wiha li navendê pirtûkxaneyeke bi têrî 300 kesan hebû û FîlmAmed jî li wir dihat lidarxistin.

Wekî ê Amedê, qeyûmên li Colemêrg û

Êlihê jî hatine tayînkirin xebatê şanoyê betal kirin. Gelek xebatkar ji kar hatin derxistin. Hin ji wan jî di xebatê cuda de li şaredarîyê hatin peywirdarkirin.

Piştî peymana bi xebatkarêن Şanoya Bajêr a Şaredarîya Amedê re hatin betalkirin, wan xebatkaran jî li Galerîyayê di mekanekî qata erdê de wekî alternatif Şanoya Bajêr a Amedê damezirandine.

Yavuz Akkuzu:

“Bîner fêrî nirxandinê dibûn”

Êdî ji bo şanoyê dewraneke nû dest pê kir. Me bi lîstikvanê Şanoya Bajêr a Amedê Yavuz Akkuzu re li warê wan ê nû hevdîtin kir.



YAVUZ AKKUZU Şanolîz

Yavuz Akkuzu di Şanogeha Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê de wekî şanolîz kar dikir.

Qeyûm ew û 30 şanoger ji karê wan dûr xistin.

Piştî ku Şanogeha Şaredarîya Bajarê a Amedê hat girtin Yavuz li Şanogeha Bajarê Amedê a alternatif li Dîyar Galerîyayê hatiye vekirin dest bi karê xwe ê hunerî kir.

“AKPyê li hemberî hunerê jî helwesteke kone dîyar kir. Ji derve de tê nîşandan ku Şonaya Bajêr heye. Lê belê hemû xebatkarêن wan ji kar hatin derxistin. Ango sazîya şanoyê heye lê belê bi fiîlî hatiye girtin.”

“Em ji kar hatin derxistin. Sedema wê jî ev e ku bînerên dihatin wir êdî li hemberî her tiştî nirxandineke xurt dikirin. Me ji bilî lîstokan, li wir şêwazeke hunerê pêk dianî.”

“Em hê jî matmayî ne”

Şanoya ku di 5 salêن dawî de li ser klasîkên dinyayê dixebeitî, ji serdema 2006-2007an vir ve hemû lîstikên xwe bi Kurdî dilîstin.

Akkuzu dîyar dike ku ew her sal bi 4 lîstikên mezin û bi 2 lîstikên zarokan derdiketin pêşberî bînerên xwe û sedema damezirandina cîyê nû jî wiha tîne ziman:

“Li Kurdistanê koma herî xurt a şanoyê em bûn, me hunera xwe dikir, ji ber vê jî çavê wan li me bar nebû. Meriv divê li hemberî çavnebarîya wan matmayî be. Ji ber ku yên matmayî nebin wê merivbûna xwe winda bikin. Dema bê gotin ku “Ji xwe AKP dikare vê yekê bike., wê demê merivayî ji dest diçe. Ez hê jî li hemberî her tiştî matmayî me. Bi vî awayî dikarim li ser pîyan bisekinim. Derdê me ew e ku tiştîn ku em bi matmayî diafirînin,

ragihînin bîneran. Ji ber ku em hê jî matmayî ne, me hêza vekirina vî cîyê alternatîf bi xwe re dît.”

“Dibe ku der barê me û bînerên me de biryara lêgerînê hebe.”

Ji bilî Şanoya Bajêr a Amedê, li bajêr tenê li Şanoya Dewletê lîstîk hene. Li gorî Akkuzu di warê pêkanîn û afirandina hunerê de ji ber helwesta wan a hunerî li Şanoya Dewletê gelek kêmayî heye.

Li gorî Akkuzu wê Şanoya Dewletê ji bo qeyûm bibe mînak:

“Qeyûmên tayînkarî dibe ku kopîyeke nebaş ji şanoya dewletê çê bikin. Piştî qeyûm, ji xwe me nikarîbû em hunera xwe li hêwana şaredarîyê bimeşînin. Dibe ku der barê bînerên ku dihatin temaşekirina lîstîkê de biryara lêgerînê hebe. Her wiha dibe ku der barê me de jî biryara lêgerînê hebe”.

Zehra Doğan

Ji Zanîngeha Dicleyê beşa mamostetiya wênesaziyê destûr girtiye. Ji 2012an vir ve li JINHAyê weke nûçegihan û edîtor dixebite. Dogan bi nûçeya “Qêrîna Jinêñ Êzdî” li ser jinêñ Şengalî ku di bin zilma DAIŞÊ mane, hêjayê Xelatê Rojnamegeriyê yê Metîn Goktepe hat dîtin.

Refik Tekin

Di sala 2001an de dest bi rojnamegeriyê kir. Li rojnameya Kurdish Raportê û Ajansa Wêneyan a MetroGraphyê xebitî. Li IMC tvyê buroya Amedê ku bi KHKyê 2016an de hat girtin de xebitî. Dîmenên bi navê “Di weşana zîndî de DAIŞîyên sînor îxlal dikin” ve 2015an de hêjayî Xelatê Rojnamegeriyê yê Metîn Goktepe hat dîtin. Li Cizîrê dema dorpêça li ser bajêr dişopand, hat birîndarkirin. Bi wî halê xwe dîsa dîmen kişand. Bi dîmenên di bûyerê de kişandibû ve 2016an de hêjayê Xelatê Rojnamegeriyê yê Metîn Goktepe, Xelatê Çapemeniya Azad ê Mala Gel, Xelatê Medyayê yê TGSê, Xelatê KMM Ayşenûr Zarakoglu yê Azadiya Raman û Xwe-îfadekirinê ku ji hêla KMMê hat dîtin. Bi awayekî şexsî 4 pêşangeh wêneyan pêkanî. Bi wêneyêñ xwe ve besdarî 24 pêşangeh hevpar û 3 festîvalan bûye.



Di tevgera Kurd de kronolojîya zindanan

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

SÎYASETMEDARÊN KURD - 1

Zindankirina li hemberî Tevgera Kurd ji damezirandina komarê ve destpê kiriye. Bi teqez ne diyar e ka heta niha çend kes ji ber pirskirêka Kurd hatine zindankirin lê, li gorî texmînan heta niha herî kêm 300 hezar kes hatine zinsankirin. Zêdeyi wan kesan piştî 1980an di girtîgehan de mane. Bi gelempî kengî ji ber pirsgirêka Kurd pevçûn û alozî zêdebûne, wê demê welatî girse bi girse hatine girtin. Dosyeya me ya ku me li ser mijara girtinên li hemberî Tevgera Kurd amade kiriye, ji 3 beşan pêk tê. Di beşa yekem de agahî û analîzêna navbera salên 1925-2010an hene. Di beşa duyem de agahiyên derbarê operasyonên KCKê ku 2009an de destpê kiribû û hêjî didome hene. Di beşa dawî de jî, ji 1990an vir ve (ji HEPê heta HDPê) kronolojîya girtina serokên partiyêni Kurd heye.

Nuri Fırat

Yılmaz Yıldız


Serhildana Şêx Seîd (1925)

- Rêberê Serhildanê Şêx Seîd û 46 hevalên wî hatin girtin, Pişti dadkiranê di 29ê Hezîrana 1925an de ew hatin darvekirin. Di Avrêl û Gulana 1925an de jî Xêlid Begê Cibrani, Yusif Ziya Beg û Seyîd Abdulqadir jî di nav de herî kêm 15 kes hatin darvekirin.
- Li gorî Ergun Aybars navbera 15ê Nisana 1925an 7ê Adara 1927an de li herêma serhildan pêk hatibû de 5 hezar û 110 kes di Dadgehê İstîklalê de hatin dadkiran. Li 420 kesan cezayê darvekirinê, li 1911 kesan jî cezayên curbecur hatin dayîn. (1)



Serhildana Şêx Seîd (1925)

- Derbarê Serhildana Agiriyê de agahiyên teqezi nîn e. Lîbelê li gorî Ahmet Ozer 1500 kes hatine dadkiran, hin ji wan hatine darvekirin, li hinekêni di cezayê din hatine dayîn û hinekêni di jî hatine sirgunkirin. (2)



- Li gorî rojnameya Swêdê Dagens Nyheterê, di dadkiranina li Edenevê de li 44 kesan cezayê darvekirinê hat dayîn û 31 ji wan hatin darvekirin. (3)

Qetlîama Dêrsimê (1937-38)



- Agahiyên teqezi di dest de nîn e ka çend kes hatine girtin. Seyît Riza kurê wî jî tê de 7 kes bi tewanbariya serhidan dane destpêkirin, hatin darvekirin.

1960 – 1980

Doza 49iyan

- Di 22ê İlônê û 17ê Kanûnê de 40 xwendekar û rewşenbîrên kurd piştî binçavkirinê hatin girtin. Bi temamî derbarê 50 kesan de doz hat vekirin. Mehmet Emîn Batu k udi girtîgêhê de canê xwe jî dest da, di dozê 49 kes man. Bo vê yekê doz wekê "Doza 49iyan" hat binavkirin. 49 kesen ji wê dozê girtibûn, di efûya piştî derbeya leşkeri ya 27ê Gulana 1960an jî feyde negirtin. Kesên girtî di 25ê Adara 1961an de hatin tehliyekirin. Doz di 1968an de ji ber demboriya dosyeyê betal bû.

- Di nav kesen girtî de rewşenbîr û siyasetmederén wekê Mûsa Anter, Yaşar Kaya, Cañip Yıldırım, Saît Kirmizitoprak, Nacî Kutlay, Saît Elçi û Yavuz Çamlıbel jî hebûn.



Agahiyên derbarê kesen ji Doza 49iyan de hatibûn dadkiran, di rojnameyên wê demê de cih girtibûn.

Qampa Sêwazê

- 4 piştî Derbeya 27ê Gulanê gelek şêx, axa û serokên eşiran hatin girtin. Wan li Sêwaz Kabakyazîye di qampa leşekî de kom kirin. Agahiyeye teqezi di dest de nîn e lê, herî kêm 485 kes di qampê de hatibûn komkirin.

- Kesên hatibûn girtin, piştî komkirina li qampê dewletê dest danî ser mal û milkê wan. Di 25ê Mijdara 1960an de qamp hat girtin, 55 kes ji wir hatin sirgunkirin. Sirgunbûna wan kesan di 10ê İlona 1962an de dawî bû.

Bûyerê "fîtlêxistin" û "xwarinê"

Mûsa Anter di 72 saliya xwe de di 20ê İlona 1992an de bi cînayeta fail-mêchûl hate kuştin. Ew di hemû serdemê derbeyan de û di dozê Kurdan ên navdar de hat dadkiran. Anter derbarê bûyerê fîtlêxistin" û "xwarina mili" ku hatine serê wî bûne mijara lepirsinan de wiha digot: (4)

- Ez cara yekem di 1937an de, herî dawî jî di 1990an de hatin girtin. Nîvê pirtûkxaneya min idianameyên dadgehê leşkeri û hinceta biryarê dayî ku kirine weke pirtûk ve pêk tê. Çend salan girtî ma me, çiqas binçavkirî ma me û çend caran hatime sirgunkirin, ez jî nizanim.

- Navbera salen 1940-41an de em ciwanen Kurd ku me li derdor dixwend, li fakulteyen Stenbolê de qeyda xwe çêkir. Ji bo sitirandinê jî me bo xwe wargeha xwendekaran vekir... Di sala 1943an de dem arz rîvebirê wargehê bûm, min gazî Şaxa 1. kirin. Heqaret û işkenceyeke mezîn li min kirin. Sedama vê yekê jî ev bû ku j imin re digotin, "tu çima dihîlî xwendekar di wargehê de bi Kurdi fiqî bixin". Yek jî em di serdema Şerê Cihanê ya Duyem de bûn. Her kes ji birçîna dişikest. Ancax xurekên ku ji welêt ji me re dişandin, bi deste me diketin. Xurek û xwrinê me jî savar, keşk, pîvaz û goşte qelî bû. Van kirin sedema lepirsinê. Ji me re digotin ku em ne ji ber feqîrtiyê, bo ciwanen Kurd xwarinê xwe yên gelêri ji bîr nekin, em ew xurekan bi wan didin xwarin...

Doza 23iyan

- Di sala 1963an de kesen weke Mûsa Anter, Medet Serhat, Saît Elçi, Yaşar Kaya û Ziye Şerefhanoglu ku di Doza 49iyan de hatibûn dadkiran jî di nav de 23 kes hatin girtin. Her wiha di nav kesen girtî de Kurdên ji Iran û Iraqê jî hebûn.

- Di nav kesen girtî de rewşenbîr û siyasetmederén wekê Mûsa Anter, Yaşar Kaya, Cañip Yıldırım, Saît Kirmizitoprak, Nacî Kutlay, Saît Elçi û Yavuz Çamlıbel jî hebûn.

"Serdegirtinê Komandoyan"

- Di bihara 1970an de yekîneyen komandoyan li Amed, Sêrt, Erzirom, Elîh, Mûş, Çewlik, Mêrdin, Wan û Colemêrgê li gelek navce û gundan serdegirtinan pêk anîn û bi hezarak kes hatin binçavkirin. Li gorî Celal Temel, tenê li navcuya Farqînê ya Amedê 3.000 kes hatin girtin. (6)

- 4 piştî Derbeya 27ê Gulanê gelek şêx, axa û serokên eşiran hatin girtin. Wan li Sêwaz Kabakyazîye di qampa leşekî de kom kirin. Agahiyeye teqezi di dest de nîn e lê, herî kêm 485 kes di qampê de hatibûn komkirin.

- Kesên hatibûn girtin, piştî komkirina li qampê dewletê dest danî ser mal û milkê wan. Di 25ê Mijdara 1960an de qamp hat girtin, 55 kes ji wir hatin sirgunkirin. Sirgunbûna wan kesan di 10ê İlona 1962an de dawî bû.



Beşikçi: Mebesta wan ew bû ku dixwazti çavê Kurdan bitirsînin


Civaknas Îsmâil Beşikçi ji 12ê Adara 1971an şunde 9 caran hate girtin û bi temamî 17 sal û 2 meh di girtîgehan de ma. Li gorî wî, Doza 49iyan û Qampa Sêwazê bi bûyerê li Iraqê re têkîdar bûn. Di sala 1958an de li Iraqê bi serkîşîyan Abdulkérîmê Albay derbe hat kirin. Di makeqanûna nû de rojnameya Kurdan hebû û siyasetmederén Kurda jî di hukîmetê de cih girtin. Beşikçi diyar dike ku geşedanen wir Tirkîyê aciz kiriye bi derbeya 27ê Gulanê re politikaya li hemberî Kurdan hatîye guherandin û wiha dibêje: "Bi Doza 49iyan û Qampa Sêwazê ve dixwaztin çavê Kurdan bitirsînin".

Beşikçi derbarê dozên DDKOyê ji wiha dibêje: "Kurdan cara yekem di van dozan de li hemberî inkariya dewletê Kurdan û Kurdiye parastin."

Dozên DDKOyê

- Him berî him jî piştî Muxtireya 12ê Adara 1971an de gelek kesen muxalif hatin girtin. Li gorî Cemal Temel, Mumtaz Kotan, Rûşen Aslan, M. Emin Bozaslan, Ferît Uzun, Kemal Burkay, Mehdi Zana jî di nav wan kesen hatin girtin.

- Ez cara yekem di 1937an de, herî dawî jî di 1990an de hatin girtin. Nîvê pirtûkxaneya min idianameyên dadgehê leşkeri û hinceta biryarê dayî ku kirine weke pirtûk ve pêk tê. Çend salan girtî ma me, çiqas binçavkirî ma me û çend caran hatime sirgunkirin, ez jî nizanim.



Civaknas Îsmâil Beşikçi ji 12ê Adara 1971an şunde 9 caran hate girtin û bi temamî 17 sal û 2 meh di girtîgehan de ma. Li gorî wî, Doza 49iyan û Qampa Sêwazê bi bûyerê li Iraqê re têkîdar bûn. Di sala 1958an de li Iraqê bi serkîşîyan Abdulkérîmê Albay derbe hat kirin. Di makeqanûna nû de rojnameya Kurdan hebû û siyasetmederén Kurda jî di hukîmetê de cih girtin. Beşikçi diyar dike ku geşedanen wir Tirkîyê aciz kiriye bi derbeya 27ê Gulanê re politikaya li hemberî Kurdan hatîye guherandin û wiha dibêje: "Bi Doza 49iyan û Qampa Sêwazê ve dixwaztin çavê Kurdan bitirsînin".

Beşikçi derbarê dozên DDKOyê ji wiha dibêje: "Kurdan cara yekem di van dozan de li hemberî inkariya dewletê Kurdan û Kurdiye parastin."

Derbeya 12ê Îlona 1980an

- Piştî derbekirinê di nav çar mehan de 650 hezar kes hatin binçavkirin, 230 hezar kes li dadgehên OHALê de hatin dadkirin, 30 hezar kes hatin girtin. Heta sala 1986an 45.613 dosyeyên dozan şandin ji dadgeha leşkeriyê re. Ev yek ji nîşan dide ku herî kêm 500 hezar kes hatine dadkirin. (7)
- Kesên ku bi îdiaya tevgerên Kurd re têkildarin jî di nav wê bîlançoyê de ne. Celal Temel "hejmara kesên bi tewanbariya tevgerên Kurd re têkildar in" wiha berhev kiriye: (8)
- PKK: 4300
- (Hejmara kesên tenê ji dozêne PKKê yên Amedê de hatine dadkirin: 1257)
- Kawa-Dengê Kawa: 750
- KIP-DDKD: 700
- Rizgarî-Ala Rizgarî: 450
- KUK-TKDP: 450
- TKSP-OZGURLUK YOLU: 300
- TEKOŞÎN: 45
- Kurdên di rêexistinêng cepgir ên din de: Nêzî 1000 kes



Zulfikar Tak dem adi Zindana Amedê de girtîbû, bi wêneyên xêzdikir ve bûyerên wir ji raya giştî re radigihand.

Zindana Amedê: 53 kesan canê xwe ji dest dan

- Kesên ji ber têkildariya bi tevgerên Kurd re hatin mehkûmkirin, zêdeyiye wan şandin Zindana Amedê. Ev zindan bi işkence û zextên ji dûrê aqilan ve kete rojevê. Li gorî daxuyaniya Sererekaniyê ya 2ê Avrêla 1986an, li Zindana Amedê 53 kesan canê xwe ji dest dan. (9)
- Kesên mehkûm li dijî zextên li ser wan dihatin kirin, çalakiyên wisa kirin ku ji canê xwe bûn. Di nav kesên li wir mirin de Mazlûm Dogan, Ferhat Kûrtay, Kemal Pîr, Hayrî Dûrmûş, Yilmaz Demir, Celal Arat, Orhan Keskin, Necmettin Buyukkaya jî hebûn.

Navbera salê 1990-2000

Navbera salê 1990-2000an de hejmara kesên ji ber pirdgirêka Kurd hatin zindankirin, zêde bû. Lîbelê agahiyêne teqez di dest de nîn e, ka çend kes ji ber pirsgirêka Kurd hatine girtin. Lîbelê agahiyêne di dest de nîşan dide ku hejmar ji ya berê gelek zêdetir e.

✓ Li gorî raporê salane yê KMMê tenê navbera salê 1994-1997an de 76 hezar û 688 kes hatin binçavkirin, 6 hezar û 654 kes ji hatin girtin. Nediya e ka çend kesen ji wan derbarê pirsgirêka Kurd de hatine girtin.

✓ Rojnameger Tolga Şardan anî ziman kul i gorî çavkaniyê ewlehiyê navbera salê 1984-2012an de 2003 hezar kes bi idiaya "endamê rôexistina terorî ye" ve hatin binçavkirin. Şardan diyar kir ku tenê di sala 1999an de 16 hezar û 935 kes bi tewanbariya bi PKKê re têkildarin ve hatin binçavkirin. Ev hejmar di sala 1993an de 14 hezar û 26, di sala 1994an de 12 hezar û 525 bû. (10)

✓ Bi berhevkirina agahiyêne xebat û lêkolinen cuda yê saziyêne mafê mirovan ve tê texmînkin ku ji 1984an heta 2010an, nêzî 120.000 kes ji ber pirsgirêka Kurd hatine girtin.(11)



Di 19ê Kanûna 2000an de li zindanan operasyon hat kîrin

Operasyona li dijî mehkûman

Navbera salê 1990-2000an de li dijî mehkûmên siyasi gelek operasyon hatin kîrin. Bîlançoya wan operasyonan bi vî rengi ye: (12)

- 21ê İlona 1995an, Zindana Bucayê, 3 mehkûm canê xwe ji dest dan.
- 4ê Çileya 1996an, Zindana Umraniyê, 4 mehkûm canê xwe ji dest dan.
- 24ê İlona 1996an: Zindana Amedê, 10 mehkûm canê xwe ji dest dan.
- 26ê İlona 1999, Zindana Ulucanlarê, 10 mehkûm canê xwe ji dest dan.
- 7ê Çile 2000an: Zindana Bandırmayê, mehkûmek canê xwe ji dest da.
- 25ê Çile 2000an: Zindana Metrisê, mehkûmek canê xwe ji dest da.
- 19ê Kanûn 2000an: Zindana Bayrampaşayê, 30 mehkûm ve 2 leşker canê xwe ji dest dan.

Bîlançoya 20 salan ya Wezareta Dadê

Li gorî agahiyêne Wezareta Dadê hejmara kesen navbera salê 1990-2000an de, ji ber sûcê "terorê" di girtîgehan de mane, wiha ne:

SAL	MEHKÜM	GIRTİ
2000	4477	4190
2001	5116	3182
2002	5123	2622
2003	4161	1976
2004	2170	1618
2005	2093	1537
2006	2116	1719
2007	2418	2102
2008	2540	2899
2009	2967	3361
2010	3682	2535

Kankılıç: Zextêni dihat kîrin bû sedema xurtbûna tevgera Kurd



Hamit Kankılıç di Hezîrana 1980an de hat girtin. Wî şandina Zindana Amedê. Ji ber işkenceye li wî hat kîrin, bi salan hate dermankirin. Derbarê reşa girtîgehan a serdema 1980-1990an de wiha got:

- Cazayê darvekirinê li min hatibû dayîn. Turgut Ozal di sala 1991an de qanûnê guherand. Cezayê darvekirinê ku li rastgir û çepgirêne Tirkan hatibû dayîn, kirine zindankirina 10 salan û yê muebetê ji kirine 8 zindankirina 8 salan. Lîbelê ji bo kesen ku ji tevgera Kurd bûn cezayê darvekirinê kirin zindankirina 20 salan, yê muebetê ji kirin zindankirina 15 salan. Ez 20 salan di girtîgehan de mam û piştre tehliye bûm. Qaşo dibêjin Kurd welatiyên wekhev in. Ji ber vê her tim miameleyeke wiha li me rewa kirine!
- Piştî Derbeya 12ê İlônê di 3-4 mehan de kapasiteyea girtîgehan 5 hezar kesan zêdetir bû. 3000-3.500 kes ji ber têkildariya bi tevgerêne Kurd re hatibûn girtin. Kî nêzî tevgerê ye, kî nîn e; ev yek ne müühim bû. İfadeyeke piçûk bihata dayîn bes bû.
- Ji salê 1990 şûnde girtin wisa zêde bû ku hejmar gihişte deh hezaran.
- Dewletê çiqas zextêni xwe zêdetir dikir, tevgerêne Kurd ewqas hêzdartrî dibûn, gelê Kurd xwedî li nasname û berxwedana xwe derdiketin.

(1) Ayşe Hür (2015). Cumhuriyet'in kanlı 'Kürt Bilançosu'. <http://www.radikal.com.tr/yazarlar/ayse-hur/cumhuriyetin-kanli-kurt-bilancosu-1494640/>

(2) Ahmet Özer (2010). Kürtler ve Türkler. İstanbul: Hemen Kitap

(3) Ayşe Hür. age.

(4) Musa Anter (2011). Vakayinname. Diyarbakır: Aram Yayınları

(5) Celal Temel (2015). Kürtlerin Silahsız Mücadelesi. İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı Yayınları

(6) Celal Temel. age.

(7) Ali Yılmaz (2013). Kara Arşiv 12 Eylül Cezaevleri. İstanbul: Metis Yayınları

(8) Celal Temel. age.

(9) Ali Yılmaz. age.

(10) Tolga Şardan (2012). 28 Yılın Aci Bilançosu: 35 Bin 300 Kişi Terör Kurbanı Oldu. <http://www.milliyet.com.tr/28-yilin-aci-bilanкосu-35-bin-300-kisi-teror-kurbani-oldu-siyaset-1581690/>

(11) <http://latimesblogs.latimes.com/babylonbeyond/2010/07/convicted-of-terror-sm-a-young-kurdish-girl-is-serving-her-seven-year-and-nine-month-prison-sentence-in-turkeys-prison-e.html>

(12) Mustafa Eren (2014). Kapatılmanın Patolojisi / Osmanlı'dan Günümüze Hapishanenin Tarihi. İstanbul: Kalkedon Yayınları



Operasyonê “KCKyê”


NÜÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

SİYASETMEDARÊN KURD - 2

Pîstî sala 2009an operasyonên li dijî kes û sazîyen bi tevgera Kurd re têkildar in, bi navê “KCKyê” hat kirin.

Nuri Fırat
Yılmaz Yıldız

- Bi sala 2010an ve serdema operasyonê “KCKê” destpê kir. Cara yekem di operasyona 14ê Avrêla 2009an de gelek siyasetmedar, xwendekar, parêzer, rojnameger, sendiqevan, karker hatin girtin.
- Mirov dikare operasyonê “KCKê” weke serdema 2009-2013 û serdema piştî 2015an bike du beşan. Yênu ku 2009an de hatibûn girtin, di 2013an de dema pêvajoya çareseriye de hatin tehlîyekirin lê, dozêne derbarê wan de dewam kir. Piştî Tîrmeha 2015an ku pêvajoya çareseriye dawî bû û şer careke din destpê kir; disa di bin navê operasyonê “KCKê” de girtin destpê kir.
- Derbarê van her du serdeman de Tevgera Kurd û çavkaniyên fermî agahiyêna cuda daxuyandin.



Beriya pêvajoya çareseriye

- ✓ Wezîrê Dadê yê wê demê Sadullah Ergîn daxuyandibû ku heta 4ê Tebaxa 2012an ji 113 dozan 992 kes girtî bûn û bi temamî 2.146 kes di van dozan de dihatin, dadkirin.(1)
- ✓ Li gorî agahiyêna rayedarên BDPê û HDPê, hejmara kesen ji ber doza KCKê hatine girtin, nêzî 10 hezar e.
- ✓ Li gorî raporê salane yê KMMê navbera salên 2010-2013an de 40 hezar û 629 kes hatine binçavkirin û 8 hezar û 18 kesen ji wan jî hatine girtin (Di sala 2014an de 11.021 kes hatine binçavkirin û 1273 kesen ji wan hatin girtin.). Lîbelê bi teqez nayê zanîn ka çend kes ji ber pirsgirêka Kurd hatine girtin.
- ✓ Şêwirmenda Hiqûqê ya HDPê Hulya Çapar Duman ragihandibû ku heta 14ê Tîrmeha 2014an di dozêne KCKê de 3.961 kes mehkûm, 951 kes ji girtî bi temamî 4.912 kes ji di zindanan de ne.


Piştî dawîbûna pêvajoya

- ✓ Serokomar Erdogan di 14ê Kanûna 2016an de got, “di operasyonê li dijî rîexistina terorî de heta niha zêdetirê 40 hezar kesan hatine binçavkirin û 10.500 ji wan kesan hatine girtin.”
- ✓ Wezîrê Navxweyî Suleyman Soylu di 13ê Sibata 2017an de ragihand ku di 5 salên dawî de di operasyonê PKKê de 8.477 kes hatine binçavkirin û 2.603 ji wan kesan hatine girtin.
- ✓ Li gorî Navenda Ragihandina HDPê navbera 22ê Tîrmeha 2015an-27ê Çileya 2017an de 9.200 kes hatine binçavkirin û 2.897 ji wan kesan hatine girtin.
- ✓ Li gorî rapora KMMê ya 2015an, 13 hezar û 189 kes hatine binçavkirin û 1.860 kesen ji wan hatin girtin. Ne dîyar e ka çend kesen wan ji ber pirsgirêka Kurd hatine girtin û binçavkirin. KMMê daxuyand ku di neh mehîn 2016an de, 15.000 kes ji ber lêpirsina “KCKê” hatine binçavkirin û 5.600 kesen ji wan hatine girtin. KMMê her wiha daxuyand ku ji ber sedemîn polîti li herêma rojhilat û başur-rojhilatê Tirkîyeyê di sala 2015an de 5.387 hatine binçavkirin, 196 ji wan hatin girtin û di sala 2016an de ji 6.860 kes hatine binçavkirin, 724 kesen ji wan hatine girtin.
- ✓ Parêzer Şûle Recepoglu rîvebira Komeleya Hevgirtina Bi Malbatên Girtî û Mehkûm (TUAD) re ya Şaxa Stenbolê bû ku komele di OHALê de bi biryara Wezareta Karêna Navxweyî ve hat girtin. Recepoglu van agahiyâna bi me re parve kir: Beriya pêvajoya çareseriye, 8 hezar û 500 kes ji ber dozêne PKK/KCKê di zindanan de bûn. Bi destpêkirina pêvajoyê ve ev hejmar kete 4 hezar û 750yan. Lîbelê piştî pêvajo bi dawî bû iro (16ê Sibata 20017an) 780 jê jin bi temamî 9 hezar û 700 kes ji ber dozêne PKK/KCKê di zindanan de ne. 110 jê girankirî bi temamî li 1200 kesan cezayê muebetê hatiye dayîn û ew ji salên 1990an vir ve di zindanan de ne.
- ✓ Piştî di 20ê Gulana 2016an de parêzbendiya 55 parlementerên HDPê hatibû rakirin û li ser 510 fezlekeyan doz hatin vekirin; heta 7ê Sibata 20017an 27 parlementerên HDPê gelek caran hatin binçavkirin. 14 parlementer hatin girtin. Hevserokên Giştî yên HDPê Figen Yuksekdag û Selahattin Demirtaş di 5ê Mijdara 2006an de hatin girtin. Di 21ê Sibatê de ji parlementeriya Figen Yuksekdag hat betalkirin.
- ✓ Şêwirmenda Hiqûqê ya HDPê Parêzer Hulya Çapar Duran ragihand ku heta 28ê Sibata 2017an 74 hevşaredar hatine girtin û li 83 şaredariyan ji qayûm hatine tayînkirin. Dema ev agahî dihat berhevkirin, girtin û binçavkirin dewam dikir.

Piştî ji hêla AKPê ve pêvajoya çareseriye hat qutkirin, biryara girtina me ji hat dayîn...

Payebilindên mezin ên AKPê li ser maseyek tûniştin û saet bi saet li ser organizasyonê xebitîn ku em werin girtin.

Li ser parlementerên wê partîye her tewanbarî heye. Eger hûn wekê terorîstan tevbigerin, wê muameleya li terorîstan li we were kirin. Li gorî min biryara dadweriyê daye ji di cih de ye.



“GIRTIN ÇARESERÎ NÎN E Û PIRSGIRÊKA HEYÎ ZÊDETIR DIKE”

Mûstafa Eren yek ji kordinatore Komeleya Di Sisteme Ceza Înfazê de Civaka Sivil (CISST) e û nivîskarê pirtûka “Patolojiya Girtinê/Ji Dema Osmaniyan Heta İro Dîroka Girtîgehan” e. Eren derbarê ji sala 1980an vir ve girtina kesen ji Tevgera Kurd de agahiyâna bi me re parve kir:

- Li Tirkîyeyê di xebata li ser girtîgehan de ya herî zehmet berhevkirina agahiyâna e. Him Wezareta Dadê agahiyâna parve nake, him ji li welatên wekê Tirkîyeyê saziyê sivil nikarin bi hêsanî derbarê girtîgehan de xebat û lêkolînan pêk bînin.

- Wezareta Dadê dema dawîya salê agahiyâna diyar dike, dibêje “hejmara girtîyan di roja dawîya salê de ev e”. Lîbelê di nav salê de sîrikulayoneke mezin pêk tê. Yanê gelek kes têne girtin û piştî 3-5-6 mehan serbest têne berda. Di agahiyâna Wezareta Dadê de ev yek nayê operasyonê “KCKê” zêdetir bûn.

- Di pêvajoyen siyasi de kî bibe hedefa desthiladariyê, ew kes dihat girtin. Mirov dikare girtinê li hemberî Tevgera Kurd ji li ser vê esasê bişopîne...

- Di pêvajoya sawî de em dibînin ku girtinê li hemberî siyaseta legal zêdetir bûne. Li ser vê esasê bi taybetî li dijî HDPê hewldaneke mezin tê kirin. Bêguman ev yek bi pêvajoya siyasiya heyî re têkildar e.

- İro hejmara kesen di zindanan de 210.000 e. Ev hejmar heta sala 2016an nêzî 50 hezar bû. Diyar e ku hejmar 4 qat zêdetir bûye. Réjeya girtiyêni siyasi %30-40 e.

- Tundî êdî di jiyana rojane de normalîze bûye. Girtin yek ji cûreyekê tundiyê ye û çiqas diçe ev yek zêdetir dibe.

- Bêguman rê û rîbazên bi vî rengî çareserî nîn in. Girtin ti encameke baş dernaxâne holê, tişteke patolojik e û pirsgirêka kûrtir dike.

- Eger demokrasiya welatekî were meraqkirin divê ewil rewşa girtîgehanê wir were zanîn. Çiqas zext û girtin zêde be, di demokrasiya wir de ji ew qas pirsgirêk heye.

(1) Tarık Işık (2012). KCK Bilançosu.

<http://www.radikal.com.tr/turkiye/kck-bilançosu-1096191/>

(2) Nuri Firat (2015). Politikanın Kürtçesi. İstanbul: Everest Yayınları



Hemû hevserokên partîyêñ Kurd di zindanê de mane

NÛÇEYA ROJNAMEGERÊN BÊKAR

SÎYASETMEDARÊN KURD - 3

Kevneşopîya siyaseta Kurd ku niha bi HDP'yê dewam dike, di sala 1990'i de bi HEP'ê dest pê kir. Ji 10 partîyêñ Kurdan, doza girtinê ji bo 7'an ji wan hat vekirin, 5 jê hat girtin. Hema bibêje hemû serokên giştî ên partîyan bi sedemên cur bi cur hatin girtin û di zindanê de man.

Nuri Fırat

Yılmaz Yıldız

Partîya Kedkarêن Gel (HEP) di 7'ê Pûşpera 1990'î de hat damezirandin. Di 17 salan de 10 partîyên di rêya HEP'ê de bi navêñ cuda hatin avakirin.

Ji wan 10 partîyan Partîya Keda Gel (HEP) Partîya Azadî û Wekhevîyê (ÖZEP), Partîya Azadî û Demokrasîyê (ÖZDEP), Partîya Demokrasîyê (DEP), Partîya Demokrasîya Gel (HADEP) û Partîya Civaka Demokratîk (DTP) bi biryara dadgehê hat girtin. Dema der barê Partîya Demokratîk a Gel (DEHAP) de doza girtinê dewam dikir, partîyê xwe bi xwe betal kir. Hemû sîyasetmedarên ku bûne serokê giştî ên van partîyan hatine zindankirin û demekê be jî di girtîgehan de mane.

Partîya Keda Gel 1990-1993


Piştî ku di 12'yê Rezbera 1980'î de derbe hat kîrin, Partîya Sosyal Demokrat a Gelparêz (SHP) bû yet ji cîyên sîyasetmedarên Kurd. Di sala 1987'an de sîyasetmedarên girîngîyê didin meseleya Kurdan ji lîsteya SHP'yê çûn parlementoyê. Lî ji ber meseleya Kurdan ew kes ji SHP'yê veqetîyan.

Parlementerê Meletîyê, Îbrahîm Aksoy di Reşemîya 1989'an de di Komîsyona Hevpar a Tirkîye û Ewropayê de got ku li Tirkîyeyê

meseleya Kurdan heye. Ji ber vê yekê SHP'yê ew ji partîyê derxist.

Di 14-15'yê Sermawezê a 1989'an de Weqfa France-Libertés û Enstîtûya Kurdî Konferansa Kurdan li dar xist. Digel Aksoy, parlementer Ahmet Türk, Mahmut Alınak, Adnan Ekmen, Mehmet Ali Eren, Salih Sümer, İsmail Hakkı Önal û Kenan Sönmez jî beşdarî konferansê bûn.

Birêvebirîya SHP'yê, di 17'yê Sermawezê a 1989'an de biryar da ku wan parlementeran sûcekî li dijî partîyê kirîye û beşdarî kiryareke parçekirina welat bûne.



Partîyê ji ber wê 7 parlementerên besdarî konferansê bûne ji endamtiya partîyê avêtin. 12 parlementerên SHP'yî ji bo protestokirina vê rewşê ji partîyê îstîfa kirin. Partîya Keda Gel(HEP) di 7'ê Pûşpera 1990'î de hat avakirin. Ji 19 parlementer ji SHP'yê hatin derêxistin, 11 kes bûn avakirên HEP'ê. Fehmî Işıklar bû serokê yekemîn HEP'ê.

Di hilbijartina pêşwext a di 20'ê Rezberê a 1991'ê de, HEP û SHP ji yek lîsteyê ketin hilbijartinê. Ji lîsteya SHP'yê 88 parlementer çûn parlementoyê, 22 ji wan ji HEP'ê bûn. Di hevpeymanîya HEP û SHP'yê de krîz yekemîn di dema sondxwarinê de çê bû. Leyla Zanayê di

sonda xwe de bi Zimanê Kurdî got: "Ez vê sondê ji bo biratîya Kurd û Tirkan dixwim."

Li gorî hejmarên fermî di pîrozbayîyen Newrozê a 21'ê Adara 1992'yan de, 57 kes mirin. Bi vê yekê HEP û SHP ketin qirika hev. Ji bilî Fehmi Işıklar, Adnan Ekmen û Salih Sümer parlementerên HEP'î dest ji SHP'yê berdan, 18 parlementer bi navê HEP'ê di parlementoyê de man. Di sala 1991'ê de Fehmi Işıklar li ser lîsteya SHP'yê bû parlementer û ji HEP'ê îstîfa kir û Feridun Yazar bû serokê HEP'ê.

Di 19'yê Rezbera 1992'yan de Ahmet Türk bû serokê HEP'ê.

Dadgeha Qanûna Bingehîn, di 14'yê Tîrmeha 1993'yan de, li gorî xalên 68. û 69. ên maddeya 2820. a Yasaya Partîyên Sîyasî bi sûcên "Kiryarêni bi armanca têkbirina yekîtiya dewlet û gel ku nayê perçekirin" û "kirina kiryarêni ne li gorî yasayan" HEP girt.

Fehmi Işıklar

Di 1941'ê de li Rihayê hatiye dinyayê. Li gelek fabrîqeyan wekî teknîsyen xebitîye. Dema derbeya 12'yê Rezberê hat kirin ew serokê Konfederasyona Sendîkayê Karkerên Şoreşger(DîSK) bû. Di wê demê de hat desteserkirin û zêdetirî sê mehan desteserkirî ma. Gelek doz li wî hatin kirin.

Di sala 1987'an de ji SHP'yê bû parlementerê Bursayê. Di sala 1990'î de bû serokê HEP'ê. Di sala 1991'ê de dest ji HEP'ê berda û ji SHP'yê bû parlementerê Amedê. Di sala 1992'yan de besdarî koma ji SHP'yê îstifa kirin nebû û li SHP'yê ma. Lê Dodgeha Qanûna Bingehîn dema HEP girt ji ber ku ew serokê wê ê berê bû, di 17'yê Berfanbarê parlementerîya wî hat betalkirin.

Feridun Yazar

Di sala 1944'an de li Rihayê ji dayik bûye. Parêzerî kiriye. Piştî muxtiraya 12'yê Adara 1971'ê bi îdiaya ku endamê Devrimci Doğu Kültür Oacakları (DDKO) ye hat girtin. Sala 1974'an bi Efûya Giştî re



hat berdan. Di Partîya Gel a Komarî (CHP) de xebatên xwe ên sîyasetî berdewam kir û sala 1977'an wekî şaredarê Rihayê hat hilbijartin. Di dema Derbeya 12'yê Rezberê de ji peywirê hat dûrxistin, hat girtin û du salan di girtîgehê de ma. Piştî ku derket di SHP'yê de karê sîyasetê berdewam kir.

Di sala 1988'an de bû Serokê SHP'yê ê rîexistina Rihayê. Ji ber ku SHP'yê di sala 1989'an de hin parlementer ixrac kirin, Yazar ev rewş protesto kir û ji SHP'yê veqetîya. Di sala 1991'ê de bû Serokê Giştî ê HEP'ê û bi qasî salekî wekî serokê giştî kar kir.

Di sala 1998'an de ji ber benda 8'an a Yaseya Têkoşîna Dijî Terorê (TMK) a kevn

ku sûcê "propagandeya li dijî hevgirtina dewletê" destnîşan dike ket girtîgehê. Di 1'ê Sermaweza 2015'yan de ji HDP'yê bû namzetê parlementerîyê ê Rihayê, lê nehat hilbijartin. Di 12'yê Pûşpera 2016'yan de çû ser dilovanîya xwe.

Ahmet Türk

Di 1942'yan de li Mêrdînê ji dayik bû. Di salên 1970'yî de dest bi sîyasetê kir. Sala 1973'yan ji Partîya Demokrat (DP) wekî parlementerê Mêrdînê hat hilbijartin. Piştî salekê derbasî Partîya Gel a Komarî (CHP) bû. Di sala 1977'an de ji CHP'yê bû parlementerê Mêrdînê.

Di derbeya 12'yê Rezberê de di dema



parlementerîya xwe de hat girtin. 3 salan di Girtîgeha Amedê de ma. Di sala 1987'an de vê carê ji SHP'yê bû parlementerê Mêrdînê. Di nava wan parlementeran de bû ku di sala 1989'an de ji SHP'yê hatin avêtin.

Di hilbijartina sala 1991'ê de ji hevalbendîya HEP û SHP'yê bû parlementerê Mêrdînê. Di sala 1992'yan de bi HEP'îyan re ji SHP'yê veqedîya û heman salê bû Serokê Giştî ê HEP'ê.

Piştî ku HEP hat girtin derbasî Partîya Demokrasîyê (DEP) bû. Di nava wan parlementerên DEP'ê de bû ku di sala 1992'yan de parêzbendîyên wan hatin rakirin. Careke din hat girtin. Ji Benda 168'an ku endamtîya rîexistina dijyaseyî a Yaseya Ceza a Tirk (TCK) a kevn hat darizandin û du salan di girtîgehê de ma.

Di navbera salên 2005-2009'an de wekî Hevserokê Giştî ê Partîya Civaka Demokratîk (DTP) kar kir. Di 22'yê Tîrmeha 2007'an û 12'yê Pûşpera 2011'yan de du caran wekî parlementerê Mêrdînê hat hilbijartin.

Piştî ku di 11'yê Berfanbara 2009'an de DTP hat girtin ji bo wî biryara qedexeya sîyasetê a 5 salan hat standin û mafê wî ê parlementerîyê ji destê wî hat girtin.

Di hilbijartina herêmî a 30'yê Adara 2014'yan de ji Partîya Aşîtî û Demokrasîyê (BDP) bû namzetê Şaredarîya Bajarê Mezin a Mêrdînê û qezenc kir. Di 17'yê Sermaweza 2016'yan de ji hêla

Wezareta Navxweyî ve ji ser kar hat dûrxistin, di 24'ê Sermaweza 2016'yan de hat girtin û di 3'yê Reşemîya 2017'yan de hat berdan. Bi sûcêñ muxalefeta li Dijî Yaseya Meşan û Xwenîşandanî û Civînan a hejmara 2911'yan, propagankirina rîexistina dijyaseyî (TMK 7), endamtîya rîexistina dijyaseyî (TCK 314/2) tê sûcdarkirin û di dozê de 18 sal cezayê girtîgehê ji bo wî tê xwestin.

Di Doza Esasî a KCK'yê a li Amedê de salek û 3 meh cezayê girtîgehê stand ku di 28'ê Adara 2017'yan de biryar der barê vê dozê de hat dayin.

Partîya Azadî û Wekhevîyê (ÖZEP) 1992

Li ser îhtîmala girtina HEP'ê di 25'ê Pûşpera 1992'yan de hat avakirin. Mahmut Alınak wekî serokê Giştî hat hilbijartin. Lê piştî avakirina wê bi demeke kurt bi îdiaya ku "Kiryarêni bi armanca têkbirina yekîtiya dewlet û gel ku nayê perçekirin" dike armanc, bi hinceta Benda 69'an a Destûra Bingehîn der barê Partîya Azadî û Wekhevîyê (ÖZEP) de doza girtinê hat vekirin. Li ser vê rewşê ÖZEP piştî avakirinê ib 13 rojan xwe girt.

Mahmut Alınak

Di 1952'yan de li Qersê ji dayik bû. Bi nasnameya xwe a sîyasetmedar, parêzer û nivîskarîyê ve hat naskirin. Di sala 1987'an



de wekî Parlementerê SHP'yê ê Qersê hat hilbijartin. Di nava wan kesên ku di sala 1989'an de ji SHP'yê hatin ixrackirin de bû.

Di sala 1991'ê de di encama hevalbendîya HEP û SHP'yê wekî parlementerê Şîrnexê hat hilbijartin. Di nava wan parlementerên DEP'ê de bû ku di sala 1994'an de parêzbendîyên wan hat rakirin.

Ji ber Benda 168'an a TCK'yê a kevn hat darizandin û di girtîgehê de ma.

Di 8'ê Berfanbara 2011'yan de di operasyona KCK'yê de hat girtin, di 18'ê Tîrmeha 2012'yan de hat berdan. Ji benda 314/2 a TCK'yê ve tê darizandin.

Partîya Azadî û Demokrasîyê (ÖZDEP) 1992 - 1993

Êdî her kîlîyê xeterîya girtina HEP'ê hebû û ji ber vê ÖZDEP di 19'yê Kewçêra 1992'yan de wekî partîya duyemîn hat damezirandin. Serokê Giştî ê yekemîn Mevlüt İlik bû.

Lê belê der barê ÖZDEP'ê de bi hinceta berdewamîya HEP'ê ye û hewl dide yekîtîya dewletê perçê bike, doza girtinê hat vekirin.

ÖZDEP'ê di 30'yê Avrêla 1993'yan de bi xwe, xwe girt. Lê belê çi qasî ku partîyê xwe girtibe jî, Dadgeha Makeqanûnê di 23'yê Sermawezâ 1993'yan de der barê ÖZDEP'ê de biryara girtinê da.

Partîya Demokrasîyê (DEP) 1993 - 1994

DEP wekî berdewamîya HEP'ê di 7'ê Gulana 1993'yan de hat damezirandin. Cara yekem Yaşar Kaya bû serokê giştî ê partîyê. Kaya peywira xwe di 12'yê Berfanbara 1993'yan de teslîmî Hatip Dicle kir. Parlementerê Mêrdînê ê DEP'ê Mehmet Sincar di 4'ê Rezbera 1993'yan de hat qetilkirin. Navenda Giştî a DEP'ê û 8 avayîyên partîyê di 18'yê Reşemîya 1994'an de hatin bombekirin.


Di 2'yê Adara 1994'an de li meclîsê parêzbendîya 13 parlementerên DEP'ê

hat rakirin û ew parlementer bi darê zorê ji hêla polîsan ve li meclîsê hatin binçavkirin û paşê hatin girtin. Dadgeha Makeqanûnê di 16'yê Pûşpera 1994'an de biryar da û DEP hat girtin.

Yaşar Kaya

Di sala 1938'an de li Qersê hatiye dinyayê. Siyasetmedar, nivîskar û aborîzan e. Di sala 1959'an de ji doza 49'an, di 1963'yan de jî doza 23'yan de hat girtin. Dema xwedîyê Özgür Gündemê bû, ew bû serokê giştî ê DEP'ê.

Di 16'yê Rezbera 1993'yan de hat girtin. Ji ber weşana rojnameya Özgür Gündemê





der barê wî de gelek doz hatin vekirin. Di sala 1994'an de ji Tirkîyeyê derket û sala 2014'yan vegevîya welat. Di 9'ê Adara 2016'yan de wefat kir.

Hatip Dicle

Di sala 1954'an de li Amedê hatiye dinyayê. Endazyarê Avayîsazîyê ye. Di hilbijartinên 1991'ê de ku SHP û HEP bûbûn yek de ji Amedê wekî parlementer hat bijartin.

Di sala 1992'yan de bi hevalên xwe re derbasî HEP'ê bû, Piştî girtina partîyê di sala 1993'yan de derbasî DEP'ê bû. Dema Serokê Giştî ê DEP'ê bû, ligel 12 hevalên xwe hat girtin.

Li gel Leyla Zana, Orhan Doğan, Selim

Sadak ve ew jî mehkûm bû.

Paşê Dodgeha Mafê Merivan a Ewropayê (DMME) biryara cezayê li wan hatiye dayîn betal kir. Li ser vê yekê piştî 10 salan ew û 3 hevalên wî ji zindanê derketin.

Di partîyên heman sîyasetê dimeşînin de xebatên xwe domandin. Di sala 2011'yan de ji Amedê wekî parlementer hat bijartin, lê belê YSK'yê ji ber der barê wî de ceza heye, parlementerîya wî betal kir.

Di çarçoveya doza KCK'yê de di 24'ê Berfanbara 2009'an de hat girtin û piştî girtina 5 salan di 29'ê Pûşpera 2014'yan de serbest hat berdan. Di doza KCK'yê de biryara giştî hat dayîn û li Hatip Dicle jî 9 sal cezayê girtinê hat dayîn.

Partîya Demokrasîya Gel (HADEP) / 1994 - 2003

Di 11'yê Gulana 1994'an de hat damezirandin. Serokê Giştî ê yekemîn Murat Bozlak e.

Peywira xwe di 8'ê Rezbera 1999'an de teslîmî Ahmet Turan Demir dike lê di sala 2000'an de careke din dibe serokê giştî ê partîyê.

HADEP di nava partîyên berîya wê de hatibûn avakirin de cara yekemîn di sîyasetê de ew qasî dirêj ma û bi serê xwe tev li hilbijartinan bû.

HADEP'ê di hilbijartinên 24'ê Berfanbara 1995'an de %4,67'ê dengan girt lê ji ber benda %10'an derbas nebû, neket parlementoyê.

Di hilbijartinên sala 1999'an de HADEP'ê di hilbijartinên giştî û herêmî de dengê xwe zêdetir kir û ci qasî ku neketibe meclîsê jî, Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê jî di nav de 37 şaredarî xist destê xwe.

Tiştên ku bi serê HEP û DEP'ê de anîbûn, bi serê HADEP'ê de jî anîn.

Di Kongreya partîyê a 2. de ji ber ala Tirk anîn xwarê, Serokê Giştî ê HADEP'ê Murat Bozlak jî di nav de 50 endamên meclîsa partîyê hatin binçavkirin û Murat Bozlak jî

di nav de gelek kes hatin girtin.

Bi taybetî di sala 1998'an de gelek caran polîsan bi ser Navenda Giştî a HADEP'ê û gelek avayîyên partîyê de girtin. Di 29'ê Rêbendana 1999'an de der barê HADEP'ê de doza girtinê hat vekirin.

Dodgeha Makeqanûnê di 13'yê Adara 2003'yan de wekî hincetên ji bo partîyên hatine girtin, der barê HADEP'ê de jî biryara girtinê da.

Murat Bozlak

Di sala 1952'yan de li Enqereyê hatiye dinyayê. Sîyasetmedar û parêzer e. Di SHP, HEP û DEP'ê de xebitîye û 5 salan bû Serokê Giştî ê HADEP'ê.

Di sala 4'ê Reşemîya 1994'an de dema Sekreterê Giştî ê DEP'ê bû li dijî wî êrişa çekdarî çê bû û bi giranî birîndar bû.

Piştî kongreya ku ala Tirk hat xwarê, hat binçavkirin. Li gel gelek endamên partîyê di 4'ê Tîrmeha 1996'an de hat girtin.

Bi heman hincetan di salên 1998'an û 2000'î de gelek caran hat zindankirin.

Bi giştî 3 salan girtî ma û piştî di sala 2003'yan de HADEP hat girtin, der barê wî de biryar hat dayîn ku heta 5 salan sîyasetkirin lê qedexe ye.



Di sala 2011'yan de wekî namzetê serbixe ji Edeneyê bû parlementer û li meclîsê di koma BDP'yê de cî girt.

Di 4'ê Rêbendana 2015'yan de wefat kir.

Partîya Demokratîk a Gel (DEHAP) / 1997 - 2007

Ji ber xeterîya girtina HADEP'ê di 24'ê Kewçêra 1997'an de hat damezirandin. Yekemîn Serokê Giştî ê DEHAP'ê Veysi Aydin e.

Piştî Dadgeha Bilind di 9'ê Gulana 1998'an de endamtiya Aydin betal kir, di dewsa wî de Mehmet Abbasoglu bû serokê giştî ê partîyê. Di 8'ê Pûşpera 2003'yan de jî Tuncer Bakırhan bû serokê giştî.

Dadgeha Bilind di sala 2003'yan de bi hinceta "bêyî rôexistinbûna xwe temam bike tev li hilbijartinê bûye" der barê DEHAP'ê de doza girtinê vekir.

Di dozê de hat xwestin ku DEHAP bi giştî

DEHAP piştî 2002'yan bi awayekî aktif di sîyasetê de cî girt. Di 3'yê Sermaweza 2002'yan de DEHAP wekî "Bloka Ked, Aştî û Demokrasîyê" ket hilbijartinê û %6,22'yê dengan girt. Lê belê ji ber benda hilbijartinê tu parlementer dernexist.

Piştî girtina HADEP'ê 35 şaredar jî derbasî DEHAP'ê bûn. DEHAP'ê di hilbijartinên 28'ê Adara 2004'an de hejmara şaredarîyên xwe kir 54. Di 19'yê Sermaweza 2005'an de DEHAP'ê bi xwe, xwe girt.



were girtin. Ci qasî ku partîyê xwe girtibe jî dozê heta sala 2007'an dewam kir.

Mehmet Abbasoglu

Di sala 1955'an de li Amedê hatiye dinyayê, Serbazê malnişîn e. Dema Serokê Giştî ê DEHAP'ê bû, bi hinceta sextekarîya ewraqan kiriye, hat dadgehkîrin û salek û 11 meh ceza lê hat birîn.

Piştî girtina nêzîkî 2 salan hat berdan û di DTP'yê de xebatên xwe ên sîyasî domandin. Di 14'yê Avrêla 2009'an de ji doza KCK'yê hat girtin. Di 12'yê Avrêla 2014'yan de serbest hat berdan.

Dema doza der barê wî de dewam dikir, di 5'ê Pûşpera 2015'yan de wefat kir.

Tuncer Bakırhan

Di sala 1970'yî de li Qersê hatiye dinyayê. Ji ciwantîya xwe de, di HEP'ê de dest bi sîyasetmedarîyê kiriye.

Ji DEHAP'ê bû namzetê şaredarîyê û parlementerîyê lê nehat hilbijartin.

Di 17'yê Rêbendana 2012'yan de ji doza KCK'yê hat girtin. Bakırhan di 30'yê Avrêla 2013'yan de hat berdan.

Di hilbijartinên 2014'yan de ji DBP'yê bû namzetê hevşaredarîyê Sêrtê û qezenc kir. Di 16'yê Sermaweza 2016'yan de hat girtin û piştî rojekê peywira wî ji destê wî hat standin û qeyûm li Şaredarîya Sêrtê hat tayînkirin.



Partîya Azad / 2003 - 2007

Ji ber xeterîya girtina DEHAP'ê di 6'ê Pûşpera 2003'yan de di seroktîya Ahmet Turan Demir hat damezirandin.

Tu karekî sîyasî nekir û di 26'ê Pûşpera 2007'an de bi xwe, xwe girt.

Partîya Civaka Demokratîk (DTP) / 2005 - 2007

Li ser xeterîya girtina DEHAP'ê û bi Îdîaya sîyaseta berfireh, di 9'ê Sermawea 2005'an de bi hevserokatîya Aysel Tuğluk û Ahmet Türk hat damezirandin.

Di 8'ê Sermawea 2007'an de Nurettin Demirtaş bû serokê giştî ê partîyê. Piştî

betalkirina seroktîya Demirtaş, di dewsa wî de Emine Ayna bû serok û di 4'ê Kewçêra 2009'an de Ahmet Türk careke din bû serokê giştî ê partîyê.

DTP bi namzetên serbixwe tev li hilbijartinên 2007'an bû û 21 parlementerên wan ketin meclîsê. Bi vî awayî 13 salan piştî DEP'ê, partîyeke xwedî heman helwestê di meclîsê de hat temsîlkirin.

DTP'yê di hilbijartinên 2009'an de serkeftinek mezin pêk anî 99 şaredarî qezenc kir.

Dadgeha Bilind di 16'yê Sermawea 2007'an de der barê DTP'yê de doza girtinê vekir. Dodgeha Makeqanûnê di 11'yê Berfanbara 2009'an de

derbarê DTP'yê de biryara girtinê da. Parlementerîya Ahmet Türk û Aysel Tuğluk hat betalkirin û li gelek endamên partîyê sîyaset hat qedexekirin.

Ahmet Türk

Li beşa HEP'ê binêrin ...

Aysel Tuğluk

Di sala 1965'an de li Xarpêtê hatiye dinyayê. Parêzertî kiriye. Ligel Ahmet Türk bûn Hevserokên Giştî ên DTP'yê.

Di 2007'an de ji Amedê, di 2011'yan de jî ji Wanê wekî parlementer hat hilbijartin.

Dema Alîkara Hevserokên Giştî ên HDP'yê

bû, di 28'ê Berfanbara 2016'yan de hat girtin.

Nurettin Demirtaş

Di sala 1972'yan de li Xarpêtê hatiye dinyayê. Dema li zanîngehê xwendekar bû hat girtin û 11 sal û 6 mehan sal di zindanê de ma. Piştî zindankirinê di DTP'yê de careke din dest bi sîyasetê kir.

Di sala 2007'an de bû Serokê Giştî ê DTP'yê. Lê belê bi Îdiaya ji bo leşkerîyê neke belgeya sexte daye amadekirin, der barê wî de doz hat vekirin. Ji ser peywira xwe hat hilanîn û piştî girtina salekê ew şandin leşkerîyê.

Demirtaş paşê ji Tirkîyeyê derket.





Partîya Aşṭî û Demokrasîyê (BDP) / 2008 - 2014

Di 2'yê Gulana 2008'an de bi seroktîya Mustafa Avzit hat damezirandin. Piştî Avzit, di 7'ê Rezbera 2008'an de Demir Çelik bû serokê giştî ê partîyê. Çelik jî di 1'ê Reşemîya 2010'an de peywira xwe dewrî Selahattin Demirtaş û Gültan Kışanak kir.

Piştî DTP hat girtin, parlementer û şaredarên partîyê derbasî BDP'yê bûn. BDP jî wekî DTP'yê di hilbijartinên 12'yê Pûşpera 2011'yan de bi namzetê serbixwe ket hilbijartinê, 36 parlementer şandin meclîsê û di meclîsê de koma xwe ava kir.

YSK'yê parlementerîya Hatip Dicle betal

kir û li ser vê yekê hejmara parlementerên BDP'yê li meclîsê bû 35. BDP'yê di hilbijartinên 30'yê Adarê de, 3 jê bajarên mezin bi giştî 102 şaredarî girt. Piştî damezirandina HDP'yê, BDP di 28'ê Avrêla 2014'yan de bi xwe, xwe girt û parlementerên partîyê derbasî HDP'yê bûn.

Selahattin Demirtaş

Di sala 1973'yan de li Xarpêtê hatiye dinyayê. Parêzertî kiriye. Di 22'yê Tîrmeha 2007'an de ji Amedê, di 12'yê Pûşpera 2011'yan ji Colemêrgê, di 7'ê Pûşperê û 1'ê Sermawezê de ji Stenbolê wekî parlementer hat hilbijartin.

Di 10'ê Gelawêja 2014'yan de bû namzetê

serokmartîyê û %9,76'ê dengan girt. Hevserokê Giştî ê HDP'yê ye û partîya wî di hilbijartinên 7'ê Pûşperê û 1'ê Sermawezê de benda hilbijartinê şikand û zêdetirî %10'ê dengan girt. Di 20'ê Gulana 2016'yan de parêzbendîya nêzî timamîyê parlementerên HDP'yê hatin rakirin û der barê wan de bi dehan doz hatin vekirin.

Di 5'ê Kewçêra 2016'yan de li gel 9 parlementerên HDP'yê, ew jî hat girtin. Sûcên wekî "Li dijî qanûna xwepêşandan û civînan tev gerîyaye", "Xelk ji bo li dijî qanûnan derkevin tehrîk kiriye(TCK 217)", "xelk ji bo kîn û dijiminatîyê tehrîk kiriye (TCK 216)", "Heqaret li serokomar kiriye (TCK 299)", "Bêrûmetkirina saziyên fermî ên Komara Tirkîyeyê (TCK 301/1),

"Propagandaya ji bo rêexistina terorî (TMK 7)", "Endambûn (TCK/314/1) û rêvebirbûna rêexistina terorî (TCK 314/1) li Selahattin Demirtaş têن kirin û di doza ji TCK 301/1'ê de dihat dadgehkirin de di 21'ê Reşemîya 2017'yan de 5 meh cezayê girtinê li wî hat birîn.

Gültan Kışanak

Di sala 1961'ê de li Xarpêtê hatiye dinyayê. Rojnamegerî kiriye. Di 22'yê Tîrmeha 2007'an de ji Amedê, di 12'yê Pûşpera 2011'yan de ji Sêrtê wekî parlementer hat hilbijartin. Li gel Selahattin Demirtaş bû Hevseroka Giştî a BDP'yê.

Di hilbijartinên 30'yê Adara 2014'yan



HDP

HALKLARIN DEMOKRATİK PARTİSİ

de li gel Fırat Anlı wekî Hevşaredarêن Şaredarîya Bajarê Mezin a Amedê hatin hilbijartin. Di serdema Derbeya 12'yê Rezberê de hatiye girtin û 3 salan hatiye zindankirin. Di 31'ê Kewçera 2016'yan de dema Hevşaredara Amedê bû hat girtin û rojekê bi şûn de ji ser preywirê hat hilanîn.

Partîya Demokratîk a Gelan (HDP) / 2012 -

Di 15'yê Kewçera 2012'yan de bi hevserokatîya Yavuz Önen û Fatma Gök hat damezirandin. Di 27'ê Kewçera 2013'yan de Ertuğrul Kürkçü û Sebahat Tuncel bûn hevserokên partîyê. Di 22'yê Pûşpera 2014'yan de Figen Yüksekdağ

û Selahattin Demirtaş wekî hevserokên partîyê hatin hilbijartin.

HDP'yê di hilbijartina 7'ê Pûşpera 2015'yan de %13,12'yê dengan girt û 80 parlementerên xwe bir meclîsê. Di hilbijartina 1'ê Sermawezê de jî %10,75'ê dengan girt û 59 parlementerên HDP'yê dîsa li meclîsê cî girtin.

Di 20'ê Gulana 2016'yan de parêzbendîya 148 parlementeran hatin rakirin û 59'ê wan parlementerên HDP'yê bûn. Ji 5'ê Sermawezê vir ve, 14 parlementerên HDP'yê hatin girtin û 13 parlementer hê jî di zindanan de ne.



Ertuğrul Kürkçü

Di sala 1948'an de li Bursayê hatiye dinyayê. Ew kesekî wekî sosyalist, aktîvîst, weşanger û sîyasetmedar tê naskirin.

Kesekî ji jenerasyona 68'an e. Demekê bûye Serokê Giştî ê Federasyona Komeleyên Ciwanên Şoreşger ên Tirkîyeyê (DEV-GENÇ).

Li Kızıldereyê ku di 30'yê Adara 1972'yan de Mahir Çayan û hevalên wan hatin qetilkirin de tenê Ertuğrul Kürkçü sax filîtîbû. 14 salan di zindanê de ma.

Di gelek rêxistinên çepgir û partîyan de sîyaset kiriye û herî dawî ji 2011'yan bi

şûn de di nava BDP û HDP'yê de cî girtiye. Di 12'yê Pûşpera 2011'yan de ji Mêrsînê, di 7'ê Pûşper û 1'ê Sermawezâ 2015'yan de jî ji Îzmîrê wekî parlementer hat hilbijartin.

Sebahat Tuncel

Di sala 1975'an de li Meletîyê hatiye dinyayê. Di DTP'yê de dest bi sîyasetê kir. Di sala 2006'an de hat girtin.

Di 22'yê Tîrmeha 2007'an de ji Stenbolê wekî parlementer hat bijartin û piştî girtina 8 mehan ji zindanê derket.

Di hilbijartinên 12'yê Pûşpera 2011'yan de careke din ji Stenbolê wekî parlementer hat bijartin. Di doza der barê wê de hatibû vekirin de ku di 18'yê Rezbera 2012'yan

de biryar hat dayîn û 8 sal û 9 meh ceza lê bû hevserokê giştî a HDP'yê. hat birîn.

Di HDP û BDP'yê de bû hevseroka giştî. Di 6'ê Sermawezê de ji bo şermezarkirina binçavkirina Yüksekdağ û Demirtaş dema li ber Dadgeha Amedê bû, ligel 10 kesan hat binçavkirin û paşê bi tawanbarîya "Li dijî qanûna meş û civînan tev gerîyaye" û "Endamê rêxistina terorê ye (TCK/314/2) hat girtin.

Figen Yüksekdağ

Di sala 1971'ê de li Edeneyê ji dayîk bûye. Sîyasetmedar û rojnameger e. Demekê bûye Seroka Giştî a Partîya Zextwarêن Sosyalîst. Di 22'yê Pûşpera 2014'yan de



Di çarçoveya qanûna 7'an a TMK'yê de 27'ê Sermaweba 2013'yan ceza lê hatibû birîn û ew ceza 22'yê Rezbera 2016'yan ji hêla Dadgeha Bilind ve hat erêkirin.

Li ser vê yekê, di 21'ê Reşemîya 2017'yan

Di hilbijartinên 7'ê Pûşperê û 1'ê Sermawezê de ji Wanê wekî parlementer hat hilbijartin.

Di 20'ê Gulana 2016'yan de parêzbendîya wê jî hat rakirin û di 5'ê Sermaweba 2016'yan de hat girtin. Der barê Yüksekdağê de ji ber qanûnê TSK û TMK'yê gelek doz hatine vekirin.



de parlementerbûna wê û di 9'ê Adarê de jî endamtî û hevserokatîya wê hat betalkirin.

Selahattin Demirtaş

Li beşa BDP'yê binêrin...

Partîya Herêmên Demokratîk (DBP) / 2014 -

Piştî BDP'yê bi xwe, xwe girt, 11'yê Tîrmehê di dewsa wê de DBP hat damezinandin.

DBP polîtîkayêن li ser rêvebirîyêن herêmî dimeşîne. Ji ber vê yekê parlementerên

BDP'yê li meclîsê derbasî koma HDP'yê bûn lê hevşaredarên wan derbasî DBP'yê bûn.

Cara yekemîn Kamuran Yüksek û Emine Ayna bûn hevserokên giştî ên partîyê. Piştî di 31'ê Berfanbarê de Emine Ayna dest ji sîyasetê berda, Sebahat Tuncel bû hevseroka giştî.

Kamiran Yüksek

Di sala 1980'yî de li Qereyazîya Erziromê hatiye dinyayê. Di ciwantîya xwe de dest bi sîyasetê kiriye. Dema Alîkarê Hevserokên DTP'yê bû, di 14'yê Avrêla 2009'an de bi operasyonê "KCK"yê hat girtin.



Di 12'yê Avrêla 2014'yan de hat berdan
lê di 28'ê Adara 2017'yan de der barê wî
de 21 sal ceza hat dayîn. Di 13'yê Gulana
2016'yan de hat girtin û di 7'ê Kewçêra
2016'yan de careke din serbest hat
berdan.

Der barê wî de niha cezayê 8 sal û 9 meh
ceza hatiye birîn û ji bo wî bîryara girtinê
hatiye dayîn.

Sebahat Tuncel
Li beşa HDP'yê binêrin...


Nuri Fırat

Ji Zanîngeha Stenbolê, ji beşa rojnamegeriyê destûr girt. Navbera salên 2002-2011an
de li Weşanxaneya Aramê û li Ozgur Gundemê xebitî. 4 pirtûkên wî yên bi navê
“Şemdinli” (Aram, 2006), “Kürtler Aslında Yoklar!” (Med, 2010), “Aşiret ve İsyancı
– Batı'nın Kürt Algısı” (Avesta, 2015) û “Politikanın Kürtçesi” (Everest, 2015) hatin
weşandin. Di pirtûka bi navê “İnatçı Bahar – Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat” (Ayrıntı, 2012)
ku Vecdî Erbay edîtortiya wî kir de, makaleya wî ya bi navê “Kürt Edebiyatı Üzerine Bir
Deneme: Politik Edebiyat mı, Politikanın Edebiyatı mı?” jî cih girt.

Yılmaz Yıldız

tLi Zanîngeha Anadoluyê xwendekarê beşa medyayê. Navbera salên 1996-2013an de
li Ozgur Gundem û BirGunê de xebitî. Navbera salên 2013-2016an de li ABC Medya û
Çapxaneya Gunê de weke editörê wêneyan û grafîker xebitiye.

...



IPS İLETİŞİM VAKFI



Hollanda
Kraliyeti

obianet
BAĞIMSIZ İLETİŞİM AĞI



IPS İLETİŞİM VAKFI